Bernamegeh

Dergehê Kurd û Kurdewariyê

Sal: 1 Hejmar: 2 | Kovareke Azad, Serbixwe, Bêteref û Xelkî

Şikeft
Omer Dilsoz

Helbestvanekî sosyalîst: Qanî
Occo Mahabad

Payîz
Eskerê Boyik

Hemedê Qutikspî
Amed Çeko Jiyan

Salihê Biro
Nihat Gültekin



MERVAN SERHILDAN - LALEŞ QASO - KONÊ REŞ - FARÛQÊ FEROYÎ - QENDÎL ŞÊYXBIZÎNÎ - LOKMAN POLAT - MIHEMED HEMKOÇER - TÊNGIZ SIYABENDÎ BAWER YEKTA - ESKERÊ BOYIK - ÎHSAN BÎRGUL - ŞÊRO DALÎNÎ - MIHEMED HESKO - MEHMÛD BADILÎ - SIRAÇ OĞUZ– ELIND MIZÛRÎ - NESRÎN ROJKAN YASEMÎN ELBAN - REMEZAN BAKUR - CÎHAN HESEN - SEDAT YURTDAŞ MUHSİN ÖZDEMİR - İKRAM OĞUZ - MELEVANÊ BARANÎ - YÜCEL ASLAN (KOÇER) - AHMED KANÎ - AYHAN ERKMEN - BAHADİN ROBAR - HECÎ EHMED BERKIYATÎ - DILBIRÎN DILO - GERNAS RODERÎN - CIWAN QADO - METÎN ARÎ - AMED ÇEKO JIYAN - SAKAR KAMIL OSMAN - IKRAM OGUZ - EYYUP GUVEN - HESENÊ SILÊVANIYÊ - OMER DILSOZ - OCCO MAHABAD - NIHAT GÜLTEKİN - ZANA TAŞ - MEHMÛD BIRÎMCE - HEJARÊ FARQÎNÎ - DENGBÊJ EVDİREHÎMÊ MÛŞÎ - ENWER YILMAZ - YAQÛB KURMANC - YASÎN HISÊN

Bernamegeh

Dergehê Kurd û Kurdewariyê





Koordînatorê Gişтî yê Bernamegeh: Occo Mahabad
Edîtor: Mihemed Keskîn, Cîhan Soylu
Rûpelsazî: Rezan Kaya
bernamegeh@gmail.com
www.bernamegeh.org

Her nivîskar ji nivîsên xwe berpirsiyar in.



JI EDÎTOR

Merheba xwendevanên hêja û qedirbilind. Em bi kêfxweşiyeke mezin hejmara xwe ya duyemîn derdixin. Di roja me de kovarên dîjîtal digihîjin girseyên mezin lewma ji bo amedekirinê tê tercîhkirin. Armanca me ew e ku di warê çand, hûner û wêjeyê de fikr û ramanên nivîskarên me bînin pêşberî we. Lê divê bê fêmkirin ku kovarên dîjîtal bi ked û emegên mezin û zehmet tên amadekirin. Çawa ku em bi dildarî ji bo çand û milleta xwe vî karî dikin û dimeşînin divê hûn jî bi hişmendiyeke neteweyî kovarên heyî biparêzin, belav bikin û lê xwedî derkevin.

Di vê hejmarê de gellek nivîskar bi gotar û helbestên xwe yên rengîn di jiyana we de bibin tehm û wateyek. Hêvîdar im hûn ê herdem li dijî asîmîlasyon û oto-asîmîlasyonê bi Kurdî bijîn wek Kurdekî zimanperwer jiyana xwe bidomînin.

Wekî hejmara me ya yekê me nexwest ku em nivîsên nivîskaran redakte bikin û biguherînin. Ji ber ku hin nivîskar li gorî Celadet nivîsên xwe şandibûn lê hin nivîskar jî li gor Rêbera Rastnivîsê lewma me nexwest ku em gotar û helbestên wan biguherînin.

Îro ev mesele di zimanê me de bûye pirsgirêkeke mezin. Mixabin eyarên zimanê Kurdî bi awayeke mezin hatine xerakirin. Hin kes û saziyên Kurdan wek otoriteyekê derketin holê lê fêm nekirin ku mijarên wisa cidî bi biryarên çend kes û saziyan nayên hildan. Divê Kurdên me demildest vegerin eyarên berê ku ev anarşiya mezin ji holê rabe.

Ez ê gotinan zêde dirêj nekim kerem bikin bi naverok û saziyeke nû kovara Bernamegeh li ber destê we ye.

www.arsivakurd.org

NAVEROK

3- Edîtor
4- Naverok
5- Mîr Celadet Bedirxan; di Oxirkirina 69 Salî de / Konê Reş

7- Helbestvanekî azadîxwaz, welatperwer û sosyalîst: Qanî / Occo Mahabad

10- Şikeft / Omer Dilsoz

12- Vê Sibehê Sivik Wekî Per im / Mervan Serhildan

15- Rivîna Dilê Min / Laleş Qaso
17- Şin, Işt, Gîn / Qendîl Şêyxbizînî

21- Jiyana Dengbêj Seyîdxanê Boyaxçî
22- Çîrokên Civakî û Toreyên Kevneşopî / Lokman Polat

23-Boxê Gulan / Mihemed Hemkoçer
26- Jiyana Zeynelabidîn Han

27- Ola Zerdeştî / Yaqûb Kurmanc
31- JiWelatê Xwe Hiz Dikim / Têngîz Siyabendî

32- Min Hest Kir, Name / Bawer Yekta
33- Payîz / Eskerê Boyik

34- Zimanê Standart Ango Kurdiya Akademîk / Îhsan Bîrgul

35- Helbest / Şêro Dalînî
37- Jiyana Behlûlê Mahî

38- Ka Rola Întelecinsiya Kurdî? / Mihemed Hesko

40- Newaya Rengîn / Mehmûd Badilî
45- Kurdistan / Elind Mizûrî

46- Heyîvokî ya me, Feminizma Cihanî û kapîska Swêdî / Nesrîn Rojkan

49- Karîkatûrên Kurdî
50- Çîroka Kerekî Mirarî / Yasemîn Elban

52- Di Dîroka Kurdistanê De Bê Bextî û Bê Tifaqiyek / Remezan Bakur

55- Helbest / Cîhan Hesen

56- Kedîkirina Tirsê / Sedat Yurtdaş

60- Tofana Dil / Bahadin Robar

61- Pîr Şalyarê Zerdeştî Yan Pîr Şalyarê Yarsanî Yê Feylesof?
Soran Hemereş Kurmancîkirin: Muhsîn Ozdemîr

66- Şevêdî / Melevanê Baranî

67- Li Serhedê Rojên Zivistanê / Yücel Aslan (Koçer)

70- Berawirdkirina Çîrokên Duh û Îroyê, li ser ên Qedrî Can û Mehmed Dîcleyî / Ahmed Kanî

75- Helbest: George Trakl Wergera ji Elmanî: Ciwan Qado

76- Salihê Biro behsa Gilîdaxê dike / Nihat Gültekin

80- Biryar / Hecî Ehmed Bêrkiyatî
81- Evîna Pîrê / Dilbirîn Dilo

82- Li Xewlegehên Bajarê Min / Gernas Roderîn
83- Serdûpişk / Metîn Arî

84- Hemedê Qutikspî / Amed Çeko Jiyan
86- Ceng , pêt û kena şervanekê / Sakar Kamil Osman

88- Hezkirina ji jîyanê û tirs û xofa ji axîretê! / Ikram Oguz

91- Cîgerxwîn û Dêrika Çiyayê Mazî / Eyyup Guven

95- Subehî dê mirim / Kurteçîrok: Xwan Xusîh Miyas / Wergêr: Hesenê Silêvaneyî

97- Helbest / Zana Taş
98- Silûka Sofî û Qerentînaya Civakê / Hejarê Farqînî

99- Dengbêj Resoyê Gopalan / Dengbêj Evdirehîmê Mûşî

100- Ey Balindo / Mehmûd Birîmce
102- Payîzê Welatê Ma / Enwer Yilmaz

105- Kerkûk - Helbest: Letîf Helmet Ji Soranî: Yasîn Hisên

www.arsivakurmanci.org

Mîr Celadet Bedirxan; di Oxirkirina 69 Salî de



KONÊ REŞ

Çendî em li dor Mîr Celadet Bedirxan û hevalên wî binivîsin û wan bi nifşê nûhatî bidin naskirin baş e.. Çendî em navdarên xwe bibîr bînin, em qenciyê li xwe dikin.. Ku ez û we wan bibîr neyînin, ma wê kî wan bibîr bîne..? Bi helkeftina ku di roja 15/7/2020an de 69 sal di ser koçkirina Mîr Celadet bedirxan re derbas dibe, bi min xweş e ku ez salên wî yên dawî, ji we re raxînim ber çavan.

Piştî herifandina şoreşa Araratê di sala 1930î de, piranîya serkêşên şoreşê û endamên Komela Xoybûnê xwe li nav Kurdên Sûriyê girtin. Li ser daxwaza Kemalîstan, hikûmeta Fransî ya ku di Sûriyê de desthilat bû, piranîya lehengên şoreşê û lebatên Komela Xoybûnê ji ber sînorê Tirkiyê bidûr xistin, ew li Şamê civandin, da ku dûrî tixubên dewleta Tirkiyê bin.

Hingê Mîr Celadet Bedirxan, yek ji wan kesan bû û xweş jê re hatbû xuya kirin ku, êdî nema karin bi şerê çekdarî azadiya welatê xwe bilind bikin. Vêca wî xwest bi pênûsê azadiya zimanê xwe bilind bike û di 15 gulana 1932an de hejmara pêşî ji kovara xwe (Hawar) ê li Şamê çap û belav kir û di rûpelê pêşî de got:

(Hawar dengê zanînê ye, zanîn xwenasîne, xwenasîn ji me re riya felat û xweşîyê vedike, her kesê xwe nas dike dikare xwe bide naskirin, lewre ziman şerta heyînê ya pûşîne..).

Di pey kovara (Hawar) ê re, di sala 1942an de kovareke din bi an re a ku wê di rojêntîpên latînî bû.

Mîr Celadet Bedirxan, xwedî û berpirsyarên van herdû kovaran bû, wî jiyana xwe di ber zimanê Kurdî de mizaxtîye, ji Hawarê (57) hejmar hatine weşandin, ta sala 1943an, û ji Ronahî (28) hejmar hatine weşandin ta sala 1946an. Piştî ku Fransîzî ji Suriyê celî bûne di sala 1946an de, ev rêkên rojnamevanî li ber Mîr Celadet hatin girtin, zimanê Kurdî qedexe bûye û hin bi hin rewşa Mîr Celadet ya abûrî ji berê xerabtir bûye.

Di sala 1947an de, li ser daxwaza Kurdên Cizîrê, Mîr Celadet hatiye hilbijartin ku bibe nûnerê wan (Kurdên Cizîrê) di perlemantoya Sûriyê de, belê 24 demjimêr di ser wê hilbijartinê re derbas nebûnî hikûmeta erebi di Sûriyê de destê xwe danîn ser û careke din ew kirin bin rûniştina zorê de li Şamê

www.arsivakurdi.org



û divabû her heftî dû rojan xwe şanî walîyê Şamê bide. Di sala 1948an de, dema şerê Ereban û Cihûyan dest pêkir, hingê Mîr Celadet Bedirxan wek berpirsyarê Kurdên Sûriyê pêşinyarek ji hikûmeta Sûriyê re pêşkêş kir ku hêzekê ji Kurdan damezirîne û amade bike, li kêleka Ereban î dijî êrîşên dewletên cîran û Cihûyan û bi wan re alîkar bin, lê mixabin ew pêşinyara wî di ser guhan re hat avêtin..

Di sala 1949an de, rewşa wî ya abûrî roj bi roj lawaz û kêmtir dibû, dost û hevalên wî hin bi hin dûrî wî di ketin, erê hin ji hevalên wî yên maldar û zengîn alîkarîya xwe jêre pêşkêş dikirin, lê wî alîkariya kesekî qebûl nedikir.

Di sala 1950î de, ji neçarî razî bû ku bi hevalê xwe yê neçîrê (Hisên beg Îbiş) û (Malbata Xetab) re pembo biçine li gundê Hecanê nêzîkî Şamê bi nêvî, ji wî pemboyî re bîrek kola û ji gundê Hecanê qut nebû, karê wî mabû çavnêriya karkerên avdana pembo, da ku bi hevalên xwe re rû sipî derkeve..

Li ser wê bîrê gelek caran di rewşa xwe de diponijî û digot:
(Ez li kû, cenanti û avdana pembo li kû, qey ev jî qedera mine...!).
Wî navê bîra gundê Hecanê kir (Bîra Qederê), lê heger mirov li kovara (Ronahî) hejmara 25an sala 1944an vegere wê rewşa Mîr ya xerab di warê abûrîyê de xweş nas bike:

(Aniha ez di aqilê Xwe dibînim ku ez bûme serseriyekî dinyayê, bê mal û menal û war...); ji wê hingê ve, tev nameyên ku ji gundê Hecanê (30 km dûrî Şamêye) ji kebanî û zarokên xwe re dişandin, Bîra Qederê di bin wan re dinivîsand.
Di nameyekê de ji wan nameyan, mirina xwe ya nêzîk jî nîşandaye: (Ez dixwazim berî mirna xwe, ko ne dûre, tiştekî biçûk ji were bihêlim, ma ev ne hewceye..? Tiştê ko ez dixwazim, ko xwedê bi destê min bigre, bawer dikim ko ez bi pêwîstiyên xwe ji bo gel û welatê xwe, bi awakî çak û bêtir jî rabûm û niha divê jî bo mala xwe jî tiştekî bikim...)

"Bîra Qederê 20 Nîsanê 1951"
Piştî vê nameyê bi 84 rojan, Mîrê ziman û rewşenbîriya Kurdî ya resen Mîr Celadet Alî Bedirxan bi sedema wê bîrê di roja 15/07/1951ê de çû ber dilovaniya Xwedê.. Roja îro navê wî wek stêreke geş di asmanê Kurdistanê de diçirise.



Helbestvanekî azadîxwaz, welatperwer û sosyalîst: Qanî Occo Mahabad

Her millet bi çînan pêk tê. Her helbestvan jî girêdayî fikr û ramanekê ye**. Qanî** mîna **Hejar, Goran, Hêmîn, Qedrîcan, Cegerxwîn** baweriya xwe bi armancên çepî tîne û heta mirina xwe wek şairekî çepgir, yekîtîparêz, welatperwer tevgeriya, ji bo pêkhatina fikrên xwe her û her şer û tekoşîn da.

Ew şairê gundî, cotkat, kedkar û belengazan e lewma jê re gotine ku **Şairê Bindestan**. Em dikarin jiyana Qanî bi du heyaman tehlîl û şîrove bikin.Di heyama yekê de Qanî hê xort e di bin bandora fikrên metafîzîk û rûhanî ne. Hê hişmendiyeke çînî, netewî û civakî pê peyda nebûne. Di heyama duyemîn de diguhere, dibîne ku milleta Kurd di bin dagirkeriyeke giran de dinale, ne azad û serbixwe ye, feqîr û bindest hatine hiştin. Hewl dide ku xelkê xwe hişyar bike rake li ser piyan ku ji bo şoreşeke netewî, çînî şer bike û têbikoşe. Qanî ji bo xelkê xwe yê tê mêtîn û çewisandin bi helbestên xwe dibe roniyek û rêyek. Dixwaze ku ciwanên nezan ji bo pêşeroja neteweya xwe bi nivîs û çalakiyên watedar, welatê xwe ji bin nîrê serdestiya mêtîngehkaran rizgar bikin. Qanî li dijî emperyalîzm, faşîzm, û mêtîngeriyê wek şairekî azadîxwaz, welatperwer, çepgir û sosyalîst derdikeve pêşberî me.

Navê wî yê rastîn **Mihemed Kabulî** ye ji binemala Kabulî ye. Ev bi nasnavê **Mamoste Qanî** tê naskirin. Malbata wî giregirên naskirî ya vê herêmê ye. Qanî di sala 1898an de li gundê Dolaşê ku girêdayî Merîwanê ye hatiye dine. Kurê Şêx Ebdilqadirê Şêx Seîdê kurê Şêx Mihemedî Dolaş e. Hê zarokekî çil rojî bûye bavê wî dimire. Piştî du salan diya wî jî jiyana xwe ji dest dide. Qanî sêwî dimîne. Apê wî Seyîd Ehmed Qanî lê xweyî nake. Li cem Axa Seyîd Huseynê Çûrî li gundê Çûrê mezin dibe.
Divê ez têbiniyeke girîng diyar bikim ku hinek çavkaniyên Kurdî, Îngilîzî û Fransî de gundê ku Qanî lê welidiye wek Rêşîn hatine qeydkirin lê hin çavkaniyên Kurd, Faris û Ereban de cihê ku lê çêbûye wek Dulaş an jî Dolaş hatine nivîsandin. Dîsa hinek çavkaniyên Kurd û Ereban de navê gundê Çûrê wek Çorê hatine nivîsandin.

Qanî li Merîwanê mezin dibe. **Merîwan** îro di bin banê eyaleta Kurdistanê de bi nifûsa xwe ya 150î hezarî bajarekî biçûk e. Bi gola xwe ya Zirevarê tê naskirin. Nîştecihên vî bajarî bi giştî Kurd in lê hinek Fars û Azerî jî tê de dijîn. Eyaleta Kurdistanê bi deh bajaran pêk tê, serbajarê vê eyaletê Sinê ye. Li Sinê bêhtirîn zaravayê Erdelanî tê axavtin. Nifûsa Sinê îro gihiştiye 500 hezarî. Sîne bi wêjevanên xwe yên navdar Mestûre Erdelanî û Ebdulmecîd Mîrza tê naskirin. Îran bi giştî 31 eyaletan pêk tê.

Axa Seyîd Huseynê Çûrî ji bo ku Qanî perwerdeyeke olî bibîne wî dişîne medereseyê. Dema ku dibe feqî ji bo debara xwe gundên Merîwanê digere ku feqîtiyê bike. Qanî bi van salan bi helbestê re mijûl dibe. Helbestên wî yên pêşî, gellek metafîzîk û rûhanî ne. Tesîra hişmendiya medrese û ola Îslamê mezin e. Zimanê helbestên wî jî bi giştî Farisî ne.

Em dikarin bibêjin ku guherîna wî ya fikrî bi feqîtiyê re dest pê dike. Di dema feqîtiya xwe de gellek bajarên Iraq û Îranê digere.

Bi şahidbûna rewşa gundiyên belengaz ku di bin zordestiya axa, mîr û began de eza û cefayên mezin didîtin hemû hişmendiya wî diguherîne û li dijî zordarî û stemkariyê disekine. Di van geran de gellek kesên demoqrat, sosyalîst û qomînîst nas dike bi wan re têkiliyên saxlem datîne. Bi peydabûn û çêbûna fikrên netewî zimanê helbestên wî jî dibe Kurdî. Bi zimanê xwe yê dayikê gazî gundî û rênçberan dike ku bila li dijî pergala axa û mîrîtiyê şer bikin û mafên xwe yên xwezayî bi dest bixin.

Ji bo jiyana wî dewreke girîng jî peywira meletiyê ye. Di meletiya xwe de Merîwan, Sine, Seqiz, Bane, Mahabad, Hewlêr, Silêmanî û gelllek bajarên din digere, mirovên bindest û hejar ji nêz ve dibîne û nas dike. Helbestên welatparêz, yekîtîxwaz, azadîxwaz, dij-faşîst û kolonyalîst dinivîse.

Helbestên wî yên di vê dewrê de em dibînin ku Qanî li dijî faşîzma Iraq û Hîtlerê ye. Şerê duyemîn yê cîhanê tesîr lê dike di helbesta xwe ya bi navê **Eger Mirdim** de hem li dijî faşîzma Hîtlerê hem jî li ser rizgarkirina welat disekine.

Qanî yekîtîparêz e naxwaze eşîrên Kurdan di navbera xwe de şer bikin û alîkariya dijminê Kurdan bikin. Di helbesta xwe ya **Wesyatname** de bang dike eşîrên Goran, Erdelanî,Herkî, Bextiyarî û yên din, bila destê hev bigrin û ji bo Kurd û Kurdistanê bi yek bibin û têbikoşin.

Ew alîgirê maf û azadiya jinên bindest e. Di helbesta xwe ya **Bo Kiçekan** de paşverûtiya civakê dibîne, li ser pirsgirêkên jinan disekine û dadixuyîne ku jin û keçên Kurdan ji bo pêşeroja xwe bixwînin û bixebitin.
Qanî her çiqas meletiyê kiribe jî karê meletiyê nedomandiye. Nexwestiye ku bi karekî olî debara xwe bike. Ew ji karkeriyê bigire heta cotkariyê pirr kar û baran de dixebite. Di sala 1939an de li ser rêya Silêmanî û Pêncîwînê ji bo **Rêveberiya Şaxa Çêkirina Rê û Baniyan** demekê karkeriyê dike. Ji ber xebata rê nexweş dikeve û helbesta **Nexwoş im Çi Bikem** dinivîse. Di vê helbestê de hem behsa halê xwe yê nexweş û reben dike hem jî rewşa karkerên hejar û bindest vedibêje. Rizgarbûna karkeran di pergala sosyalîst de dibîne, pergala serdest ya maldaran wek xwînmij, kedxwar û paşverû dibîne ji bo hilweşandina vê pergalê karkeran hişyar dike, naxwaze pergala emperyalîst karkeran bixapîne.

Ew welatperwer e, axa Kurdistanê ji her tiştî zehftir hez dike. Di pirr helbestên xwe de delalî û xweşikiya Kurdistanê bi zimanekî lîrîk û sade dinivîse. Di helbesta xwe ya **Xakit Benirx e** de tu tiştî mîna axa Kurdistanê giranbiha û girîng nabîne.
Qanî li dijî mêtîngeriyê ye. Di gellek helbestên xwe de dewlemendiyên binerd û sererdên Kurdistanê yeko yeko dijmêre û ev hemû têra me dike li vî welatî xwedî derkevin dibêje. Di helbesta xwe ya **Sûdî Wilat Im** de hilberînên çandiniyê yên Kurdistanê rêz dike, gazî dike ku zengînî û dewlemendiya vê axa qedîm û adan bê parastin.

Qanî sosyalîst û şoreşger e. Di sala 1947an de li gundê Kewlûsê yê bajarê Şarezûrê paletî û rencberiyê dike. Di vê salê de helbesta **Qelaçûy Dijmin** dinivîse. Baweriya xwe ya sosyalîstî li ser kaxizan rêz dike û felatbûna karker û cotkaran di Şoreşeke Sosyalîstî de dibîne.

Qanî ji dayikbûna xwe bigire heta mirina xwe wekî karker û cotkaran bi feqîrî û rebeniyê ve jiya. Emrê wî bi tekoşîneke şoreşgerî derbas bû. Di sala 1963yan de bi kurê xwe re li Îranê tê girtin. Demekê di zîndana Qecerê ya li Tehrenê girtî dimîne. Di bin şert û mercên giran de nexweş dikeve, ew bi kurê xwe re rojên dijwar derbas dikin.

Ew şairê mezin û fedakar ku jiyana wî bi tevahî ji bo azadiya Kurd û Kurdistanê derbasbûyî di meha gulanê ya 1965an de li gundê Lengedê ku girêdayî Pêncwînê ye jiyana xwe ji dest dide. Hemû jiyana xwe ji bo rizgarbûna bindestan feda dike. Ji xêynî helbestên wî, tu zêr û dewlemendiyên wî tunebûn. Dema ku dimire 67 salî bû û di cêba wî de 300 Filsên Iraqî hebûn.

Helbestên xwe bi zimanê Kurdî, Farisî û Erebî nivîsandine. Helbestên wî yên neçapkirî yên çapkirî zehftir in. Dîwana Seîdê Şîrazî ya bi navê Gulistan ji Farisiya Klasîk wergerandiye ser Farsiya Nûjen.
Berhema Reşîd Yasemî ya Dîroka Kurdan bi alîkariya Kerîmzend ji Farsî werdigerîne zimanê Kurdî.

Dema ku Qanî diçe Erdelanê binemal û giregirekî Erdelanî jê re li ser çand û dîroka Erdeleniyan destnivîseke bi qasî 220 rûpelî dide. Qanî vê berhemê ji Farisî werdigerîne Kurdî. Pirtûk di warê xwe de wek xezîneyekê ye ku behsa serpêhatî, cih, war, çand, dîrok û mezinên Erdelaniyan dike.

Qanî li ser dîrok û rûdanên Kurdistanê pirtûkeke 380 rûpelî dinivîse, rewşa aborî, siyasî, darayî, çandî û bi taybetî li ser şoreşa 1961î bi ziman û hişmendiyeke vekirî disekine.

Heta niha bi navê **Guleley Merîwan, Baxçey Kurdistan, Deştî Germiyan, Şaxî Hewraman, Çwarbaxî Pêncwîn** 5 berhemên Qanî bi zaravayê Soranî hatine weşandin.

Sed heyf û mixabin, Kurdên me helbestvanên xwe yên klasîk û nûjen bi qasî şair an jî hunermendên Tirk, Ereb,Faris û yên Cîhanê nas nakin. Her rengê siyaseta Kurdî bi tenê bi propagandeyeke rêxistinî mijûl in zêde girîngiyê nadin çand, hûner, ziman û dîroka Kurdan. Medyaya ku di bin sîwana siyasetê de ne, bi tenê nûçe û ajîtasyonê re pêwendîdar in. Edîtorên Medyaya Kurdî bi têkiliyên dost, nas û cîrantiyê peywirên xwe bi cih tînin û bi hişmendiyeke netewî tevnagerin. Bi hezaran helbestvan an jî dengbêjên me hene lê medyaya Kurdî radizê. Bi sedan malperên nûçeyê hene lê 10 heb malperên fermî yên çandî, hunerî û dîrokî tunene. Em bi destê xwe, pêşeroja xwe jar û belengaz dikin. Hevalno ji kerema xwe derfetên xwe hinek ji bo çand û hunera Kurdan xerc bikin.





OMER DILSOZ

ŞIKEFT

Gelo mirov hê jî dikare helbestan lêke?
Çi zanim,
Bo nimûne:
Rojekê mucîzeyek çêbe
Wekî Brehîmê bavê pêxemberan
Berek ji dîwarê şikefta te bikeve
Û şewqa heyvê bavêje binê şikefta te
Tu bikevî pey û bibêjî: Xwedayê min ev e!
Erê erê, Xwedayê min ev e!
Paşê hew dibînî heyv diçe ava; heyv ava dibe

Û elinda sibê bi dû de tê
Tu di wê qula dîwêr re dibînî
Ku vê carê tiştek ji heyvê rontir li ezman xuya kir
Ew jî roj e
Tu bêjî: Na.. naxêr Xwedayê min ev e!
Paşê ew jî biçe ava
Tu bêjî: Na na, naxêr, Xwedayê min ev e; ev roj e
Paşê dem diçe hêdî hêdî û roj jî diçe ava

Û tu dibînî esmanê sayî xwe radestî stêran kir
Stêrk
Wekî zîv di stû û gerdena esmanî ve dibiriqin

Ha wekî Îbrahîm tu dibêjî Xwedayê min çû
Nexwe Xwedayê min çi ye?
Tu dibêjî: Xwedayê min ew e
Ku heyv û roj û stêrk bi hev re çêkirî

Nizam
Ma carina kevir ji dîwarê şikefta we jî nakevin?
Ji nişka ve
Şewq û tavek xwe nade pala şikeftê
Û ma hûn jî nakevin pey û nabêjin: Welle, ronahiya dilê min ev e!
Paşê jî ew ronahî vedimire bi ronahiyek dî
Paşê reşahiya şevê bi ser de tê
Û wê demê tu bi spehîtiya stêrkan dihesî; çirûsîna wan
li ser şînahiya esman
te li xwe dike heyran
Paşê jî reqsa çilvilîna wan a li ser avê
Paşê jî kevirek dî ji dîwarê te dikeve
Û şikefta te dicemide;
Paşê kevirek dî ji dîwarê şikefta te dikeve
Û serma davêje binê şikefta te

Te qet dinyaya derî şikefta xwe mereq kiriye gelo?
Tu dizanî di şikeftên dî de çi û çi heye?
Tu dibê, gelo her kes xwedî şikeftekê ye?
Gelo em tev ji şikeftên xwe derketine?
Em tev ehlê şikeftan in!

Rojekê
Hew dibînî kevirek ji dîwarê şikefta te dikeve
Sêhra te betal dibe
Sirra te ayan
Şikefta te dicemide
Dilê te bi tirsê wer dibe
Aha
Serma tirsê tîne
Hingê tu dizanî jiyan tiştekî dî ye

Te
Şewqa heyvê,
Reqsa stêrkan
Û helesorka tavê li dîwarê şikefta xwe nikirandibû
Dengê dilopa baranê jî lorika te bû
Tenê zimanek te dizanibû
Na na tê çi bi zimanan bikî
Tenê peyvek te dizanibû
Ew jî têrî te û heft bavê te dikir
Di şikefta te de dilê te ‘germ’ bû
Dilê te!...

Te tenê peyvek dizanî
Ew jî ‘germ’ bû
Lew heta bêjî pîyar
Heta bêjî têr bi rehm bû
Dilovan… li dilê te ban

Paşê berek ji dîwarê şikefta te ket
Niha dinya tev bûye warê te
Tu ji şikeftan derketî
Te medeniyet ava kirin
Lê mixabin tu êdî ne yê ‘xwe’ yî
Tu bûyî tiştekî dî
Ji wê germahiyê
Ji wê tîhnê
Ji wê rehma di şikeftê de
Dilopek tenê jî di dilê te de nemaye
Tu bûyî hût
Tu bûyî dirinde
Û tu bi can û goştê mirovên dî ketî
Te xwe xwar
Te xwe xwar
Tu têr nebûyî

Erê
Niha çiqas bêriya wê şikeftê dikî
Çi warekî germ bû; serê te rehet!...
Wekî şîrê helbestekê
Tahma wê hingvîn
Bêhna wê asmîn
Rengê wê kêlestûn

Aax ax!
Îro dibêjî xwezî!
Sed xwezî bi wê şikeftê, xwezî!

Vê Sibehê Sivik Wekî Per im



MERVAN SERHILDAN

Vê sibehê serê min li kevirê heqîqetê dikeve, jiyana min a kambax li dawiya debara xwe diedile; vê sibehê kevirê heqîqetê li serê min dikeve, hawir di nav reşdûxaneke tarî de ye, ne kes min dibîne û ne jî kes ji min ve xuya dibe. Vê sibehê xeyalên min ên rengîn di tariya şevê de dimînin, hêvî û bendewariyên min li edmê dikevin; kevirên temenê min ê têkçûyî bi ser min de dirûxin.

Vê sibehê baranên şermê li min didin, zîpikên tofanî li min dibarin, tîr di giyana min radibin; vê sibehê her ku radibim dîsa dikevim, her ku hewl didim têbikoşim li bêtaqetiyê diasirim, her ku diqîrim di dewkêleke bêdeng de diçelqim. Vê sibehê xemên min bi rûpoş digerin, hestên min dîl dikevin, heskiriyên min dijayetiyê dikin, hemû dostaniyên min xav derdikevin, xweziyên min di gewriya min de dimînin; vê sibehê li ser agir û pêtên dojeha têkçûyiyan dibirijim.

Vê sibehê ji şeveqê de li bextewariya evînê digerim, li dildarên hestewar digerim, li lehengên fedekar digerim û di xewnên lîrîk de xwe serkeftî dibînim; lê ezbenî lêê, tu ji xwe re li vê sosretê binêre ku vê sibehê serkeftinên min derew derdikevin, lêgerînên min bêencam dimînin, serêşên binketina min pêl bi pêl hildidin. Vê sibehê şiyar dibim ku şeveqên berxwedêr wekî peyayên pergalê têdikoşin, berbang bi serê min de diteqin, bager û bahozên şoreşê xezebê li min radikin, kêr û guzan bi cesedê canê min dikevin. Vê sibehê dil û dêhnên min li xwe mikur tên ku gelek sazî, avahî û navendên tevna berxwedêr di bin tora dagirkeriyê de dieciqin; vê sibehê çavdêrên welêt bi çavên seriyan dibînin ku gelek partî û rêxistinên gelê berxwedêr wekî diranên çerxa desthilatdariyê digerin.

Vê sibehê ji min tê ku hemû bawernameyên xwe biçirînim, kirasê xwe zîvalzîvalî bikim, defa sînga xwe veçirim û biqîrim; vê sibehê dixwazim bi coşeke delodîn bibezim, bifûrim, dengê zêmarên xwe bi asîmanê şîn ve bizeliqînim; vê sibehê divê reşa qewmê xwe, gazî û hewara gelê xwe li wargeh û jîngehên paqijmayî bigerînim û qirik û gewriyên xwe biqetînim; vê sibehê divê gosirmetên ku bi serê min de hatine veguherînim gilokên hêrsê û bi dinyayê de biteqim.

Lê vê sibehê destarên hêzê bedena min dihêrin, curmê canê min bi mîrkutên serweriyê dikutin, şax û guliyên min dibirin, ruhê min bi pençeyên cinawirî dixerpişînin, qirik û gewriyên min dijidînin, pîroziyên welatê min di hişkeleyên gol û gewman de dixeniqînin. Vê sibehê min bi te, te bi min; me bi we, we bi me; wî bi wê, wê bi wî dixin; waweylê, îro vê sibehê heqîqetek vedibê ku kurd û kurdistaniyan bi hev dixin…

Vê sibehê li me eyan dibe heyran, dagirkerî jehreke kujer e; pê re meş nabe, pê re hevrêtî nabe, hevrejiyaneke pê re li darê dinyayê qebûl nabe ku biryara me biryar e; em vediqetin



dostino weha nabe; vê sibehê diyar dibe hogirno, rû û rûmet binikiyeke weha hilnayne, vebijark nemane ji xeynî ku bê gotin “em ji dagirkeran diqetin!”, lewra wijdan ji hevrejiyaneke weha re dibêje “nabe!”. Vê sibehê dilê min li yan e; şoreş bi şik e, bi fikar e û bi guman e, di mala xwe de jî rehetî û aramiyê nabîne.

Vê sibehê dilê min li yan e; em, hûn, ew û herkes dibîne ku legala me tevî sazî û dezgehên xwe ker û lal e; ken, kort, çal û bîrên ku bi vakûm û valahiyan vebûne, bi parsa xweziyan tije nabe. Vê sibehê tu kes bar hilnagire, berpirsiyariyê wernagire; heqîqetê kifş nake; ma tenê bi peyvên ezber, bi dubarekirina gotin û şîarên serokan qewmek, gelek, neteweyek rizgar dibe?..

Ezbenî heqîqeta vê sibehê afirîneriyê dixwaze, bi wêrekî vegotina rastiyê dixwaze, bi fedekarî ronîkirina riya azadiyê dixwaze; vê sibehê lawazî, bêkêrî û bêvîzyoniya me curhetê dide serwerên axa me û eşkere dibe ku dagirkerî van nezar û newalên ku vala mane hemûyan dibîne, çal û kortalên ser dil dişopîne, lewma dijberiyên navxweyî dizêrîne û derz û qelşên civakî kûrtir dike ku di van terkan re elemanên xwe dawerivîne.

Vê sibehê birîn derdibe û hertişt kifş dibe ku dagirkerî vakûm û valahiyan bi risteke heyştpê dadigire; piyê çepgir di peyariyekê re, piyê lîberal di guherekê re, piyê keskegirmik di neqebekê re û di nav ahengsaziyeke paralel de bi ber keleha welêt ve bi rê dike. Vê sibehê dagirkerî rêgezên şoreşa neteweyî, partî û rêxistinên vî gelî, hemû hêrs û bertekên civakî dinermijîne; bi rist û teşedana wan dilîze, operasyonên bênavber dimeşîne. Vê sibehê rastî û



xapînerî li nav hev digere, çê û xerab ji hev naneqe, kevir li kûz dikeve, kûz di kevir de diderize, bext û bawerî dişkê, bîr û bal tarî dibe, hiş li rûpoşên zexel diqewime, remz û rûmet di bin potînên reş de dimîne, dinya ditengije, behra civakî diçelqe. Vê sibehê tu kes, tu kom, tu dînamîk ji me re rastiyê nabêje ku 'heyameke ji qîr û qiyamê ava bûye'; vê sibehê kes nabêje ewqasî ezber bes e, ewqasî bêhelwestî bes e, ewqasî bêvîzyonî bes e û vayê radigihînim “hevrejiyana bi kujerên xwişk û birayên xwe re, dê û bavên xwe re, kal û pîrên xwe re napejirînim, berdêl mirin be jî red dikim!..”

Vê sibehê dihizirim ku meramê dilê tije birîn, ji dildar û dilbirînan re ragihînim; bi destpêkê re ku dibêjim, “gundîno, malîno!”, dibînim ku hemû şêniyên şûnwarên qedîm paşa xwe dane min, kes li min guhdarî nake. Vê sibehê li ser baskên xewn û xeyalên xwe digerim, li ser ewran dijîm, bi teyran re difirim; deşt bi deşt, çiya bi çiya, welat bi welat dibezim; vê sibehê sivik, wekî per im ku ji her tiştî, ji her peyvê û ji her gotinê bawer dikim. Vê sibehê ez sivik im, hênik im, hema kî çi dibêje guh lê dikim. Vê sibehê sivik wekî per im, bi ber bayê dikevim, bi ber bayê bezê jî dikevim, wekî tîtremokên vê heyamê hênik, bêrik, bêqirik û bêderbik diteqilim.

Vê sibehê wekî per sivik im, bi ber pifa xelk û alemê dikevim, li ber bilûra çavsoran direqisim. Vê sibehê sosretên derdora xwe dijmêrim lê eşkere dibe ku ez bi xwe sosret im. Vê sibehê ez ji têkçûnên kal û pîrên xwe, ji dîroka xwe û ji binikiyên pêşiyên xwe şerm dikim; lê vê sibehê kifş dibe ku pêşiyên me ji ber pêxwasî û bêkirasiya min, ji ber biniktirîn pozçikiya min hinek jê dîl û perîşan in, hinek jê jî di sêdaran de stuxwar dadiliqin. Vê sibehê xewmaş im, çavên min dipitpitin; rûniştî ji xwe de diçim, rabûnkî dilicimim û nîrê ku dimeşim jî hiş û aqil diçelqin.

Vê sibehê sivik im, hênik im, şaş im, xewmaş im, rastiya ber çavan jî nabînim. Vê sibehê ma qe ez bîr nabim; ma qe ez nabêjim 'ew kom û civakên ku guh li serok û rêberên gel nekirine, dilsozî sotine, bext xerakirine, wijdan di erdê rakirine, exlaq xeritandine, sond û selawat di bin nigan ve kirine, herwiha manîfestoya şoreşa welatê xwe xençer kirine, ma ew ê çawa li te û li guriyên wekî te guhdarî bikin birakoo?' Vê sibehê li xwe, li kambaxiya xwe û li sosreta xwe hayê dibim ku şêst salên min ên girover badilhewa çûne; vê sibehê li hejariya xwe hayê dibim ku tevahiya çîrokên min di ber avê re çûne; vê sibehê li çirkînî û bêmiradiya xwe hayê dibim ku dilberekê jî axîn û fîgana min fêhm nekiriye û ji min hes nekiriye; vê sibehê li karesata têkçûnên xwe hayê dibim ku yên ji kurd û Kurdistanê nefret kirine; ji min û me jî, ji te û we jî hes nekirine; vê sibehê têkçûn li min dibare, kevir li serê min dikeve, serê min li kevirê gorê dikeve!..





LALEŞ QASO

RIVÎNA DILÊ MIN!

Guharên guhên te me
Xeleka tiliya te me
Xizêma bêvila te
Xirxalên lingên te me

Bazinên zendên te me
Gulava ruyê te me
Kildanka di destê te de
Ez kilê çavên te me

Mûçinka buruyên te me
Zincîra situyê te me
Beyendûra li eniye
Morîkên qirka te me

Berbiska biskên te me
Kembera newqa te me
Kubasa li ser guhîjan
Ez qetra lêvên te me

Ez dîn û harê te me
Keslan ketiyê te me
Hêsîrê cemala te
Keleşê bejina te me!

www.arsivakurdi.org



Farûqê Feroyî

E Z

Li dilekî digerim
Dil ê
ji fesadiyê dûr
Dil ê
bê dek û dolav
Dil ê
bê fen û fût
Dil ê
ne kone yê durû
Ne hesûd ê
Wek gûza hesûs
Ne qure yê pozbilind be

Ji xwe re li dilekî digerim
Bila şuştî be
ji qirêjiyê
Bila parzinandî be
ji nezantiyê
Bila li dijî bêbextî û xayîntiyê
Serwext û zane
Bi vîn û berxwedêr be
Bila ji hezkirinê re hêlîn
Ji evînê re jiyan
Ji tariyê re rohnî be.

www.arsivakurdi.org

ŞIN – IŞT Û GÎN



Şin – işt û gîn, di warê rêziman û peyvsaziyê de sê amrazên kevnar û resen in di Kurdîya navîn anku Pehlewanî (Pehlewî) de.

Şin û işt: lêker û peyvan dikin peyveke pesn û wesfê,

Gîn: lêker û peyvan dike peyveke nav û navdêrî,

çawa û bi çi rengî? Ka em ê di dirêjahiya vê nivîsarê de gelek mijarên negotî bidin ber şîkar û lêkolînên dîrokî û rîşeyî.

Amraza “şin”ê lêker û peyvan dike pens û wesfê weke van mînakên ku di jêr de hatine dayin.

Spûjşin: li hember sekinandin, dirêje pê dan, hevrikî kirin, muxalefet.

“spûj” weke kar ango li hember sekinandin, muxalefe kirin

Spîzşin: roşinkirî, ronîbûyî, Ronahîkirî.

“spîz” ango rewşenkirin, ronîkirin

Sirayşin: hozan xwendin, li seraya civat û derbaran.

“siray”niha jî di zimanê Kurdî de kara ye weke di peyva “karwan seray”ê de xuya dibe, ev peyvê ketiye zimanê tirkî jî û weke “saray”ê tê bilêvkirin

Stanîşin: kar û bar jê wergirtin, jê standin.

di Pehlewanî de“stanîten” ango standin

Venîşin: serketin di êrişê de, ber bi pêş ve çûn û serketin,

“venî” ango serketin di şerî de û ber bi pêşve çûn û tunekirina dijminî.

Vanşin: desteserkirî, girtin û wêrankirin, dagirkirî,

“van” ango desteserkirin û wêrankirina cihê dagirkirî

Vîçûsşin: tehhqîqkirî, vepirsîn

“vîçûsten” ango tehhqîqkirin

Zebayşin: duakirî, lavaxwendî, nizakirî.

“zebayten” ango duakirin, nizakirin, lavakirin

Zênşin: kar û barê binçavkirinê, pêvajoya zindanîkirinê.

“zênten, zînten” ango zînkirin, zîndanîkirin. zîndankirin

Buxşin: efûkirî, bexşîn, serbest berdayî, azadkirî.

“buxten” ango serbest berdan, azadkirin, bexşîn û efûkirin

Pesaxşin: cî bi cî kirî, karê cî bi cî kirî, derbaskirina karê, anîne cih.

“pesaxten”tê wateya cî bi cî kirin, temam kirin, bi cih gihadina karekî, weke “pejaj” jî heye .

Spûrşin: karê kamilkirî, mutekemel.

“spûrten” kamilkirin, mutekemelkirin, kemalbûn, temamkirin

Êzîşin: teqwakirî, kar û barê teqwayî, îbadetî, xweda peristî.

“êzîten” tê wateyateqwakirin, îbadetkirin, xweda peristin

Vana pajek bûn ji hezaran peyvên bi vî rengî, di zimanê navîn anku zimanê Pehlewanî de.Ango her peyvek bi amraza “şin”ê dibe peyvekepesn û wesfê.

www.kurdiyakurdi.org

desertification, excommunication, nonprescription, preregistration, transfiguration, vascularization, autocorrelation, intermodulation, exemplification, acclimatization, maldistribution, circumscription, nonintervention, photoionization, codetermination, complementation action, nation, option
helbet di zimanê din û bi taybet di zimanê fransî de ev amraz bi awayeke hinek cudatir heye, lê mijara me tiştekî din e, lew zêde bi ser de naçin.

Amraza “işt”ê di Pehlewanî û Avestayê de. her weha amraza “işt”ê jî heman rola “şin”ê dibîne bi taybet di Avestayê de, gelek mînakên wê jî hene û ta niha weke xwe mane, bo mînak:
rewişt: exlaq.
pîrayişt: xemlandin û rêk û pêk kirin.
arayişt: xemlandin û makyajkirin, rêk û pêk kirin û lûs û saf kirin.
“ara” ji lêkera “arasten” a pehlewaniyê tê, ango saf û rêk kirin, ev lêkerê niha di zarê Hewramiyê de maye û di zarê Soranî û Kehhorî û farsî de jî weke “arayiş”ê maye û likar e.
guzarişt: bi erebî te’bîr
guzar ji peyva “vîzar”ê ya Pehlewaniyê tê, paşî weke “vîzar, guzar” bi cih bûye
fermayişt: kelam û hozan, gotinên pîrozwer, keremgotin.
peyv Pehlewanî ye, “fermayiten, fermûten, fermûn” ango keremgotin
deşt: der, nehundir.
geşt: ger û geryan.
Ev çend mînak bûn ji sedan mînakên din ku ta niha jî mayinde ne û likar in.

Her weha amraza “işt”ê di gelek peyvan de weke “ist”ê jî bi cih bûye, bi wateyeke din dengên “ş & s” cîguher bûne.Xengî çend peyvek nebe ku bi amraza “ist”ê bersaz in, yên din hemû bi “işt”ê bersaz bûne, em dikarin çend mînakên ku bi amraza “ist”ê jî bersaz bûne binivîsin, bo mînak:
zanist: zanîn û zanyarî, îlim
tuwanist: şiyan, jêhatî, kana
fêrist: fêrbarî
şayist-e: qabîliyet
Gerek em vê yekê jî bizanin ku peyvên bi “ist”ê bersaz bûne tazetir in.
di zimanê înglîzî ya îro de ev amrazê bi awaya “ist”ê kara ye, lê bi wate û lojîka faîliyê, weke van mînakên jêrîn e:
artist, capitalist, communist, prodist, oportist hd…

Niha di zimanê Kurdî û farsî de her du amrazên dawîn ên “şin & işt”ê sûvine ango hatine jêbirin û weke “iş”ê bi cih bûne û likar in, weke van mînakên ku di jêr de hene:
fermayiş, arayiş, pîrayiş, sîtayiş, aramiş, nîgariş, perweriş, peristiş, newaziş, numayiş, werziş, barişhd…
Ev amraz di farsî de pirr likar e, di zimanê Kurdî de, em berê xwe bidin zarê Hewramî, dibînin li wir jî ta radeyeke baş likar e, di zarê Kelhorî de hinek kêmtir, di zarê zazayî de jî her wisa, di zarê Soranî de hê kêmtir dibe, lê cihê têraman û lêramanê ye ku ev mijar bi her du amrazên “şin & işt” û weke “iş”ê jî di zarê Kurmancî de tam pasîv e û nexuya ye, gelo mijar û sedem çi ne…
gerek ev yek bihête vekolîn û lêkolîn ka gelo sedem çi ne?
Em werin ser amraza “gîn”ê û serpêhatiya wê.
Amraza “gîn”ê vê carê lêker û peyvan dike nav û navdêr helhebt em dikarin bêjin mixabin ev jî zêde di zimanê Kurdî de nemaye, lê hê di hin peyvan de likar e, berovajî “şin û işt”ê ku tam pasîv û nexuya ne, meger tek û tûk li vir û li wir di çend peyvan de mabin. Bo zêdetir zelalî û şîkariyan em ê çend mînakan bidin ku lêker û peyvan bi amraza “gîn”ê dibin peyveke nav û navdêr, bo mînak:

lezgîn: lezkirî û lezbûyî

hezgîn: hezkirî û jêhezbûyî

xemgîn: xemkirî û xembar bûyî

xwazgîn-î: xwastinî û daxwazkirî

sergîn: a herî serî, tişta yekem û seretayî

navgîn: navîn û a navî, tişta di navê de

bergîn: her tiştên di xwarê de, a xwarî

sazgîn: sanayî, tiştên sazkirî û çêkirî

bazgîn: vekirî, vekirbûyî, îftîtah

damgîn: qapat û dam bûyî, tiştên hatibe girtin, qapat bûyî, şêklû

rastegîn (rasteqîn) tişta ne derew, a rast û durust, rastîn

xanegîn (xaneqîn) malî, têdeyî, di nav de mayin

bargîn: barkirî, her tiştên bar e

gozgîn: her tiştên gostî, vegostî, veguhestî, neqilbûyî

nazgîn: binaz û nazdar

hd…

Di vir de em ta radeyekê gihiştin hin encam û agahiyan. Ango:

şin &işt: lêker û peyvan dikin peyveke, pesn û wesfê,

gîn: lêkerê û peyvan dike peyveke nav û navdêr.

Lê eger em berê xwe bidin zimanê farsî dibînin ku amraza “gîn”ê jî bi heman awayê “şin & işt”ê deng û tîpa dawînê sûviye û hatiye jêbirin, weke amraza “gî”yê bi cih bûye, bo şîkarî û agahiyên zêdetir kerem bikin em ê hin mînakan di jêr de bibînin.

xanewadegî, bestegî, zîndegî , ranendegî, numayindegî, wîjegî, sadegî, şekestegî hd…

Weke me amaje da eger em berê xwe bidinê, em wê dibînin zimanê farsî di her sê rewşan de anku di her sê amrazan de tîp û dengê dawînê bilêv nakin vî awayî:

şin & işt bûne, iş

gîn jî bûye, gî

Her weha divê em vê yekê jî ji bîr nekin ku di dirêjahiya demboriya hezaran salî de gelek mijarên rêziman û zimên ji wate û mebestên xwe zêdetir derdikevin û di çendîn wate û mebestên din de jî cih digirin yan jî bervajî. Lê em dibînin dizimanê Kurdî de bo mijara lêker û peyvên ku bi amraza “gîn”ê dibine peyveke nav û navdêriyê, amraza “gîn”ê hê weke xwe tê bikaranîn.

-

Di vê beşê de ku yek ji serektirîn mebesta me ye, her du rewşên “iş û gî”yê ye di zimanê tirkî de.

Weke em dizanin ku tirk regezeke hem weke etnîk û hem jî weke zimên yên asya navîn in, bi taybet di navbera her du dewletên niha yên kazaxistan û mongolistanê de, piştî koçkirina wan ber bi rojhilata navîn ji ava xezerê anku qezwînê derbas bûn, destpêkê derbasî aterupatiyan yan jî azerbaycana niha bûn û piştre jî ber bi Kurdistan û anatoliayê ve hatin û li vir warnîşîn bûn, di heyama kêmtir ji hezar salên borî ya li vir, bûne xwedî gelek desthilat û dewletan û di şer û kuştin û talankirinê de jî ji destê wan çi hat, wê kirin. Lê hem weke regeza îtnîkî û hem jî weke zimên, tevlî xelkên Kurdistanê û anatoliayê bûn, bi wateyeke din ne xelkên wan û ne zimanê wan bi reseniya xwe neman, ewpirranî helyan di nava xelkên resen yên Kurdistan û anatoliayê de, zimanê wan jî beşeke mezin ji reseniya xwe ji dest da, lê di şûna wê de xelkekî netirk bi xwînê be yan jî bi her awayî be xwe weke tirk pênasekirin û hesab kirin, zimanê wan jî bi rêziman û peyvên xwe ve kete bin bandora zimanên neteweyên resen ên rojhilata navîn bi giştî. Ji xelkên netirk û ji zimanekî têlekhev û ne tam tirkî, niha neteweyeke tirkî û zimanekî tirkî xwe pênase kiriye û ava bûye.

Di zimanê tirkî ya îro de ji bilî peyv, gelek warên rêzimanî jî ji rêzimanên gel û neteweyên derûdorên xwe girtiye, mijarên ku me li jorîn behs kirin û şîkar kirin, ketine zimanê tirkî û tê de bi cih bûne. Zimanê tirkî ya îro jî weke zimanê Kurdî û bi taybet bi heman lojîk û mentiqa zimanê farsî, her du mijarên “iş û gî” bi heman şêwaz û wateyên xwe likar e û tên bikaranîn.

Ji bo zelalî, şîkar û şîraveyên zêdetir em ê çend mînakên di jêr de binêrin:

Amraza “iş”ê ango peyv+pesn û wesf di tirkî de:

çikiş, giriş, satiş, aliş, anlayiş, bakiş, davraniş, yaxiş

her weha bo amraza “gî”yê ango peyv+nav û navdêr di tikî de:

Sevgî, sîlgî, yazgî, vergî, bilgî, sergî, ezgî, dergî

vana çend mînak bûn di zimanê tirk de ku bi heman amraz û heman wate û mebestên zimanê me yê Kurdî û farsî likar û tên bikaranîn ku weke me amaje da, paşxan û kevnariya her du rewşan jî vedigere zimanê Pehlewanî û Avestayê.

Tiştê ku ez dixwazim di dawiya nivîsarê de bêjim:

yekem: erê li ber çavan e û em hemû dizanin zimanê Kurdî bi taybet li bakurê Kurdistanê li ber mirin û helandinên yekcariyê de ye eger rewş weke niha bidome, gelek jî mixabin ku ne aliyên siyasî, ne aliyên rewşenbîr û ne civakê jî qandî pêwîst li zimanê Kurdî xwedî derneketine. Lê ev yek nayê vê wateyê ku em dest û ejnû bisekinînin û kêm hêvî li benda vê rewşa dewş û necor de bin. Bo hemû zimannas û dilsozên zimanê Kurdî pêşniyaza min ewe ku li ser van mijarên ku me di vê nivîsarê de anîn zimên, bisekinin û di warê ziman û rêzimênê de sûd jê bibînin û car din em li wan vegerin.

duyem: divê em bizanin ku gelek mijarên rêzimanî di zimanê tirkî de ji kaniya zimanê Kurdî hatine birin û ne tirkî ne, bi taybet ên ku girêdayî zimanê Kurdî ne înca zimanê kevin yan jî zimanê nû be. van mijaran ta niha bi awayeke hûr û kûr nehatine behs kirin, lê ev destpêkeke baş û giring e ku em ê yeko yeko derxînin û bidin ber şîkarî û şîraveyên zanistî û akademiyê.

sêyem: di vê nivîsarê de nêzî deh mijarên cur bi cur têde cih girtine û di heman demê dehemû jî girêdayî hevdu ne. Her mijarek bi serê xwe têra dehan û sedan lêkolîn, nivîsîn, semînar û peyçûnên zimanî ne. ji bo me her rojekê demeke mezin e em van rastiyên xwe yên resen vekolin û şîraveyan bikin. Ji bo jêlkirin û jêderxistina wan mijaran, bêguman ked û demekê zêde hatiye dayin, lew her kes dema li ser her yek ji van mijaran berhemekê dinivîse û dibêje bila jêderiya wê berçav bigire. xengî jêlkirin û jêderxistina van mijarên hanê jî, ez hêvîxwazim ku ev bibe derî û delîveyek bo zimannas û xwenyarên zanîngehê yên beşa zimên daku her yek ji wan mijaran bidine ber makîneya vekolînê.

www.arsivakurdi.org



DENGBÊJ SEYÎDXANÊ BOYAXÇÎ

Seyîdxanê Boyaxçî bi salan li Diyarbekirê di Mala Dengbêjan de klam got û kar kir. Seyîdxan di sala 1938'an de li qeza Erxenîyê, li gundê Deşta Gewranê hatiye dinê. Navê wî yê rastîn Seydo Şimşek e.

Di dema şaredariya Mehdî Zana de di şaredariya Amedê de wek gêzikvan dest bi kar dike û heta sala 1980yî dixebite. Di sala 1980yî de ji şaredariyê teqawîd dibe lê karê boyaxkirina sol û pêlavan dewam dike.

Di sala 2007an de bi alîkariya şaredariya Amêdê Mala Dengbêjan tê avakirin. Boyaxçî di nav wê malê de jî cîhê xwe digire û bi dengbêjiya xwe klam û starênên xwe vedibêje.

Seyîdxan dibistan qet nexwendiye. Ji 15 saliya xwe û vir de ye klam û stranên xwe distra. Zewicandî bû û heft zarokên wî hebûn.

Seyîdxanê Boyaxçî di 5 Tîrmeh 2020an de di 87 saliya xwe de li bajarê Amedê jiyana xwe ji dest da.

www.arsiv.org

ÇÎROKÊN CIVAKÎ Û TOREYÊN KEVNEŞOPÎ



LOKMAN POLAT

Kurdên binxetê ji berê ve alfabeya latînî-kurdî bi kar anîne. Ji bo kurdan û tevahiya Kurdistanê pirsgirêka standarkirina yekbûna alfabeyê di rojevê de ye û divê ji bo pêşerojê ev pirsgirêk ji niha ve were çareserkirin. Ji bo tevahiya – herçar parçeyên – Kurdistanê yek alfabeyeke pêwîste û ew jî alfabeya latînî-kurdî ye. Di du parçeyên Kurdistanê de alfaba latînî-kurdî û di du perçeyên din de alfaba arebî / mihemedî tê bikaranîn.

Dewleta Iraq û Îranê alfabeya arebî bikar dianî û kurdên başur û rojhilat hêj jî vê alfabeyê bikar tînin. Herçiqas alfabeya dewleta areb ya li Suriyê alfaba arebî be jî, kurdên başurê rojavayê biçûk ê Kurdistanê xwe weke perçeyeke Kurdistana bakur dîtine û alfabeya latînî-kurdî di kovar, rojname, pirtûk, belavok û hemû cure weşanên xwe de bikar anîne û tînin.

Di hêla pêşveçûna ziman, çand û edebiyata – wêjeya – kurdî de nivîskar, lêkolîner û rewşenbîrên kurd yên binxetê kar û xebatên hêja kirine û dikin. Berhemên nivîskarên kurdên binxetê berê jî û niha jî li bakurê Kurdistanê ji alî xwendevanên kurd ve têne xwendin. Nivîskarên kurdên binxetê birêz Helîm Yusiv û Jan Dost li bakurê Kurdistanê bûne navdar. Pirtûkên wan hatine weşandin û heta hinek pirtûkên wan ji alî wergêrên kurd ve li zimanê tirkî hatine wergerandin.

Pirtûkên Cigerxwîn, Osman Sebrî, Nuredîn Zaza û hwd, hêj jî li bakurê Kurdistanê ji nûve têne çapkirin û belavkirin. Herçiqas ew ji bakur bin jî, li binxetê jiyane û bi xebatên xwe edebiyat û siyaseta vê perça biçûk a Kurdistanê pêşve birine. Digel van nivîskaran, pirtûkên gelek nivîskarên kurd yên binxetê li bakurê Kurdistanê têne weşandin. Di rojname û kovarên kurdî yên bakur de gelek gotar û nivîsên Bavê Nazê, Konê Reş, Jana Seyda, Cankurd, Elî Cefer, Heyder Omer û hwd, hatine weşandin. Di hêla pêşvebirin û dewlemendiya şaxên edebiyatê, helbest, çîrok û romana kurdî de nivîskarên kurd yên binxetê gelek kar û xebatên giranbiha pêkanîne û berhemên hêja afirandine. Lewre jî wan pesnê heq kirine û divê xebatên wan bi nirx were şîrovekirin.

Nivîskarê kurd birêz Kamîran Haco jî nivîskarekî kurd ê binxetê ye. Pirtûka wî ya kurteçîrokan li Stenbolê di nav weşanên ”Avesta” de derketiye û li bakurê Kurdistanê belav bûye û gihîştiye xwendevanên kurd.

Navê pirtûka Kamîran Haco ”Kelevajî” ye. Pirtûk 63 rûpele û têde çardeh kurteçîrok hene. Kurteçîrokên ku di pirtûkê de ne, bi tevahî çîrokên civakî ne. Di hinek çîrokan de ravekirina toreyên kevneşopî hene ku gelek bala mirov dikşîne.

www.navsiwakurdi.org

Pêwîst nake ku ez naveroka hemû çîrokan pêşkêş bikim. Lê, ez ê behsa naveroka yek kurteçîrokê bikim ku ji bo min balkêş e û mijara şîrovekirinê ye.

Naveroka çîroka sernavê wê ”Stêrka Rijiyayî”, adet û toreyeke kevneşopî ya kurdan rave dike. Ev adet û toreya kevneşopî hêj jî di nav civaka kurd de tê pêkanîn û adeteke – tradisyoneke- nebaş e, gelek xirab e.

Di nav civaka kurd de, di adet û toreyên wan yên kevneşopî de tiştên gelek xirab hene. Wek mînak adeta ku bira bi jina birayê xwe re dizewice, adeteke nebaş e. Dema yek dimire yan jî tê kuştin, jina wî bi birayê mêrê wê re dizewicînin. Ji bo ku Xwedêgiravî bûka malbatê neçe bi yekî din re nezewice, wê bi tiyê wê re dizewicînin.

Nivîskar Kamîran Haco di vê kurteçîrokê de vê mijara zewicandina bi jina bira re qal dike û herweha çîrokê li ser vê mijarê hunandiye. Ev kurteçîrok kurteçîroka yekem a pirtûkê ye û ji hêla naveroka xwe ve ya herî balkêş e. Lehengê çîrokê navê wî Pêşo ye. Pêşo li odeyê, li ber camê – pencerê – rûniştiye. Jinbira wî jî destî di nav hevîr de, hevîr dike. Pêşo û jinbira wî ji xwe re sohbet dikin. Dilê Pêşo ketiye keçikek û jinbirayê wî pê dizane. Ew behsa keçikê dikin. Jinbirayê Pêşo jê re dibêje ku keçik herroj behsa wî dike.

Birayê Pêşo navê wî Qenco ye û ew çûye serxetê. Apê wî nexweşe û ew çûye serdana apê xwe. Dema Pêşo pê dihese ku birayê wî çûye serxetê, dilê wî tê guvaştin û çavên wî li têlên sînor dikeve. Mala wan li ber sînorê têlkirî û mayinkirî ye. Têlên sînor li pişt mala wan e.

Navê evîndara Pêşo ”Nazê” ye. Pêşo xeyal dikir ku havînê, piştî paleyiyê wê dawet – dîlan – li dar be. Dema Pêşo di nav xeyalên xwe de diramiya, dengê gurmênê hat. Bi deng re Pêşo û jinbira wî mat man, li hevûdu nêriyan û mane heyirî. Di çavên herduyan de tirseke mezin peyda bû. Pêşo di pencerê de li derve mêze kir, toz û dûman ji aliyê sînor rabûbû.

Birayê Pêşo li ser sînor rastê mayînê tê, mayin diteqe û ew dimre. Piştî demek derbas dibe, bavê Pêşo jê re dibêje :
- Kurê min, divê tu jinbira xwe mehr bikî.

Pêşo jî bersîv dide û dibêje :
- Yabo ez nikarim, ma kesekî xwişka xwe li xwe mehr dike.

Pêşo bi çavên xweşka xwe li jinbira xwe nêriye û dinêre. Lêbelê bav zorê dide pê û dibêje :
- Zarokên birayê te, bila sêwiyê li ber destê xelkê nebin. Namûsa me, pîreka birayê te bibe jina hinê din.

Pêşo înad dike, di berxwede dide û dibêje :
- Ez ê çilo, çawa biçim ser nivîna birayê xwe?

Bav jî dibêje :
- Ev adetên me kurdan e, bi hezaran wilo jinbirayên xwe anîne.

Û di şeveke havînê de, zewaceke bêdeng pêk tê. Pêşo li oda birayê xwe rûniştiye û cixare pêdixe, dikşîne. Ji nîşka ve jinbira wî derbasê hundir dibe. Pêşo serî li ber e, ew serê xwe ranake. Jinbira bi dilekî şkestî rûnîdike û diponije. Ji derve gurmenek tê. Stêrkek ji ezman tê xwarê. Rondikek bi melûlî bi ser hinarkê rûwê wê de diherike.



Di vê kurteçîrokê de du mijarên girîng, du pirsgirêkên sosyal – civakî, du birînên gelê kurd tê rave kirin. Sînorên têlkirî û mayin, nîşana parçebûna welatê kurdan e. Birîneke netewî ye û pirsgirêkeke girînge ku li pêşberê kurdan sekinandiye. Heta niha bi sedan, bi hezaran kurd li serê sînor bi teqêna mayinan hatine kuştin, birîndar bûne, dest û lingên wan jê bûne.

Mijara zewicandina bi jinbira re jî adet û toreyeke kevneşopî û paşvemayî ye. Tradisyoneke gelek xirabe û hêj jî di nav civaka kurd de tê kirin. Kirinên weha nebaş û paşverû divê ji holê bê rakirin û êdî di nav civakê de neyê pêkanîn.

Min di vê gotara derbarê pirtûka nivîskarê kurd ê binxetê Kamîran Haco de behsa naveroka yek kurteçîrokek kir. Heger ez naveroka kurteçîrokên din yên di pirtûkê de ne şîrove bikim, dê nivîsa min gelek dirêj bibe. Lewre jî min behsa çîroka kelevajî, kurdewarî, bextiyarî, lehengî, dilpakî, hêvî, bajarvanî, dergistî, jîriya şagirt, mêrxasiya Silo û jiyana xweş û xewneke xweş nekir. Çawa ku naveroka kurteçîroka ku min şîroveya wê kir, balkêş e, herweha naveroka çîrokên din jî balkêş in û hemû jî hêjayê xwendinê ne.





MIHEMED HEMKOÇER

BOXÊ GULAN

Bigir
ji dest min
boxê gulan
ji gulistana dilê xwe
min ji te re anî
çar gul
ji rengê evîna Kurmancî
min li ber te danî.

Rengek kesk e
ji surişt û buhuşta
jiyana Kurdistanê
Rengek sor e
ji agirê newroz û xwînê
Rengek zer e
ji nîşana alê û roja jînê
û rengek sipiye
wek
dilpakiya min
û evîna
Mem û Zînê.



ZEYNEL ABİDÎN HAN

Zeynel Abidîn Han nivîskar, helbestvan û weşanvanê Kurd e. Li gel weşangeriyê di salên 1985-89'an de li Enqerê di zanîngeha Ziman-Dîrok û Cografiyayê de felsefe xwendiye û dû re bi demekê ve mamostetiya felsefê kiriye.

Pişt re ji ber sedemên siyasî mecbûr maye û derketiye Ewropayê. Vê gavê li Berlînê di sirgûniyê de dijî. Han li gundê Gimgima Mûşê li Qilçixê (bi Tirkî navê wê kirine Aydınpınar) ji dayîk bûye.

Ji ber ramanên xwe yên Kurdewarî gelek caran ji aliyê dûgela Tirk ve hatiye zîndanîkirin. Bi zaraveyên Kurmancî û Dimilî (Kirmanckî) û zimanê Tirkî helbest û nivîsarên xwe dinivîsîne.

Zeynel Abidîn Han demekê li Berlînê edîtoriya Weşanên Evra kir. Weşanên Evra di navbera salên 2003-2007'an de kar kir û gelek berhemên Kurdî weşand. Weşanên Evra ji ber sedemên aboriyê karên xwe da rawestandin. Di sala 2007'an de kurê Zeynel Abidîn, Gazîn Onur Han dest bi karê weşangeriyê kir û Weşanên Han damezrand. Zeynel Abidîn vê gavê li gel kurê xwe kar dike û edîtoriya Weşanên Han dike. Di sala 2015'an de dest bi edîtorîya Kovara Xwenasê kir.

Zeynel Abidîn Han di sala 26.02.2020 de li bajarê Berlînê ku girêdayî Elmanyayê ye jiyana xwe ji dest da.

www.arsivakurdi.org

OLA ZERDEŞTÎ



YAQÛB KURMANC

Zerdeşt di rastiyê de ku pêxamber an rêberê gelê Arî ya berê ye.rasterast ne diyar e ku çi demê hatiye dinê û xelkê kê derê û ji kîjan qewm û neteweyê bûye, pirtûka Zend-Avesta kengî û bi çi zimanî hatiye nivîsandin.di navbera alim û zana û dîrokzanan de cudahî heye.Lêbelê di nav hemû aliman de Mistir Cakson ku li ser Ola Zerdeştîtiyê lêkolînên pêşketî encam dane,li ser vê baweriyê ye ku Zerdeşt di nîvê duyemîn a sedsala heftan a pêş zayînê hatiye dinê û di nîvê yekemî sedsala şeşê wefat kiriye.Lêbelê gelek dîrokzan dibêjin ev jî bi yeqînî nayê îsbatkirin.Li gor riwayetên Zerdeştiyan, dibe ku ev pêxember di sedsala heftan de hatiye dinê û di perava Gola Ûrmiye yê dest bi rênimayîkirina xelkê kiriye û di nîvê sedsala şeşan de wefat kiriye.

Mistir Hol di pirtûka xwe de dibêje: Zerdeşt di sala 599an a berî zayînê jidayîkbûye.li gor riwayetan Zerdeşt kurê Duxdo û Poruşaspa bûye û wateya Poruşaspa yanî xwedanê hespê reş.

Zerdeşt di temenê xwe yî zaroktiyê de hinek hereket û reftarên wî ên taybet û cuda hebûne û ji ber hindê ew kiriyarên wî li sihirbazan xweş nayê û gefê ji Poruşaspa dixwin û dibêjin em ê kurê te bikujin,ew irf û edetên bavûkalên me binpê dike û behsa tiştên ne eleqedarî me dike, sihirbaz gelekî hewl didin ku Zerdeşt bikujin lêbelê bi ser nakevin. Poruşaspa ji bo ku Zerdeşt ji gef û tehdîda Sihirbazan biparêze,neçar dimîne ku ji warê xwe derkeve û ber bi perava çemê Dayitîyê ve ku gelek dîrokzan li ser vê baweriyê ne ku çemê Dayitî heman çemê Erez e, koçber dibe.

Zerdeşt di temenê xwe î 20 saletiyê de,ji her kesî dûr diçe û dest bi lava û duayan dike û her roj sijdê bo Xwedê dike,da ko Zerdeşt 30 salî dibe û bi fermana Xwedê jê re wehî tê û ji Zerdeştê peyambir tê xwestin ku gel rênimayî bike ku tenê xwedayê mezin û yekîne îbadet bikin.

Li rex çemê Erezê dînê Zerdeştîtîyê teblîx dike û roj bi roj peyrewên Ola Zerdeştîtiyê zêde dibin û gelek welat û qewmên berê ola Zerdeştî dipejirînin û Zerdeşt jî wek pêxemberekî ji aliyê Xwedayê mezin bi şanazî qebûl dikin û baweriya xwe bi Zerdeşt dînin.

Firrişteya wehîyê Zerdeşt dibe cem Ahûramazda û piştî haziriya Zerdeşt cem Ahûramazda ji wî tê xwestin ku di nav gelê Tûran û Sekistanê ango Sîstanê de jî dînê Zerdeştîtîyê teblîx bike, Zerdeşt heyanî du salan li wan welatan dînê Zerdeştîtîyê di nav xelkê de radigihîne, lêbelê ewqasî zêde dînê Zerdeştîtîyê tesîra xwe nîşan nade.

www.kurdiakurdi.org



û gelê wan welatan baweriya wan bi Zerdeşt û ola Zerdeştiyê nayê,ji ber ku mux û muxbêdên wê demê nahêlin ku Zerdeşt teblîxê bike û jê re astengiyan çêdikin.Zedeşt dû re bi wehî û fermana Ahûramazda diçe cem Vîştaspa hakimê Bakteriyayê û piştî du salan bi hewl û xebata xwe hakimê Bakteriyayê dibe peyrewê Zerdeşt û ola Zerdeştîyê dipejirîne.

Pişgirî û alîkariya Camasp wezîrê Vîştaspa der heqê Zerdeşt gelekî girîng û bêhempa bû û piştre Camasp dibe aşiqê keça Zerdeşt û Camasp û keça Zerdeşt bi hev re dizewicin.
Dînê Zerdeştîtîyê piştî pejirandina wê ji alîyê Vîştaspa ve zûkayî di nav gelên Kurdistan,Tûran,Îran,Hindistan û Anatoliyayê berfireh dibe.

Zerdeşt di temenê xwe î kaltiyê de bi armanca pêşxistina ola Zerdeştiyê bi qewmeke bi nav Hunî re şer dike û li gor riwayetan Zerdeşt di wî şerî de jiyana xwe ji dest dide.

Diyaneta Ola Zerdeştîtiyê:

Li gor pirtûka Avestayê û pirtûkên din ku li ser ola Zerdeştiyê hatine nivîsandin,wiha diyar dike ku gerdûn ji du tiştên bingehîn pêk hatiye:
Ronahî û Tarîtiyê;ev du hêz tim bi hev re di şer û cengan in û carna jî li hemberî hev biserdikevin û ji hev şikestê dixwin.
Bi vê esasê gerdûn bi du beşan parve bûye:Hêza ronahiyê û hêza tarîtiyê, serdarê hêza ronahiyê (Hurmiz-Ahûramezda) û serdarê hêza tarîtiyê (Ehrîman-Angra Mayînû) 6 peyvdarê Ahûramazda hene û Ahûramazda bi alîkariya wan gerdûnê birêve dibe ku Amêşa Spenta an Herheyîyên pîroz tên binavkirin û yê din jî Spenta Med in û ji hemûyan nizmtir jî Êzid in ku hejmara wan zêde ye û navdartirîn ê wan sih heb in ku her yek ji wan taybetî rojek ji rojên heyvê ne .

Êzid ango Yezêd bi xwe jî bi du beşên Esmanî û Bejahî pêk tên,di beşa herî jor a Êzidên Esmanî,Hurmiz cih digire û baştirîn Êzidê Bejahî jî Zerdeştê Kal e. Ew Êzid her yek ji wan tiştekî diparêzin.



Piştî Êzidan jî hinek heyîyên azib hene ku wek firrişteyan giyanê mirovan diparêzin.ew heyîyên azib berî bûyîna mirovan di esman de ne û piştî mirina mirovî jî vedigerin esmanan.

Li hemberî hêza Hurmiz, peristgarê Tarîtiyê yanî Ehrîman jî xwediyê hêzekê ye û peyvdarên wî jî Dêw in û Ehrîman serdestê wan in.

Li hemberî Herheyîyên pîroz,6 dêw hene ku karê wan ew e ku nehêlin Qencî berfireh bibe.

Tarîtî,xirabî ,derewkarî,nepakî û xwemezinkirin ji aliyê Ehrîman ve hatine afirandin.

Hurmiz jiyan û hebûn û Ehrîman mirin û neman afirandine.

Xûlese li hemberî esas û rêxistinên Hurmiz, Ehrîman jî xwedî teşkîlatek çalak bûye.

Avesta derbarê xuliqandina gerdûnê dibêje: Hurmiz destpêkê cîhana giyanan afirandiye û 3 hezar salan desthilatdariya vê cîhanê kiriye.piştre Ahrîmen ji Tarîtiyê derdikeve û bi darê zorê dikeve cîhana Ronahiyê.

Her wiha Hurmiz cîhana madî di 6 qonaxan de ku bi qasî 3 hezar salan tê texmînkirin, afirandiye.

li gor riwayetan Hurmiz, Însan di qonaxa 6an de xuliqandiye.Piştî xuliqandina însanan bi destê Hurmiz, Ehrîman jî dest bi afirandina xirabiyê dike û bi Hurmiz re şer û ceng dike.Şerê wan heyanî 3 hezar salan berdewam kiriye tako Zerdeşt tê dinê û Ehrîman lawaz dibe û Hurmiz roj bi roj li hemberî Ehrîman biserdikeve û hetanî ku Ehrîman venegere Cîhana Xirabiyê,dê ev berxwedanî û serketina Hurmiz bidome.

Li gor baweriyên Zerdeştîtîyê rih û giyan fanî û raborî nîne û paş mirinê, hetanî 3 rojan dîsa xweşî û nexweşiyên dema jiyanê diçêje.piştî wê bayek wî rihî dibe û da ko digihêje pireyekê bi navê Pireya Çînvatê ango Çînvarê û di wir de ji aliyê 3 dadweran ve tê dadgehkirin û ew dadgeh kiryarên baş û xirab ên însanan bi pîvanê dipîvin û piştre biryara xwe radigihînin.

Piştî dagirkirinê divê ew giyan ji Pireya Çînvatê ku ji Çiyayê Elburzê hetanî çemê Dayitî ango Erezê dirêjahiya wê heye, derbas bibe,eger ku ew giyan kiriyarên wî baş û qenc bin ew pire ji bo wî fireh û firehtir dibe û lêbelê eger kiriyarên wî xirab bin ew pire ji bo wî giyanî zirav û teng dibe,da ku ew giyan dikeve cîhana Tarîtiyê.

Rih û giyan eger kiriyarên wî baş bin yanî 3 sîfet bi wî re be ,dikeve cîhana Başiyê,ev 3 sîfet û şêwa ev in:

Ramana baş, gotina baş û kiriyara baş e û ew giyana ku kiriyarên wî qenc be dikeve Biheştê û ew rih û giyana ku sûcdar û gunehkar be dikeve alima derd û dijwarî û zextiyan (dûjeh).





Di navbera Biheşt û Dûjehê de cihekî bi navê Hemestiyan heye ku di wir de kiryarên wan ên qenc û xirab yeksan in û di wir de divê li hêviya roja qiyametê bimînin.

Di Avesta yê de hatiye amejekirin: dema qiyamet nêzîk dibe,kesekî bi navê Suşyant ango Zaoşan diyar dibe,ev kes rizgarkerê gerdûnê ye û hemû giyanan zindî dike û dest bi dadgehkirina Axiretê dike û dû re lehîyek ji hesinê helandî diherike û tevahî bejahiyê digire û di wê heyamê de şerê di navbera Hurmiz û Ehrîman destpê dike û Hurmiz bi tevahî bi ser dikeve.
Ji bo rizgariya piştî mirinê her kes bi qasî hêz û quweta xwe divê alikariya Hurmiz bike,divê ji 3 sîfet û şêweyên amaje pêkirî , temsîl bike (ramana baş, gotina baş, kiriyara baş)
Yek ji isûlên Ola Zerdeştîtiyê ev e ku kar û xebata herî qenc ji bo her mirovî cotkarî û sewalvanî ye.heta Zerdeşt rojî girtin ji cotkaran qedexe kiribû bo ku hêz û quweta wan ji bo kar têk neçe û lawaz nebin.

Di Ola Zerdeştîtiyê de av,hewa, agir û ax çar hêmanên pîroz û paqij in û nabe ku ew çar hêman qirêj û nepaqij bin.Her wiha agir nîşan û sembola Zerdeştiyan e., qirêj kirina ava herikbar û veşartina miriyan di axê de tiştên heram û qedexekirî bûn.
Bi baweriya bawermendên ola Zerdeştiyê ,Zerdeşt Pêxemberê Xwedê bû, Xwedayê mezin bi wî re diaxivî û wehî jê re dihat.

Di vê nivîsê de bi rastî çima netewe û aderiya Zerdeştê peyambir veşartî maye, gelo ew bi eslê xwe Kurd bûye û ji Kurdistanê rabûye û Dînê Zerdeştîtîyê teblîx kiriye.
Bi nêrîna Kurmanc ew Kurd bûye û ji ber vê yekê aderiya Zerdeştê peyambir jî înkar dikin wek hebûna gelê Kurd!
Zerdeşt=Zer Stêr=Stêra Zer

"Zerdeşt'î weha kerem kir; "mirov dişibe daran, çiqasî bixwaze hilkişe jor û bigihîje ronahîyan divê ewqasî şaxên xwe bi jêr de berde nava erdan û kokên xwe berde nava tarîtî û kûrahiyan.



www.arsivakurdi.org



TÊNGÎZ SİYABENDÎ

Jİ WELATÊ XWE HİZ DİKİM

Ji welatê xwe hiz dikim
Bi wê ez kêfxweş dibim
Her şev û roj bi bîr tînim
Lê dîsa ez jê têr nabim.

Bîra welatê xwe dikim
Heta xewna de dibînim
Erê! ji wê pir hiz dikim
Dikim-nakim jê têr nabim.

Nîvê şevê hişyar dibim
Û ji nivîna xwe radibim
Çavên ziha ez şil dikim
Ji xewna jî qe têr nabim.

www.arsivakurdi.org

MİN HEST KİR / Name



BAWER YEKTA

Min hest kir te di bîra xwe bînim her çiqas deng û his tunebe jî wê nivisandina min mayînde be, hinek be jî wê di ev dem, gav û demjimêr ê de dilê min xwe berde gelîyê vegotinan wê demê ezê hênik bibim wekî ku ez saxtîya dilê xwe bikim û te jî di vê rêwîtîya xwe de mayînde bikim. Erê a rast ku tu jimin bipirsî gere mirov tu cari ji nirxê xwe dûr nekeve û bê hêvî ji nebe.Li nîveka rê be jî bira çav li ronahîyê bigerin û hêviyê bisêwirinin di dil û hinavê xwe da.

Pêwîst e wisa be jî Wextê ez li gulek an beybûnek dinhêrim çiqas serhildêrê çiqas ji dema xwe hez dike û rengê xwe vedike meriv dibêje çiqas xweşike dikene her çiqas kelem hebin jî dema xwe dijî. Ez jî di vê dema xwe da dixwazin ji biharîya dilê xwe, te jîndar bikim û di nav van xal û peyvên ku ji hestan der dibe bi hêviya hêviyê ji xweşiya dilê xwe bê lomê û bê gazin te dinvisinim.

Wekî min got: nivisandin ragihandineke ku ji bêdengîyê tê û meriv dikare xwe di bêdengîya xwe de bi peyv û hevokên bedew rû û rûçikên xeyalên xwe bedewtir bike û bibe rêwîyê xewnên xwe.

Tişta di dilê min de dilivî tu bû yî bawer bike jimin!.. min nekarî ku nenvîsînim.Hemû hewla min ewe ku ez dinav hevokan de dilê bêrîyê bineqşînim û wêneyê xeyalên xwe mayîne bikim.Lewma min hest kir vî dem û gavê ji tenêtîya xwe di bêdengîya êvarek tarî û reş liber ewrên bê stêrk û heyv wisa kulîlkên dilê xwe av bidim û bi bîranînên xeyalên xwe li dilê te yê germ asê bikim .

Ka ez çi bêjim dinav gavên jîyanê û tevizokên ku di fikr û ramanên min de diçin û tên neçar dibim bi nivîsandina ku ji dilê min wekî çarînên helbestekî bi îlhamekî ji hestên min tên xwarê bi rêzînim.
Lê belê her çiqas hêvîdar bim êdî ne bawerim xewnên te jibo min wekî berê zindî bibin.Ji ber ku carek rê ji hev qetîyane ez jî wisa difikirim ku êdî tu jî ne wek berê yî.
Jiber ku rewşa jîyana gerdûna îro rê liber teqlekirina çendîn awiran vedike êdî ne ez te dibînim ne jî tu min dibînî tenê min hest kir ku dilê xwe carek din berdim awirên demên borî a dilê xwe li pey oxirekî li teşîya çîrokîya borî de birêsim.Lewma min hestkir ku a dilê xwe livir bi çend xet û xalên ji peyvên di raperîna ji dilê xwe li vir bibîr bînim.



www.KurdiMakurdi.org



ESKERÊ BOYIK

PAYÎZ

Ax, payîza vî welatî, çi mede ye, çi ewrîn e,
Vê êvarê bîna bê tê, baran hûr-hûr direşîn e,
Keserê dilê min kirîye dolîdanga bêgumaînyê
Bin ewazê belgweşîna mitala da dikilê û dibe-tîn e.

Qulingekî xalifî me ji ref-hoza xwe qetîyayî,
Van durîyanê cihanê da mame melûl per weşîyayî,
Sur-seqemê vê payîzê, şevereşa şevê direj
Dergê xêrê min dadane, esman ewre nabe sayî.

Gazinê xwe ez kê bikim, ne pismam in, ne jî heval,
Xerîbî tev kul û derde, ten û niçe, xeme-xiyal,
Dengê defê dûrva xweşe, welêt xweştir tu war nîne
Serbilindî ye, dê û bav e, zar-ziman e, milke û mal.

Xwezîya min wî bendê Xwedê, ku ser axa kal-bavan e,
Ku derd-êşê xerîbiya tel, tem nekirîye û nizan e,
Weke min wa, nebîye koçer, bêmal-bêcî ji sur-sermê
Vê cihanê direve û cî nabîne, bêguman e.

Payîz e, ax, pel diweşin, baran hûr-hûr direşîn e,
Vî cîyê xerîb poşman-metel û bêhîvî sekinîme,
Rê jî nîne şûnda herim, welat nîne lê vegerim
Ev dera jî bi rik-kîne, min feqîrî nahebîn e.

ZIMANÊ STANDART ANGO "KURDİYA AKADEMÎK"



ÎHSAN BÎRGUL

Di nav me Kurdan de peyva "Kurdiya akamedîk" bûye mode. Hetta em dikarin bêjin bûye statuyekî. Em hemû jî gelek caran pêrgî dialogên wekî " Kurdiya min baş e lê Kurdiya akademîk nizanim" "Ev peyv di Kurdiya akademîk de tê çi wateyê " hwd tên. Ez naxwazim bikevim mijara " zimanê akademîk çi ye an çi nîn e. Jixwe her tişt li holê ye...

Li gel vê bêguman divê em zimanê xwe standart bikin. Li gorî rê û rêbazên gramerê tev bigerin. Jixwe ya ku jê re "Kurdiya akademîk" tê gotin jî ev e. Yanî zimanê nivîsê. Lê ev standardîze bi xwe re gelek xetereyan jî tîne. Mînaka herî sereke devoka Serhedê ye. Ji ber ku pêla zimanê nivîskî ji Botan ber bi Serhedê vê hatiye, piraniya Serhediyan devoka xwe bêqîmet dibînin û pişta xwe didinê. Ev xetere bi xwe re mantiqa zimanê Tirkî jî serdest dike. Çimkî kesên bi nexweşiya " Kurdiya akademîk " ketibin, her tim hewl didin ku Kurdiyeke standart ango Kurdiyeke tu zimanekî din tev nebûbe biaxivin. Lê wexta Kurdiya wan têrê neke peyven nû tev li axaftinên xwe dikin. Mixabin ev jî gelek caran bi mantiqa Tirkî çêdibe. Mînak; bikaranîna peyva "hûn" ya ji bo yek kesan ango yekjimar. Ev peyv rasterast wergera "siz"a Tirkî ya nîşana têkiliya fermî ye. Halbukî di Kurdî de ji bo yek kesekî/e peyva " hûn" nayê gotin. Ancax dikarî peyva "cenabê te" bikarbinînî. Ew jî li gorî rewşê. Ne her gavê

Wexta halê ziman ev be, ev ziman ji gel re xerîb tê û gel ji devoka xwe ya heyî dikeve şikê û kesên "Kurdîya akademîk" wekî kesên bijare dibîne û xwe jî biçûk. Şûna ku li ziman germ be dîwarekî qerase yê "akademîk" dikeve navbera gel û zimanê gel. Bilêvkirina gotinên Kurdî yên herêmî û resen dibe wekî kêmasiyekî...

Em werin kevirê serê lodê ango gotina dawî. Eger derdê me pêşxistina ziman be (ji samimiyeta tu kesî şika min tune) ew çax divê em ziman hêsantir bikin. Şûna ku em bêjin "Kurdiya akademîk" , nizanim ev peyv ji kîjan zimanî hatiye, ev peyv Kurdî nîn e hwd. Em rê û rêbazên belavkirina xwendin, nivîsandin û axaftina ziman ya li nava gel bigerin. Da ku roja ev ziman tam hemadê xwe sererast bû li holê bêxwedî nemîne.



www.arsivakurdi.org



ŞÊRO DALÎNÎ

Gerdeniya di stûyê te de razayî
hêlana hacîreşka ne
û ez yê ji serma dimmrim
ev rê min nabe malê..

Çavên te gava ku te dibînim
ji muzeya herî jor ya dilê min dilerize kul.

Xwêdana eniya te
Tora xelata te û
ez tirafa termekî şewitî ji çixareya
belengazekî têm.

Dûrî her kesî û her cî yî
aramî ew e ku tu li bîrî.

Ev stran ji gera di serê min de nasekine
were heye ku ya din xweştir be.

Laşê te yê xav di destê min de dipije
de bilezîne.

Wêneyên te di telefona min de
berîkek mayînkirî ye

Vê qehweyê vewxwin
ez falekê dixwazim.

Ji vê kêlîkê çawa derkevim
were xwe bispêre vî milê qels
geş bike asîmanê vê cengê.

Were sibe ya nîvco ji te re ava bikim.

Ev bilûr rê nade te
li çavên min binêre.

Dûr û nêzîk
gazî her tiliyên te ne .

Ka nuha were
bi gurzek stran dilê te bi xwe bişewitînim
berê berberoyan bidim te.

Pora te
têra balgiyekî dike
ji xewa dike bimire ev şev.

Nexema te me
dizanim
barê giran im li ser şevê
naçim
bêhemdî te tême bîrê
destê çepê li kêlîlekê dipelînî
dixwazî birevî koşeya şemal
li xwe mukur be
nenankorî salan be
dilê xwe bike cî de
dem wisa vala diçe
wek vê kêlîka ku min ev gotinên vala
ji te re nivîsandin
wisa vala diçim.

Hewl didim ku gotinek nerm bim
wek nermika guhê te nabînim.

Ev mey
û tu di nîvê ser ê min de.

Îşev bihane tine ne
tu ya her şev î.

Ezê rojekê û bi yekcarê
van kêlîkên ku qenc dikin ji min
ji te re bibêjim û pala xwe dispêrim duho
ta ku ji te re;na ji xwe re
xwe bi bîra te bînim
û careke din di duho de min jibîrnekî

Qey ezê di çavên te yên şilfîtazî de razim
û mijankên te her çirkîn min bi bîra min
tînin
ku çi bi serê şevê tê dibînim

Avzel e ev dil ji asoya pişta gir bi sawtir e.



BEHLÛLÊ MAHÎ

Behlûlê Mahî helbestvan û zanayek Kurd e ku wek damezrênerê baweriya Yarsanê tê qebûl kirin. Di dawiya çarîka sêyemîn a sedsala 8an de li Loristanê li herêma Mahilkûfeyê ji dayik bûye, di heman herêmê de zarokatiya xwe derbas dike û di temenê 8-9an de diçe medreseya mahîlkûfeyê dest bi xwendin û perwirandinê dike ku hê neqedandî di temenekî piçûk de *Rêbaza Yarî* ya yekem li Hewremanê dadimezrîne loma wek damezrênerê baweriya Yarsanê tê pejirandin.

Navê wî yê rastî Emer e û navê bavê wî Leheb e, di nava gelê herêma wî de ji wî re Emerê Leheb digotin Behlûl nasnavê wî ye her wiha wek *Behlûlê Dane Behlûlê Dîwane, Behlûlê Danende, Behlûlê Yekdane* jî tê nasîn. Behlûl û çend hevalên xwe yên Yarî ji bo pêkanîna xwendin û perwirandina xwe ji Loristanê derbasî Bexdayê dibin û li wir di medreseya Cahferê Sadiq de qeyda xwe dikin dest bi xwendinê dike û bi serkeftî diqedîne ku ji wir ber bi Qermasîn (kirmanşah)ê ve diçe ku rêbaza xwe pêş de bibe û belav bike lê belê ji ber rexne û zimanê wî yê tûj xelîfeyê Ebbasiyan Harûn Reşîd fermana kuştina wî dide li ser vê yekê jî Behlûl diçe vê meselê bi seydayê xwe Cahferê Sadiq re dişewire ku dikare çi bike seydayê wî lê tembîh dikeku xwe dînîtiyê dane da jiyana xwe bidomîne Behlûl jî ya seydayê xwe dike û xwe dînîtiyê datîne axir derdor wî êdî wek dîn dizanin heta Harûn Reşîd wî efû dike jiyana xwe wisa didomîne.

Behlûl ji bilî helbestên Kurdî gelek helbestên Erebî jî vehonandine lê piraniya helbestên wî Kurdî ne bes gelekê wan winda bûne yên mayî jî bi saya pirtûka *Serencam* hatine parastin û gihîştine roja me dîsa li gor vê pirtûka Serencamê Behlûlê Mahî di sala 837an de li Tengegulê koça dawî dike û li goristana wê herêmê tê weşartin.

Ka Rola Întelecinsiya Kurdî?



MIHEMED HESKO

Rewşenbîr helwest e, ne pîşe ye?
Sartir

Bi dirêjahiya dîrokê û di temenê hebûna mirov li ser gerdûnê de,her û her ronakbîran û kesên xwenaskirî bi helwestên xwe yên wêrek hêvanê meyandina şoreşa ramanî bûn, wek feylesof Siqrat 399 b.z ku li hember ramanên çewit û yên efsûnî ji bîr û baweriyên xwe nehat xwar û jiyana xwe kir qurbanî û bi yekem pakrewanê felesefê û nasînê tê nasîn, her wiha rewşenbîr û xwenas bûne jêdera pirîskên agirê hilkirina şoreşên dijî zordariyê û hilgirên xetîrên azadiyê bûn, wek Voltêr, Can Cak Roso û Lok ku agirê yekem şoreşa lîbralîzim di dîrokê de vêxistin, ew jî Şoreşa Ferensî bû ku sala 1789`an qewimî.

Erê jiyan xebat û helwest e, piştî serxwebûna Dewleta Sûriyayê sala 1946`an û tevî beşdarbûn û qurbanîdanên gelê kurd di piroseya berxwedana li hember dagîrkerê Ferensî de, lê mixabin mêrxasî û niştimnaperweriya Kurdan rastî dîwarê şofînizm û dilkoriya erebî hat,ji bo paşguhxistin û bêparkirina gelê Kurd ji hemû mafên xwe yên rewa, û wek karvedaneke erênî pêşberî vê nedadpeweriyê, kesên ronakbîr û rewşenbîrên Kurd xwe berdan meydan xebata sivîl û ya siyasî, çawa na? ma bidestveanîna mafan, ne erk û rola ronakbîr û rewşenbîran e, ew qata bijarde ne ku bi Întelecinsiya tên binavkirin.

Li Rohilata Navîn bi giştî û li Sûryayê bi taybetî, rewşenbîr kurd tûşî du serkutkirinan bibûn, ji aliyekî ve rejîma Be,isa şofînizm bi serokatiya Beşa El-Esed yê dîktator û xwînrij, û ji aliyê din ve tevgera Kurdî hatbûn paşguhxistin, vê rewşê kir ku Beşar El-Esed vê yekê bîne serê Sûriyê ku kuştarek neh salin berdewame, û tevgera Kurdî jî bi pilan û zanîn û bi parçebûnên xweyên diramatîkî xizmeta proje û pilanên neyaran kirin û ketin hevrikieyeke dûr ji armanc û daxwazên gel.



www.arsivakurdi.org



Pirs ew e, gelo çima qata bijarde ``Întelecinsiya`` kurdî bi erk û rola xwe ranebû, û ta niha xwe kerr kiriye, tevî çend yekîtiyên Nivîskaran, Hunermendan, Parêzeran, Navendên Lêkolînan û Sendîkayên Rojnamevanan hatine damezrandin, li şûna ku xizmeta ecindayên partîzaniyê bikin divê bi erkên xweyên pîşroz rabin, û bi rola xwe li hember her rewşekê û bi taybet rewşa niha rabin, ma gelo qata bijarde ``Întelecinsiya`` ne leşker, artêş û parêzvanê maf û hebûn gele, bi taybet piştî bi destpêkirina gotûbêjan dinavbera PYD û ENKS`ê de bo yekrêzî ya mal kurdî li Roavayê Kurdistanê û pêngaveke pîroze, ma ev ne derfeteke zêrînî ye daku em ji bindestiya rejîma Be,isa faşî û şofînizim û ji zordarî û setemekraiya serokê rejîmê Beşar El-Esed yê xwenrij û xwînmij rizgar bin.

Wek çawa pêşiyên me gotine: *Bi xweziyan, bi dest nakeve gurzê keziyan*! Erê dem dema xebatê ye û li ser hemû astan, ji ber ku li ser me şerê man û nemanê ji aliyê dagîrkerên Kurdistanê ve hatiye sepandin, lewira ji hemû kesatiyên rewşenbîrî û grupên rewşenbîrî tê xwestin ku, bibin alaveke fişarxistinê bi ser aliyên pêwendîdar daku rêkeftinekê di zûtirîn dem de ragihînin, û divê dengê xwe bilindbikin û bi qîrin daku herdu alî PYD û ENKS`ê berjewendiyên neteweyî di ser berjweniyên partîzaniyê re bigirin, daku Efrînê ji bindestiya bê namûsên tirk û çeteyên bênamûsên ereb rizgar bikin, her wiha Girê Spî û Serê Kaniyê eger na, nifirên daykên şehîdan ta dunya şênê wê li we bibarin.

Ey qata rewşenbîran``Înelecinsiya`` rojeke reştarî û nexwezyar bi ser me de hatiye, û erkekî pîrozî netwewyî li ser meilên me hemûyan e, ka werin em biqîrîn! Ka em xwedî li pîroziyên xwe derkevin, gel û welat dibin metirsiya man û nemanê de ne, ka ji bo pêşroja zarokên xwe têbikoşin, ta li vê dunyayê navê me hebe û dengê me jî were bihîstin, û em jî bibin xwedî al û dewlet di bin ezmanê şîn de?





MEHMÛD BADİLÎ

NEWAYA RENGAN

Roj li pey rojê
reng diçirisin
û di ruwê kevala jiyanê de
her tişt sema dike.
Tenê ez…
li ser lingekî
li ruwê xweyî şikeva
û lingê xweyî seqet
digerim.

Sorahî

Hîna diya min
tembîniyên xwe yên nazenînî
li çilapekên baranê dike
û hîna
li ber dîwarê xemgîniyê
bi sipîdeyê re
bi destên xwe yên terikî
pişta berxê berbangê
soring dike.

Şînahî

Berî xewê
di nîvê xewê de
berî berbangê bi hinekî..
min digot qey
tu dikî perdeya bêdengiyê
ji navbera min û xwe
biçirînî.
Her carê, aramî
di kûrahiya bendewariya min de
heşîn dibû
û awirên teyî jar
li dîwar û banê odeya xewa me
bi teşîya nepeniyê
valahî diristin…
û xirecira çaxê
bêzariya min li kirasê rojên xwe
dineqişand
û tu
nedipeyivî.

Keskahî

Herdem
pêjna darê
min ber bi payîza siya xwe ve
dikişand.
Carekê
zimanê min neşewitî
û min negot:
çima...?

www.arsivakurdi.org

Xakî

Herdem te digot:
Ezê her im,
û min digot:
Ax ji derdê te.
Kengî tê bi ser rengê hebûna xwe ve vebî?
Tu çûyî …
û te dilê min nexist cih
û te negot:
Ji çi tiştî hez dikim.
min jî hewl neda xwe
taku nas bikim
tu ji çi rengî hez dikî..?!
Û hîna dilê min li pey te
bi darikê gumaniyê
çixêzkên girover
di siya xwe ya derbider de
wêne dike.

Tarî

Aniha
ji nû ve têgihiştim
çima em bê welat in ?!
ji ber me darên gumaniyê
di zevîyên dilên xwe de
nediçandin.

Şîrikî

Her êvar..
ji ava cehê çarşemê
peyalekê vedixwim
û tîna min naşikê.
Her êvar...
hemî rojên heftiyê
tilîyên xwe ber bi çavê min ve
tûj dikin û
dibezin kêlîka serxweşiya min.
Her êvar…
xwelî bi pişta aso ve
radipelike
û aso berî çelînîya xwe
ji xewnê vedibe.
Her êvar..
arezû mûristanên xewnê xwe
di sîbera rewanê min de
çê dike.
Her êvar
ez di giroverek nezok de
tême giritn
û zimanê min
bi şûrê Xwedê jê dibe
û sura bayê barîn
jiber tazîbûna min şerm dike
dê çawa hinekî
vehêsim.

www.arsivakurdi.org

Gelo Mirov Çawa Dibe Nivîskarê Kurd!



SIRAÇ OĞUZ

Îro li Tirkiyê kêm zêde 30 mîlyon Kurd dijîn. Lê bi çi awayî, ew jî li berçavan e. Ziman û jîyan bi Tirkî ye. Siyaset bi Tirki ye. Hemû kar û bar bi Tirkî ne.

Merû nizane kî/ê Kurd, kî/ê Tirk e.

Piranîya siyasetmedar û nivîskarên esilkurd zimanê xwe yên zikmakî nizanin. Ew jî li ser navê kurd û kurdayetîyê, bi zimanê Tirkî dinivîsin û bi zimanê Tirkî siyasetê dikin. Li Bakûrê Kurdistanê bi gelemperî, nivîskarên bi eslê xwe Kurd û bi ziman û nivîsên xwe Tirk gelek in.

Bala mirovan dikişîne, hinekan bi zimanê Tirkî bi dehan roman nivîsandine û dinivisîn.

Hinek jî di malper û rojnameyên tenê navên wan Kurd da bi zimanê Tirkan dinivîsin. Mixabin hemû ji xwe weke nivîskarên Kurd bi nav dikin. Gelo li rû dinê mînakên wisa hene, ya na?

Mirov gava li hemû welatên biyanî dinêre û nivîskarê wan dişopîne, tiştên ku li Bakurê Kurdistanê diqewimin li wan welata tu car nnayên dîtin. Ne tene li welatên serdest, di nav milletê bindest da jî rastî tiştkî wisa nayê.

Li Başûr û Rojava û Rojhilatê Kurdistanê jî nivîskarên Kurd yên bi zimanê Erebî û Farisî dinivîsînin, hebin jî, zede nînin.

Li Bakûr, Kurdên nivîskar û hûnermend pirr in, bi nivîs û hûnerê xwe xizmeta zimanê Tirkan dikin û ji xwe ra dibêjin, “em nivîskar û hûnermendên Kurd in.”

Xwedê rihma xwe lêke, Yaşar Kemal bi eslê xwe Kurd bû. Bi zimanê Tirkî bi dehan romanên giranbiha nivasind, wek nivîskarekî Tirk li rû dine hate nasîn û nivîsên wî bi gelek zimanên din hatin wergerandin. Ne tenê li Tirkîyê, li seranserî dinê wek nivîskarekî Tirk hate naskirin û bi nav kirin. Em dikarin bibêjin Yaşar Kemal nivîskarekî Kurd bû. Em bibejin jî, gelo dinya vê yeke qebûl dike. Jiber ku hemû pirtûkên xwe zimanê Tirkî nivîsandîye û di jîyana xwe da hevokek bi Kurdî nenivîsandî ye.



www.arsivakurdi.org



Ya jî Îsmail Beşikçi bi eslê xwe Tirk e. Li ser doza Kurdan gelek xebatên bi rûmet kirîye û dike. Wî jî bi dehan pirtûk nivîsandine û naveroka hemû pirtûkên wî jî tene li ser Kurd û Kurdistanê ne. Ji hemû nivîskarên Kurdên ziman Tirk zêdetir, pirsgirêkên Kurdan aniye ziman û nivîsiye. Jibo vê yeke mirov dikare bibêje, "Îsmaîl Beşîkçî nivîskarê Kurd e."

Îsmaîl Beşîkçî bi eslê xwe jî, bi nivîskarîya xwe jî Tirk e.

Jiber ku di pirtûkên xwe da zimanê ku bi kar anîye, zimanê Tirkan e.

Edebiyat û hûner jî karen gerdûni ne.

Rê û rêbazên wan gor welat û miletan nayên guhartin.

Ji wan rêbazan yek jî ev e, ku di dine da kî/ê bi kîjan zimanî binivîse, nivîskarê wî zimanî, kî/ê bi kîjan zimanê hûnera xwe bike, ew hûnermendê wî zimanî ye.

Weke mînak: Çawa ku em ji Şivan Perwer ra nikarin bibêjin, hûnermendê Tirk, ji Îbo yê hemşehrîyê wî ra jî nikarin bibêji hûnermendê Kurd e.



www.arsivakurdi.org

Zimanê nivîsê û nivîskar jî bi hev ra girêdayî ne.

Kî/ê ku bi kîjan zimanî binivîse, nivîskarê wî zimanyî ye. Esl û dê û bavê wî/ê çi û kî dibe bila bibe, ferq nake.

Weke mîsal:

Nivîskarê Sîya Evînê û bîra Qederê Mihemed Uzun, nivîskarê Jîyana Bextewar û Kela Dimdimê Ereb Şemo, nivîskarê Rêwî Îkram Oguz, nivîskarê Kulîlkên Çîya Eskerê Boyik û nivîskarê Ev Çîya û Rûspî ne Arjen Arî û yên weke van nivîskar û şairên Kurd in.

Ji ber ku di roman û şiîrên xwe da can dane zimanê Kurdî û dewlemend kirine. Lê Yaşar Kemal, Ahmet Arif û nivîskar û şairên weke wan çiqas bi eslê xwe Kurd bin û di berhemên xwe da derd û kulen Kurdan anîbin ziman jî, ew nivîskar û şairên Tirk in. Wan jî bi hûnere xwe can dane zimanê Tirkî û dewlemend kirine.

Cîhê bîla bê sebeb nabêjin, ziman nîşana hebûnê, bingeha miletbûnê ye. Tu kes ya jî tu miletek nikare gor dile xwe, xwe binav bike.



Mirov di jîyana xwe da kîjan zimanî bikar bîne, bi wî zimanî tê nasîn û tê binavkirin.

Weke kirin û kiryarên Kurdên Bakûr bi tevlihevî tu tiştek nabe.

Heger zimanê rojname û televîzyonek bi Kurdî be, ew rojname û televîzyona Kurdî ne.

Heger zimanê romanek jî bi Kurdî be, ew roman romana Kurdî, nivîskar jî nivîskarê Kurdî ye.

Wekî din tene derewek pûç û vala ye…



www.kurdiakurdi.org



ELİND MİZÛRÎ

KURDİSTAN

Ez deşt û zozan û çiya me
Kurdistan im ez welatê Kurda me
Golistan im ez behişta dila me
Warê egîd û xweşmêr û xorta me

Ez Soran û Badînan û Botan im
Mirneşîna Baban û Erdelan im
Mahabad û Çarçiraya Qazî me
Helebce me ez Dêrsim û Kuban im

Lulu û Kardox û Mîtan mêjûya min
Kela dimdim û newroz şoreşa min
Zor rêtin rondik û xwín ser sîngê min
Da ku berz û bilind bibe ala min

Dergûşa tev şarstaniyan ez bûm
Berî hemûyan şaneşîn û dewlet bûm
Nehezan parçe kirim kirime çar ker
Dê bim dewet dijmin ji ber min kure bûn.

Heyîvokî ya me, Feminizma Cihanî û kapîska Swêdî



NESRİN ROJKAN

Ev yek, ne tenê baweriyek gundan e, çîrok û efsaneyek e, ev mijarek bi hezaran salan e ku li Mezopotamyayê destpêkiriye û li welatên cihanê bilav bûye û heta îro jî rasterast di nav gelek civakên cûda de cih girtiye.

Bandora hemanên asmanî li ser bîr û baweriya mirovan herdem hebûye. Di hinek civakan de wek a Mezpopotamyayê Roj mezintirîn Xwedê bû, û rojger jî ji malbata wî bûn.

Ev baweriya bi Rojê bı hezaran sal dom kiriye heya ola Zwedûştîyê bilav bû ye li wir êdi Xwedêyê Roj bûye Ahuramazd/ Hurmuz û, rojger jî bûne firişteh. Hejmara rojgerên ku wê demê dizaniyan heft bû, hejmara firiştehên îro jî heft in. Heta îro jî gelê kurd bi navê rojê sond dixwin, û ji gelê Êzdî re pîrozya Roj û Agirê hê û hê jî ma ye. Ew baweriya xwe ji pêxemberan bêtir ji firişteh re diînin.

Ji civakên herêma Mezopotamyayê hinekan jî baweriya xwe bi heyîvê anîne. Gelên ereban bawermandên misilmanan heyivê danine ser alayên xwe û heyv bûye sembola ola îslamê.

Her çend roj nîşana ronahî, pakî, dirûstiyêye, heyv jî bi awayê tarî, veşartî, û hêzên reş ve hevseng dikin. Baweriya hemana dualîzmê diafrînin bihevre.. wek YingYanga felsefeya Çînê. Wek jin û mêrê, şev û rojê, başî û nebaşiyê. Wek Hurmuz û Ehrîmanê Zerduştiyê û hwd…

Roj heta îro jî ji bo gelê kurd rolek giring girtiye, lê heyv jî her çend erênî nebe jî cihê xwe girtiye, heta îro jî aniye.

Têgehên wek ‘heyvokîbûn’, ‘heyiv pê ketiye’ ‘heyiv lê ketiye’ berê (dibe ku niha jî) din nav civakên kurdan de gelek dihat bikaranîn.



www.navsiv-kurdi.org



Zarok ji bo ku ‘heyvokî’ nebin, eniya zarokan bi teniya binê beroşkê reş dikirin, gemar dikirin ku zarok xuya nekin, bal nekêşin .Bi teniyê yan xaçek an jî heyvek xaz dikirin ku zarokên xwe ji heyîvê biparêzin.

Li gor mitolojiya Mezopotamiyan Sumer, Akkadî, Babylon û Asûrî de xwedavendek an jî cinek bi navê Lîlîth bi şevan derdiket li zarokan digeriya û zarokan nûbûyî ji xwe re dibir, anjî dayîkên nû zayî (bı kuştinê) ditirsand. Lîlît cina şevê ye nîşana wê jî heyiv e. Li gor vê mitolojiyê Lîlît heyivê zaye, û xwedevanda heyiva reş e.

Lîlîth bi vê nasnameya xwe ya neçê ve ketiye pirtûkên İbrahimiyan de jî. Li gor mitolojiya cihuyan an jî pirtûka wan a pîroz Tewratê, jina pêşî ya Adem Lîlîth bûye,ne Hewwa. Lîlîth jî wek Adem bixwe ji axê hatibû afirandin lewra wê xwe hevsengiya Adem didît. Digot em herdu jî ji heman hêmanê û heman demê de çêbûne û di zayendeyên me de nabe ku cudahiyek hebe. Ne serdestî ne jî bindestî divê hebe. Serî hildide. Adem diçe û giliya Lîlîtê ji Xwedê re dike û Xwedê Lîlîtê ji bihiştê dike der. Lîlît dikeve warê bûnewerên şevê û cinên lanetiyan de, û li wir bi şeytên re dizewice. Xwedê ji vê yekê aciz dibe û dibêje ku dê ew jî zarokên wan ji wan bistîne.Dûre Xwedê ji parsûyên Adem, jinek nû Hewwa diafirîne, ji berku Hewwa parçeyek ji Adem e, herdem serê wê berde tewandî dimîne, heta niha jî serê jinê li ber mêrê tewandî ma ye.

Destê Lîlît dîsa pê nasekine û dibe marek diçe dikeve nav bihûştê da ku çavên Adem û Hewwa bi riya meyveya qedexekırî veke û ji riya xwedê derixine. Pêşî Hewwa meyvê dixwe, dixape, û diçe dide Adem jî. Herdu jî ji bihûştê tên avêtin dawî de.

Piştî nifira xwedê li zarokên wê, Lîlît sondê dixwe ku dê ew herşev derkeve û li zarokên nûbuyî bigere,li ser singa dayîkan rûne, wan fetisîne û zarokan ji xwe re bibe. Ji wê demê ve ta niha Lîlît û heyv ji dayîkên Mezopotamyayî re bûye kabûsek ser singa wan runiştiye. Bi nivişkan, tenîyanbi tiştên cûrbecûr ve zarokên xwe ji Lilita bê aman diparêzin. Zarokên xwe Zarokên ku heyvokî bûne, yan heyiv bi wan ketibe, nexweş dikeve, lawaz dibe, rengê wê/wî diçilmise. Divê ew dem zaroka xwe bibine ba jinek ku bi taybet vê karê dike,û zarokê ji vê belayê bi awayek bifilîtîne.

Lîlît ne tenê li dorê zarokê digere lê dibe bela serê dayîkê jî. Di wan şevên dirêj û tarî de dayîkên nûzayî pirê caran tenê bi bebika xwe re şîyar dimîne. Yan dimijîne yan dihejine, lê carina bê xwestina xwe diponije di wê demê de Lîlît xwe digehijîne dayîkê yan wek pişîkek an wek meyumûnek an jî wek bûnewerek din û bihata ser singa wê û bifetisanda.

Bibûya kapîskek.



Ev kapîsk ne tenê li malên kurdan an Mezpotamyayiyan digere, ev kapîsk (kabûs) an jî bi kurdî mêrdizme (li gor ferhenga Z. F.) bûye marê reş û li malên hemû Rojhilata Navîn, Hindistanê û heta Ewrûpa, Amerikayê jî geriyaye û hê jî bi wateyên cûda ve, nasnemayên cûda ve digere.

Swêdî ji xewnên ne xweş re dibêjin 'mardröm' ango xwewnemar. 'Dröm' ango xew. Mar ji navê Mara tê.

Mara di mitolojiya welatên bakûrê Ewrûpayê de, jinek an bûnewerek mê ye ku bişevan derdikeve li zarokên nûbûyî û dayîkên nûzayî digere ku wan bitirsîne ku wan bikuje. Ev jî wek Lîlît xwe dike pişîk, meymûn an jî bûnewerk din. Swêdî dibêjin ku ev mitolojiya wan e lê di ingilizî de jî ev heman peyv heye 'nightmare' ango mara ya şevê. Di Germaniya/ Almanya ya kevin de 'nachtmahr' bikar dianîn. Bi fransî 'cauchemar' Di zimanên slavî wek rusî, polonî, serbî, û heta romanî de jî 'koşmar' an jî 'nocni mora' (şeve-mara) dibêjin.

Çawa em dibînin di gelek zimanên Hindû Ewrûpî de peyva mara,mar derbas dibe. Baş e 'mara, mar' tê çi wateyê, û ji ku tê?

Mara ew rewş e ku mirov dike bixeniqe, bifetise, nikare bêhna xwe vede, mirov dibêje qey dê bimire, xov dikeve nava mirov. Rewşek wek nêzikê mirinê ye.

Peyva Mara bixwe peyvek hindû/sanskriti ye û navê xwedewenda, cina mirinê,mirandinê ye. Li vir jî xwestiye dildariyê bi Sîdarta re bike da ku xwe negihîne Nîrvanayê, bihûşta Budîstan. Li gor Budîstan hemû xirabî, teşqele, bela, karesatan Mara li ser Budîstan de dibarîne. Bi saya serê çîrokên devkî yan jî bi nivîsên bizmarkî heta niha ev mîtên han li dinyayan geriyan e û ketine nav çanda civakên cûda cûda û nasnameyên cuda cûda wergirtine. Çîroka Lîlît heta îro jî di çanda nûjen de jî wek felsefeya jinên mafperest, femînizmê de rojane tê bikaranîn. Lîlît serdestiya mêrê xwe nepejirandibû û serî rakiribû, ji ber wê jî hatibû tawanbar kirin û cezakirin. Lê dîsa jî wê serî netewandibû û gefa tolhildanê xwaribû. Ser jî ketibû, wek merdezimek li ser singa me hemûyan cihê xwe girtibû û herwuha ji bo jinên haydar û zana jî bûbû pêşeng û nîşana azadiya jinan.

Îro sembola hemana Lîlît, navê Lîlît li ser kovaran,rojnemayan leyiskên şanoyan, di meşên dijê tundutujiya mêr li ser jinan li navê wê deng dide.

Tolhildana Lîlîtê berdewam e…




Bi Kurdî ji min hezbike Heyder. Şûna "Sana doyamadım" bibêje "Ez ji te Têrnebûm"...
Tu dîsa çi saçmelemîş dikî ?
OM
occo mahabad helbest
Weylooo, kurdiya te ćiqas seksî ye.
Tu dizanî, Śakiro xalê min bu.
Şiv miv tune Heyder!!..
Ma em kevira bixwun??!!
karikkurdi
Bira tuyê Kuve biçî?
Ezê biçim Welatê musulmana, li wir her gû tê xwarin lê goştê min nayê xwarin.
Wey wey wey, ev tu çi dkî xwedê nehiştê
Bimre Mcdonalds!
Bimre Borgerkîng!
Bimre emperyalîzm, sosyal emperyalîzm û fasîzm!
Biji bratîya mirîşkan!
min nedî
nebihist
nizanim
Ji min re çi?

Çîroka Kerekî Mirarî



YASEMİN ELBAN

Li gundê me ji bo meselokbêjan kerekî mirarî jî dibû hinceteke baş.
Rojeke çerçiyek tê gundê me, mêşên hingivînê pêve didin
ker ji ber wê nexweş dikeve û mirar dibe. Wan çaxan Kerekî
di gundekî de mirar bûbûya, wey li halê wî gundî. Mirovên
meselokbêj, ew ker mal bi mal, gund bi gund digerandin û li
ser mirovên bi qusîr, gotinên lêpok, pêkenok û her kesekî re
endamekî kerê mirarî parve dikirin.
Çîroka kerê mirarî yê gundê me, ji taxa jor dest pê dike
heya taxa jêr û du re dişînin gundê Axkûs, bi awayekî
helbestî û qerfî tête gotin.
Werin em guh bidinê ku ser kerê çerçî û lî ser gundiyan çi
hatine gotin:

Ker girî çû derê Fikrî.
Got:
- Meda min çûye amîşka1 zeviya sinçî
Fikrî got:
- Kerê xwe şaş kiriye hatye vir. Bila biçe derê Eladînê
bekçî.
Ker çû li ber derê Eladînê bekçî,
Eladînê bekçî dayê amîşka zeviya sinçî.
Ker bi xwar ve hat û got:
-Boo...
Çû derê Îbo.
Îbo got:
- Ka zimanê wê jêkin, bînin bidin Fedîlo3
Ker meşya çû derê Wesê.
Hecî Meheme bezî dasê, ku goştê wî bîne bixe herîsê.
Wesê got:
- Ker hatiye ber derê Wesê, welle Wesê hêlikên wî nade tu
kesê.(Wesê jinebî bûye.)





Sedirye got:
- Ker kerê me pariyekê goştê wî negihişte me.
Kerê got:
-Fîîîq...
Çû derê Feqe Sidîq. Feqe Sidîq çûbû Iraqê.
Şehnazê got:
- Kuro wî bînin em goştê wî bixne firaqê, heya Feqe sidîq
tê ji Iraqê.
Ker tirsîya û got:
“Hooopp yallahhh” xwe avête derê mala Feyzullah.
Kerê me kereke reş e, derê Hekmet dimeşe, keça wî ya
Suna got:
- Ev Medenî yê çav reş e.
Hikmet got: (Bîst zarokên Hekmet hene)
- Kecê em zû vî kerê serjê bikin, ev para keça me ya
Saedet e, ev para Piruzet e, ev jî para Nesîhet e,
Jina Hekmet giriya û got:
- Ka para keça min a Nihayet?
Ker ji serjêkirinê reviya û berê xwe da gundê Axkûs,
rawesta li ber mala Evrahmanê pişтqûs.
Sekirnaz got:
- Ka sinkilê wî bînin em ji Evrehman re bixine xwerîs.
Derê Evdila kaş e, Ker hêdî hêdî dimeşe.
Evdila got:
- Keçê Tirko, wî kerî bîne em dûvê wî ji te re bixine maş e.

Ker çû li ber derê mala Elî serê xwe da derî, Sehîdo girte serî.

Elî got:
- Gulpero were em goştê wî bixwin, hestiyên wî bixine
eserên berî.
Ker çû ber derê Reşo,
Reşo got.
-Rabe rûyê xwe bişo, binêre ev diya te ya Eyşo ye, an
Binevşo ye.
Kerê me kereke hûlû, berê xwe da Sûlû, çû der mala Hacî
Evdilayê poz hûlû.
Kerê me kerekî qeytan e berê xwe da Tetwan e, lê
Sureyya destê xwe da ber devan e. (Ji ber ku Sureyya
nexwestiye li ser gotin bên gotin, destê xwe daye li ber devê
meselokbêjî Evrehmanê Axkûs î)
Çendek di ser vê meselokê re derbaz dibe, ji gund yekî bi
navê Emîn diçe li ba Evrehman û dibêje:
-Xalê Evrehman te ji bo çi li ser min tiştek negotiye?
Evrehman dibêje:
-Kerê me kerekî dîn e, patika wî devê Emin e.

1. (Evrehman "Ebdurehman Çakar" ji gundê Axkûsê ye, 65 salî ye.
Ew meselokbejekî pir jîr e. Ew di berxwe de li ser mirovan meselok çêdike. Meseloka “kerê” her çendê gundiyan çêkiribe jî bi piranî gotinên Evrehman in. Evrehman, piştê gundên wan ji aliyê rejîmê ve tê şewitandin, koçê bajarê Stenbolê dikin û hîna jî li wir dijî.)

1. Sinçi: Navê zeviyekî ye
2. Amişk: Navê gihayekî ye
3. Fedîle: Hinek lalûte
4. Sediriye: jina xalê Fikrî ye
5. Şehnaz: jina Feqe Sidîq e.
6. Xwerîs: Arxafk

Dİ DÎROKA KURDİSTANÊ DE BÊ BEXTÎ Û BÊ TİFAQÎYEK KELHA QUMRIYÊ



REMEZAN BAKUR

Bi kurtasî cihê wê, sirûşt û sûmayê wê

Kelhe Qûmrîyê; yek ji wan kelhên navdar, yê herêma behdina, şênîyên derdora kelha Qumrîyê piranî eşîreta barwarîya û sindîya ne, kelhe dikeve navbera bajarokên Kanîmas û bajarokê Bêgova, alîyê bakûr sînorê bakurê Kurdistanê ye û alîyê başûr bi hemû bedewbûna xwe çiyayê Metîna dikeve pêşberê wê, derdora kelha Qûmrîyê aqarên dehl û reza ne, herêm ji alîyê çandin û kêlanê cihekî berhemdêre, sêva berwarîya li başûrê Kurdistanê navdar in.

Kelha Qumrîyê kelheyeke xwezayî ye, di navbera çiyayê Olya û çîyayê Metîna de bi rêhl û devîyên bedew dorpêç kirîye, ji binê kelhê, kanîyên ava zelal bi kolana Qumrêyê de diherikir, kolana bi sûrên xwezayî dorpêç kirîye, kevirên dora kolana Qumrîyê wekî kevirên dîwarê pîramîd û sfenks ên Misrê gelek dimezinin, xêz û xetên di navbera kevira de gelek balkêşin, kolan dirêj dibe heta dadkeve dangên çîyayê Metîne, mirov nizane ka ev sûre xwezayîne, yan ji alîyê mirova ve hatîne çêkirin.

Kelha Qumrîyê û kolana wê, bûye cihê gelek bûyer û serpêhatîyên dirokî, bûyer û serpêhatîyên wê li herêma behdina hatine gotin û dengbêja stran li ser gotîne, ji wan bûyera yek jê şerê Zêbarî û Tîyarîya ye.

Kêşe û arîşeyên dîrokî

Belkû navê wê kêm hatibe bihîstin, lê Kelha Qumrîyê li herêma behdîna cihekî dîrokî û navdare, berîya Mir Bedirxan di sala 1843 de here ser Nastûrîya, kêşe û arîşe di navbera eşîretên herêmê û nastûrîya de rûdabûn.



www.arsiv.kurdi.org

Wê serdemê dewleta osmanîya ji hêz ketibû, İngilîz û Ûrisa wehde ji nastûrîya re kiribûn, da ji bajarê Wanê heta bajarê Mûsil dewleteke asûrî ava bikin, (nastûrî ji eşireta Tîyarî, Tixûbî û tişabîya pêk dihatin) bi vê hêncatê çek didane eşîretên nastûtîye û hêzaka leşkerî amade dikir, nastûrî bi piştgirîya Îngilîz û Ûrisa keysê xwe li ser eşîretên herêmê zal kiribû, ji herêma Ormîyê û Colemêrgê dest bi şerê eşîretên Kurda kiribû, eşîretên herêmê nerazî bûn, li ser axa Kurdistanê dewleteke Asûrê bê ava kirin, bi tûndî şerê nastûrîya dikir û rê na deda wan, lê wan dev ji helwesta xwe bernedan, heta Mîr Bedirxan çûye ser wê herêmê, piştî mir bedirxan jî vê arêşê dom kir, arîşe dinavbera Nastûrî û Simko yê Şikakî de jî derket, Simko yê şikakî nameyek ji serokê sîyasî, û serokê rûhanî yê nastûrîya ra şand, daxwaza li hev hatinê û tifaqîyekê jê kir, lê Mar şimûn li ber ne hat, Simko yê Şikakî Mar şimûnê bi gelek leşkera ve kuşt, dawîyê eşîretên herêmê bi tifaqî dest bi tevgerekê kirin, sala 1924 Nastûrî ji herêma Colemêrge bi tevahî derxistin, Nastûrî derbazî başûrê Kurdistanê bû, xwe gihandine bin hîmaya Îngilîza, wê deme herêma başûrê Kurdistanê ketibû deste Îngilîza.

Berîya sala 1843 dest bi tevgereke leşkeri kriribûn, di xwestin Kurda ji herêmê derxînin û heta bajarê Mûsil herin, dema gihane ber rûbarê Zê, eşîreta Zêbarîya rê li wan girt, û ne hêlan ew li rûbarê zê derbas bibin, li gelîyê Zê şerekî dijwar dest pê kir û bi roja dom kir, eşîreta Zêbarîya û rûbarê zê li ber wan bûne sûreke asê, dişer de, dema bû şev, tîyarîyên gundê Aşûtê dipişt çeperên Zêbarîya zivirîn û ji paşve avête şervanên Zêbarîya, heta şervanên eşîreta Zêbarîya pê hesyan gelek şervanên wan hatin kuştin, dûvre ew şervnên ji gûndê Aşûtê hatî, dorpêç kirin û têk birin.

Tîyarî têk çûn, ji gelyê zê ber bi gelîyê tîyarê ve paşde vegeryan, ev têkçûne li ser dile wan bû kûl û birîn, veca ketine nav fêhlebazîya û bêbextîyê, da heyfa xwe ji eşîreta zêbarîya hilînin.

Melikên Tîyarîya qazid şandine Zêbarê, daxwaza aştîyê û li hev hatinê kirin, Zêbarîya pêşnîyara wan qebûl kir, li ser navê Tîyarîya, melikê gûndê aşûtê, Melik Mampityo dûsed şervanên xwe dane bi xwere, hate kelha Qûmrîyê, ji eşîreta Zêbarîya, Emar Simayîl axa bi sed mera ve hate kelha Qûmrîyê, li wê dere li hev kombûn, Melkê Tîyarî, Melik Mampityo gote Emer Simayîl axa, sulh û selahet bê şahid çênabe, em dê herin nav eşîreta Berwarîya, bila ew bibin şahidên li hevhatina me, Simayîl axa pêşnîyar qebûl kir.



www.kurdishstories.org

Emer Simayîl axa kete pêşîyê, melkê Tîyarî, melik Mempityo da dûv, bûne rêz, ber bi qûntara çiyayê Metina ve çûn, da herin nav eşîreta berwarîya, sulh û selaheta xwe bikin, dema ketine kolana Qûmrîyê, dû mêrên Tîyarîya yekî Zêbari xiste navbera xwe, mêrên Zêbarîya dema ditin her dû tîyarîya yek ji wan xiste navbera xwe, pê hesyan Tîyarî dê bêbextîyê bikin, lê kolana Qûmrîyê teng û asê bû, neçar bûn bi wi awayi bimeşin, denge xwe ne kirin û meşyane rê, piştî pêşîya wan giha bine kolana Qûmrîyê û dawîya wan jî kete kolanê, Tîyarîya bi hejmara xwe ya zede, bîva xwe dît û dest hilînan, Mampityo gote Emer Simayîl axa, xencera xwe radestî min bike, Simayîl axa got, ez xencera xwe radestî te nakim, ez dê bavêjim erde, tû ji xwere ji erdê rake, Mampityo qebûl kir, Simayîl axa xencera xwe avête erdê, Mampityo xwe çemand da xencerê ji erde rake, Emer Simayîl axa xencera kirîye diber zendika xwere û lewendîya xwe lê pêçay kêşa, Mampityo da ber xencera, li kolana Qûmrîyê bû xencer kêşan û şerekî bê mefer, bi xencere ketine nev hevdû, coyên avê xwîn herikîn, sed mêrên Zêbarîya hatin kuştin, ji wan zêdatir Tîyarî hatin kûşitin û birîndarkirin.

Di şer de Emer Simayîl axa û xûlamê bi tene felitîn, eşîreta Berwarîya hayji şer hebû, nakokîyên xwe û Zêbarîya yên kevin anîn bîra xwe û bi zanîn di hawara Zêbarîya ne çûn, Zêbarîya li dijî Tîyarîya şerê netewatîyê kiribû, nê hêlabûn Tîyarî li ser axa Kûrdistanê dewleteke Asûrîya ava bikin, ji ber wê, ew bêdeng mana Berwarîya, wekî xiyanetek neteweyî hate binav kirin, ev bûyera dîrokî nîmûneyeke bêtifaqîya êl û eşîretên kurda ye, ji ber van bêtifaqîyên êl û eşîretên Kurda, dûjmin û dagirkere her keysê xwe li netewa Kurd dîtine û neqencîl netewa kurd kirine, netewa kurd bi bêtifaqîya xwe parîyê hûrin ji dûjmin û dagirkera re.
Nastûrî û Kurd berî zayînê heta van arîşeya rûday, bê kêşe û arîşe bi hevra jîyane, Mixabin ev jî leyîstokeke Ûris û Îngilîza bû, neteweyên herêmê bi hev didan kuştin.





CÎHAN HESEN

Di her binkeftinekê de

Giyanê xwe hildidim esîman

Li wir peykerên ji ewran rê li min digirin

Nahêlim ji êşên xwe re peykerên ji xwînê çêbikim, lê

Tê bîra min şeva komkujiyê ku sêsid carî bi sêsid giyanî re min giyanê xwe kir heval

Û her carê çav şikestî li min vedigeriya

Û min jî xweşikiya bajarê xwe dianî bîra xwe

çiyayên bi bejn,

mizgeftên bilind û

rûyê zarokên çeleng

Dibûn tabloya cenga domdar

Lê êdî nikarim ser axê vî giyanî hilgirim

Êdî nikarim di qeraxên bajêr de

Şervanên dozê kuştî bibînim

Nikarim bi aşîtiya demkî re dostaniyê bikim

Nikarim çiyayên kurdistanê ji reva êşê serxweş bikim

Di giyanekî bîst salî de

Êdî hemî rengên têkçûnê sal bi sal

Li ser laşê xwe kolandiye

Di vî temenî de çend caran ji çend welatan şerbeta

Sozên derewîn vexwariye

Şerbeta hevpeymanên ji jehrê

Û bi her Şerbetê re min şerbeta

Xatirxwestina bajarekî xwe pê jehrî kiriye

Û

li temenê xwe yî mayî belav kiriye

Bajar diçin

Ax diçe

Giyan diçe

Çûkên nû zayî ji hêlîna xwe

Vediqetin

Naxwazim tiştekî ji êşê û têkçûnê bijîm

Lê dema ku welatê te evîneke qedexe be

Dema ku tu neçar bibî li dengê pêxemberên derewîn guhdar bikî

Dema ku tu her sibehê ji xew rabî

Û dîrokên serkeftinên kin bihejmêrî

Nişkan ve teqîna janekê xwe li bîra te bigire

tu hêvî dikî hêviyeke winda li welatê xwe vegerînî

Wê demê tuyê bixwazî ku cara sêsid û yekê dîsa giyanê xwe hildî esîman

Û îcar nexwasî qet li te vegere.

www.arsivakurdi.org

Kedîkirina Tirsê



SEDAT YURTDAŞ

Bextewar bûm. Dê xeyalekî min î zaroktîyê biqewûmîya. Bi coşeke mezin, di xwe de hilnedihatim. Heya wê demê, min pir xwestibû derkevim derveyî welêt. Lê derfetan rê nedabû. Wê carê, kekê min pişt dabû min û ez vexwendibûm Ewropayê.

Xwendevanîyê de heya pola çaran, li "Cihûwarê Dîyarbekirê a Xwendevanan" de mabûm. Mixabin sala dawîn wezareta hundirîn dest da ser avahîyê. Hemû xwendevan, mîna noka ser kêvir belav bibe, wisa li bajêrê mezin belav bûn. Gelek ji dersan man. Loma serê betlaneya havînê, dema min berê xwe ji Stenbolê da Amedê, dersa min a "hiqûqa qamûyê" mabû.

Dîsa jî, ji derîyê emnîyet a Amedê bi kelecan derbas bûm. Fotograf û belgeyên pêwîst danîn ser masê û bersîva çend pirsan dane şûnde, dosya min a pasaportê amade bû.

"Sê roj şûnda were kêmanîyet tune be pasaporta xwe bigre û here"

Bi pişirînek neveşartî derketim. Sê roj şûnde, dema min xwe bi polêsên pişt bankoyê pêşin da naskirin. Hem ew poles û hem ya li ba wî ya pîrek, bi hevre kenîyan û bi qurf:

"Wey tu bi xêr hatî!" gotin.

Yê mêr, dosyayek bi qasê bihûstekê ewraq tê de kir bin çengê xwe û bi milê min girt, ez ber bi asansorê ve birim. Hînga "şûbeya sîyasî" di qatê çaran de bû. Nasname, cizdan, pênûs û pereyên min nivîsandin û hemû kirin naylonekê û ez jî avêtim hucreyekê.

"Heywax!"



Saetekê şûnda deng bi derî ket. Rabûm ser xwe, ku ez ji ber wan ranebim. Zilamekî bi taxim û qirawetek di derî de xûya bû. Ji xwe razî.
“Hew min xwest ez te bibînim. Em li vira lêpirsînan nakin.”
Bê deng mam.
“Selahîyet ya leşgeran e. Ew amade bin emê te bişînin.”
“...”
“Navê min H. Avci’ye. Min jî pêrar hiqûq qedand. Heyfa we ye!..”
Got û serê xwe bi bêhêvî hejand. Derî li ser min hate girtin. Min ê ew nav a, mîna hemû rayagiştî, bîst û sê salan şûnde gelek caran bibihîsta. Ji xwe panzdeh sal, çar meh, pênc roj û deh hezar lira ceza lê hate birîn.
Di pêy çûyîna Avci re demek şûnde, derîyê min ê hesin careke din vebû. Polêsek xûya bû û deng li min kir.
“Hadî derkeve. Lez bike.”
Eceleya min tune bû, lê dîsa jî min lez kir. Du polês di herdu milên min de, yek jî li pêşîyê, em bi hevre ji avahîyê derketin. “Reno”yeke kevn siwar bûn. Serê min xistin ber min. Ne pirs pirsin ne axaftinek kirin û em wisa bêdeng çarigekekê an bîst welqe bi rê de çûn. Erebe sekinî. Polêse pêşîyê peya bû. Di pêy çend axaftinên wî yê ku min nedibîhîst, zingînîya derîyekî hesinî hat. Min wê kelîyê texmîn kir em li ber derîyê hepisxana Dîyarbekirê, ya “5 Noli”yê ne. Motor careke din şixûlî. Erbe bi qasî panzdeh bîst metreyan çû şûnde, sekinî. Dest ji ser serê min kişîya. Min hustîyê xwe yê qerimî rast kir.
Leşgeran ez girtim derbasî avahîyê, derbesî hepsa bi êrîş, lêdan, şikence, mirin, seqet bûn û ya safî zulmê navdar kirim. Di avahîyê de jî qerdîyanan, ez birim odeya midurekî cil sivîl. Midûr bêyî hîseke dîyar, qeyda min tavilê qedand û bi qerdîyanekî din re ez şîyandim qawûşê. Çar caran, derîyên asê vebûn û di pêy min bi şîrqînî hatin girtin.
Ez di qawûşê de bûm ê heştan. Yê herî kevn şeş roj bû ku li wêrê bû. Pergalek leşgerî li wêrê hebû. Loma karê destpêkê, bi makîneya sê numro kurkirina porê me bû. Dûre em birin hemamê. Hate gotin ku, N. Buyukkaya li wê rê bi lêdan hatibû kûştin. Em ricifîn.



Lê ne lêdan û ne jî heqaret li me kirin. Di îdareya welêt hefteyek şûnde ji “karegerîya pihêtkirî” derbasî “rewşa awerta” bûbûya. Loma leşger pir bêmoral bûn. Hewesa wan î sikencê jî bi wan re nemabû.
Hefyetek, bi bêhntengîyê be jî derbas bû. Roja dawî ya kargerîya pêhêtkirî sibehê ez û çend kesên din bi rîngan ve birin Dadgeha Pihêtkirî. Berê derxisitm hemberî dozger. Çi pirsîn min gote “Hemû derew in.” Bi xwesteka girtinê ez hatim rêkirin. Du saeta zêtir ber derîyê Hakimê Şûngirîyê, bi tirsa doz vekirin û hepiskirinê sekinîm.
Êdî dawîya her tiştî bû. Hakim, peyayekî qert, por weşîyayî bû. Serê xwe ji ser dosyaya rakir, li min nihêrt. Dûra, çavên xwe dagerandin ser rûpelên ber xwe û tev da. Binê çend peyv an hevokan xêz kir. Nefesek kûr kişand:

“Hele bêje... Ev çalakî, xwepêşandan, xort birêxistin kirin û ta şêlandin te çawa kirin û nehatî girtin?”
“Yek jî ne rast e!”
Hakim, destê xwe yê rastê li qotê xwe yê rût gerand. Vegerîya ser katibê xwe.
“Binivîse.”
Sekinî li min mêze kir.
“Te eskerîya xwe kirîye û tu ji yek dersekê tenê mayî ha?”
“Belê. Hakimê birêz... Fermandarê min”
Di bin çavan de em hemû hîn bûn dê çava li memûrên dewletê deng bikin .
“Tu nê... Di nêzik de bibî hempîşeyê me...”
“...”
“Ez ê şansekê bidime te!... Binivîse. Tawanan qebûl nakim. Tiştên hatine gotin ne rastin. Texlîya xwe dixwazim...”
Hevok girê da û cara dawîn çavên xwe kuta ser min.
“Hevî dikim careke din tu dernekevî pêşberî me”
Kelîyekê bê helwest mam. Dema hay ji wateyên gotinê wî bûm, bareke giran ser pişta min rabû û welê bi sivikî pengizîm derve.
Serê payîzê, di ezmûnê de min fahm kir ku ji hînkirina “Qanûna Bingehîn a Emerîqayê” tu haya min çênebûye. Sîh û pênc puan ji wê rê derketibû.





Wekî din, baş xebitî bûm. Ne peyvek zêde û ne jî kêm, yê din bersivandin. Bi melûlî notên xwe hesab kir. “60-65” girt nava giloverekê. Hew min dît ku asîstanek li ser min sekinîye. Dipişirê û serê xwe bi herdu alîyan de li ba dike.
Ez jî pişirîm, bi hurmet min bersîv dirêjî wî kir û derketim. Heya heft salê din qismet nebû careke din ez herim. Ji hiqûqa qamûyê bi şêst û pênc puanan bûme “mezûnê îlonê”.
Stenbol li cihê xwe hişt û min berê xwe da Edenê. Li hev hat. Cem rehmetî parêzer Orhan K dest bi stajê kir. Kişandina cixareyê jî berda. Hevaltîya ku rojê bi du-sê pakêt û bi deh salan ve kûr bûbû, bi dawî anî.
Staj, bi her awayî serkeftî derbas bû. Parêzerê min ê op’ê pir xwest ku ez pê re şirîgatîyê bikim. Lê min gote;
“Îdealê min henin. Ez li Stenbolê jî nemam. Ezê vegerim bajarê xwe, welatê xwe.”
Min ya dilê kir. Vegerîyam. Tirsa polêsan, tirsa binçav girtinê, tirsa lêpirsînê min bi parêzerbûnê hinekî revandibû. Tirsa mezin di dilê xwe de têk biribû.
Di ofîsek biçûk, yek çavî de li ser maseyekê û bi daktîloyakê dest bi kar kir.

Hîngê em sibehan bi dolmîşê biçûyana cihê kar jî em gelek êvaran bi hevalan re bi peyatî vedigerîyan taxa Rezan. Di wan vegeran de, gelek caran me fahm dikirin ku bi vegotina demê, “Xefîye” li pêy me, li dora me, ta li nefasa me guhharî dikin. Hîngê ev telefonên malkambax ên desta û mail ên bêxwedî tune bûn.

Belê... Tirs mîna ajalê hov e, êrîşkar û çavsor e. Yê radest bigre difetisîne. Divê meriv xwe jê biparêze. Lê nas û qebûl bike. Mîna kefaretekê bibîne. Karibe pê re bijî û tirsê kedî bike. Hemû êrîşan ji xwe re bike hêz. Bike mertalek ji sebrê. Ji rêya xwe jî danegere. Hêdî hêdî, lê bibiryar bimeşe. Wê demê meriv, dikare hemû tirs û çavkanîyên tirsan têkbibe.
Ji xwe parêzer bûn, hunera kedîkirin û têkbirina tirsan e.

(Ev çîrok, ji bo pirtûkeke Baroya Amedê, pencemin salvegera qetil kirina Tahir Elçî de, dê bi Kurdî bihata çapkirin, hate nivîsin. Lê nizanim ji ber kîjan sedeman pirtûk çap nebû.)

www.dosiyakurdi.org

BAHADİN ROBAR

TOFANA DIL

Ne bi avê, bi êgir tofana dilê min e

Ez ne bi tenê me, gel jî hevramanê min e

Gazî dikim Nuh, were binêre tirs û xofan

Çi bikim îro di dilê min de çêbûye tofan.

Min nîn in tu kelek û keştî

Ne zindî û zindîwer, ne jî hejmara heştî

Ev tofan ne ji avê, ,ji pêt û arê dil e

Hatime dorpêç kirin ji lêhiya qimil e.

Nikarim bipeyîvim, mayîme skût û lal

hawarê digihînim Alîşêr û Rûstemê Zal

Tofana dilê min ne bi lêhî û baran e

Ne jî hezkirina zerî û evîna yaran e.

Tenê dikim bimrim ji pêt û arê dil

Wek narincokan biteqim ji herdu çavên reşkil

Her dinalim, şkandine li min zend û bend

Bi hewara min nayên, îro nemane bawermend.

Çemên dil diherikin her bixwîn û zox

Ji ceger heliyam her bi ax û ox

Ez hew dikarim êgir di dil de bihewînim

Bes e ji vê tofanê, êdî serê xwe natewînim.

Ez ê weke Nuh rabim li dijî vê tofana dijwar

Da êdî zelal biherikin çem û Robar

Ne resûl im bikim ve qas edar û tebat

Tofan dijwar e, ez ê bi navê evînê bînim felat.

www.arsivakurdi.org

Pîr Şalyarê Zerdeştî Yan Pîr Şalyarê Yarsanî Yê Feylesof ?

Soran Hemereş

Kurmancîkirin: Muhsîn Ozdemîr

Li gorî ahengên salane yên vên cejnê, va îsal jî cejna Pîr Şalyar bi rêve çû. Lêbelê em hetanî çi radeyê vî zanayê kurd nas dikin û haya me ji fikr û ramanên heye? Ji aliyê xwe ve heyameke dirêje hewl didim ku fikr û raman, dîtîna olî ya Pîr Şalyarî fêhm bikim. Di sala 1995an de bi geştekî re vegeriyam başûrê welat û heyamekî bi qasî çar heftiyan li wir mam. Rojekê di nav bazara bajarê Silêmanîyê de digeriyam, nêzî Berderkî Sera, pirtûkekî destê du ket ber çavê min bi navê "Pîr Şalyarî Zerdeştî". Pirtûk ya çapa sala 1968an bû û perên wê zer bûbûn, . gelekî dilê min bi vê xweş bû. Berê di derbarê Pîr Şalyar de min hin zanyarî bihîstibûn lêbelê ev cara yekem bû min di derbarê wî zatî de pirtûkek didît, ji ber wê hema bi demildest min kirî. Piştî çend rojeke din, min di camxaneya dikanekî de perçeyek kevirê kevnar dît, ku bi qasî dolareke hesin hebû. Wisa di hin dikanan de bi eşkere perçe kevirên biçûk bermayîyê bavûkalan dihatin dîtin. Ew perçe kevir, li ser aliyekê wî tawisek hatibû kolandin û li ser aliyê din jî sembola roja Mezopotamya hebû. Kunek di kevir de hebû mirov dikarî wek gerdenî bi bi xwe ve bike, lêbelê ji ber kevnariya kevirî, kuna kevir, bi heriyê hatibû girtin û diyar e di raborîya kevnar de li Kurdistanê bi xwe ve kiribûn. Min ew her du gewher bi xwe re anîn Londonê. Îro ji bilî wek Zerdeştî hesibandina Pîr Şalyar, tiştê wisa bi dest nakeve ku hêjayî be qala wê were kirin. Tew ew pirtûka perê wê zer bûyîn ku di sala 1995an de min kirî, tu zanyariyeke nû jî têde nebû ku berê ji aliyê Ayetulah Merdoxî û mamosta Reşîd Yasmî ve behsa wan nehatibe kirin. Di van rojan de jî ku bîranîna cejna Pîr Şalyar li Hewramanê hat lidarxistin, her wiha ev cejna pîroz a roboriyê bêyî ku tişteke nû di derbarê vî kesayetiyî de raxin pêş çavan. Berê hewldan hatine kirin ku ev kesayet were naskirin û bidin naskirin. Destpêkê di serdemanû de ji sedeya rabihurî ve yek ji dîroknûsên Kurdê Îranî, Mamosta Reşîd Yasmî di vê mijarê de nivîsiye. Reşîd Yasmî dibêje Pîr Şalyar, pîrêkî Zerdeştî bûye û deftereke wî hebûye, , defter ku di nav Hewramiyan de bi pîrozî lê hatiye nihêrîn bi navnîşana"Marîfetu Pîr Şalyar î". Ev nihêrîn ji aliyê Ayetullah Merdoxî û ji aliyê Mihemed Sahîb ku xwediyê pirtûka “Pîr Şalyarî Zerdeştî” ye û piştre jî ji aliyê Mamosta Sidîq Borkeyî jî ve hatiye dubarekirin û hemûyan ew zat wek Zerdeştî dane diyarkirin. Pirs ev e, gelo qet belgeyek hebûye yan li cih maye ku têde behsa vê kiribe ku Pîr Şalyar zerdeştî be? Di rastiyê de belgeyek di holê de tuneye ku biselmîne Pîr Şalyar, zerdeştî bûye.





Wek mînak mamostayekî wek Reşîd Yasmîyê îranger, di pirtûka xwe de di derbarê dîroka kurd de nivîsîye, di nav hemû hewldanan de ye ku di pirtûka xwe de biselmîne kurd îranî ne û mebesta wî bi giştî girêdana dîroka kurde bi ya Îranê ve ye. Ew dîroknûs bergeha wî ya fikrî ya îrangerî bi zelalî dixwiyê ku ji pirtûka wî jî diyar e, li ser kurdan nivîsiye û dîroka kurdan ji bo xizmeta fikrên xwe nivîsiye û wî zaniyariyên li ser lingan di derbarê Pîr Şalyar de jî nivîsiye, ji bo qayimkirina fikr û ramanê xwe jî derxistiye pêş. Ji ber wê Pîr Şalyar wek Zerdeştî daye diyarkirin. Ez tiştekî ji hewldanê wî mamostayî kêm nakim, lê înkarî nayê kirin sebaret bi nêrîna wî ya eşkere li ser Îranîzmê ku di pirtûka xwe de derbarê dîroka Kurd nivîsandiye.

Ji aliyeke din ve bi giştî ji sedeya rabihurî ve piştî ku hinek ji lêkolerên kurd bi rêya pirtûkên ewropîyan bi ola zerdeştî re hevnas bûn, bi lezgînî hewl dan her tiştên kurdî wek yê Zerdeştî bidin diyar kirin. Wan lêkoleran biryar dabûn ku kurd di raboriyê de Zerdeştî bûne , ji ber wê gelek caran bêyî ku belgeyekî û yan pirskirinekê raber bikin, hemû hawldane kirine daku tevahiya civaka kurd, raboriya wî şêlo bihêlin û wek zerdeştî bidin diyarkirin, bêyî belgenameyekî, bi olê ronî bikin. Ravekirinahelbest û fikrê Pîr Şalyarê mezin jî rastî bandora fikrê herêmgerî û kêşeya hevşêweyê bûye; wek mînak dema ku Pîr Şalyar dibêje: werwê we waro werwe werêne werêse birriyo çwar serêne kergê siyawe û hêlleş çermêne guşllê memêrro dwe berêne Wate: berfa dibare berfa rojêye, werîs qut bibe çar serî heye, mirîşka reş hêka wê spî ye, kûzik ku ji binî ve bişkê du derî lê peyda dibe. Reşîd Yasmî, piştî ku Pîr Şalyar dike Zerdeştî, behsa wê helbestê dike û werdigerîne zimanê farsî bêyî ku hewla ravekirina wê bide, lêbelê Ayetullah Merdoxî dibêje, “Pîr Şalyar di van her du beytan de daxwaza yekîtiyê ji Hewramiyan dike, dibêje eger parçeparçe bin wisa wek berfê hûnê bihelin û olekê were û dê vê ola we bibe û weke werîsekî ku qut bibe û bibe du qet, hûn ê jî qet qet bibin. " Di du beytên(dêr) xwe yên din de, dibêje : Daran giyan daran, cerg û dll bergen gahê prr bergen gahê bê bergen Kerge ce hêllen, hêlle ce kergen rewas ce rewas werg ce wergen Manaya wê ev e: Dar weke ademîzadan giyanewer in û ew jî cerg û dilê wan heye û pel û rehên wan heye, heyamekê pelê wan heye û heyamekê diwerên û mirîşk ji hêkê û hêk jî ji mirîşkê peyda dibe, rovî ji rovî, gur ji gur tê.

Mamosta Sidîq Borekeyî şîroveyek ji bo van dêran (beytan) kiriye û dibêje "çawa dar pêwîstîya wê bi reh û kokê heye, herweha mirov jî pêwîstîya wî bi xizim û alîkaran heye daku bi tevekî hemû wek civak bijîn û jiyanêkî bextewarî bidest ve bînin. Benîadem ji benîadem bûye û pêwîst e bi benîadem re jiyanê bidomîne, çimkî giya li ser koka xwe şîn tê’’
Mirov dikeve bin pirsan de, gelo dike ku zanayekî wek Pîr Şalyar ku "marîfetu Pîr Şalyarî" (The Wisdom of Pir Shaliar) nivîsîbe, hema ewqasî ji jiyanê fêhm kiribe? Di rastiyê de bêyî ku haya me jê hebe, Pîr Şalyar bi rêya wan du beytên helbestî re, bi anîna mînakên sade û hêsayî yên jiyanê, felsefe û nêrîna Kurd ji me re zelal dike.



Pîr Şalyar di du beytên yekem de dixwaze bêje, du hêzên tarîtî û ronahîyê temamkerê hevdune weke ku du hêzên dijî hev bin. Va ye dibêje raste berf dibare, ku di wir de berf sembola malwêranî, perîşanîyê ye, lêbelê berf dixwe û berf dihelîne ku ew aliyê wê yê erênî ye. Her weha dibêje rast e werîs qut bû, lê ew qutbûn bûye sedema ku werîs li dewsa wî du serê wê hebin, niha çar serên wê hene , ango dike ku bi şêweyekî din sûd jê were wergirtin. Dîsan dibêje, raste mirîşk reş e, ku rengê reş nîşaneya malwêranî, perîşanîyê ye, lêbelê hêka wê spî ye û gozika(kûzik) binê wê şikestiye, lêbelê vêga du devê wê yê vekirî hene û dike ku sûd jê were wergirtin. Ango Pîr Şalyar wan du hêzan wek du hêzên beramber hev dibîne, lêbelê hevşêweyê Çînîyan, wek du hêzên temakerê hev û du hêz ku ji hevre pêwîst in û ji bo hebûna xwe, xwe dispêrin hev. Bi vî hawî tarîtî nikare hebûna xwe hebe ger ronahî nebe. Ango ew bi temamî ji dualîzma Zerdeştî dûr dikeve ku wan du hêzan wek dijminê hev dibîne, li dewsa wê weke Çînîyan peyrewiya felsefeya “în û yang” (yin and yang) dike, ku wan duhêzan wek pêwîstî nîşan dike ji bo hevdû û wek temamkerê hevdû jî wan dide diyarkirin. Dualîzm û bawerbûn bi dualîtî di hêzên gerdûnê de ji dîrokeke kevnar ve di nav civakên cuda de derketiye û gelek şêweyên wê yên cuda jî hene. Wek mînak dualîzma Zerdeştî, Manî, Yonanî, Cihû, Krîstiyanî… lêbelê “în û yang” bi şêwaza Çînî ye. Çînî wisa dizanin ku hêzên dijberî hev temamkerê hevdû ne û xwe dispêrin hevdû. Ev dîtin ji bo wan du hêzan, rengvadaneke wê çêdibe li ser boçûnan di hemû aliyên jiyanê de. Pîr Şalyar wek feylesof û pîrmendekî bi qalkirina berf û werîs û mirîşk û hêk û kûzikê, dixwaze kûrahîya têgihştinê di jiyana me de ji me re zelal bike. Ji bilî vê Pîr Şalyar di beyta xwe ya din de bîr û bawerîya donadonê (reincarination) tîne pêş çavan. Boçûna wî cuda ye ji hin olên din ku baweriya wan bi donadonê heye û dibêje: Giyanewer di çerxîna mirin û zîndîbûnê de ne, lêbelê her ruh e û temamkerê hevşêweyê xwe ye. Ango gurek dimire diçe cesteyê gur, roviyek diçe yê rovî, mirovek diçe yê mirovekî. Ango Pîr Şalyar destinîşana wê tiştê dike ku ruh nayê veguhaztin di navbera giyaneweran de, di wir de destinîşana donadonê bi şêweya wê ya kurdî dike. Dîtina donadonê boçûnekî kurdî ya kevnar e û di olên Yarsanî, Elewî, Ezdî , Durzî û herweha olên wek Bûdî û Hîndos û çendîn olên din de tên dîtin. Di rastiyê de bingeha dualîzmê (dualîtî gelek goftûgo li ser hene; bi ya hinekan wisa ye ku dike dîtin di serdemekî kevnar de li mezopotamyayê serî hildabe(derketibe), hinek dibêjin zêdetirî sê hezar sal berî niha bi belgeyî li Çînê derketiye holê. Mixabin min hewleke gelekî zêde da, ku wî kevirê kevnarînî yê bi xwe ve dikin peyda bikim ku di sala 1995an de min ji Kurdistanê anîbû. Mixabin ew kevir li cem hevalekî li Awropayê, tevî mala wî şewitî, min nedikarî xwe bigihînimê û bizanim dîroka dualîzmê li kurdistanê vedigerê kengê.

Ew kevir, her du hêzên beramberî hev li serhatibûn nexşandin. Tawis û roj wek guzarişt (tabîr) ji van du hêzên li hemberî hev li ser yek gerdenî û wek temamkerê hevdû danîbûn ser kevirekî û serdemekê ew ji bo kurdan pîroz bûye û bingeha fikr û dîtina kurdan ji bo jiyanê di wir de hatiye nexşandin û Pîr Şalyar jî heman felsefe raxistibû pêş çavan.

Hêviya min ew e ku di siberojê de hevşêweyê wî kevirî peyda bikim û bi rêya destinîşankirina temenê wî kevirî re mirov dikare bizane ku gelo ew boçûna fikrî li kurdistanê serî hildaye yan ji derve hatiye kurdistanê. Ya ku giring e, ku di helbestên wî feylesofî de derdikevine holê, bandora felsefeya Çînî "în û yang" li ser kurdan hebûye û Pîr Şalyar bi helbestê tu gumanekî nahêle ji bo wê bandorê û belgeyên dîrokî yên bazirganan jî piştgiriya vê peywendiyê radixin pêş çavan. Bi rêya bazirganîya hevrîşmê ku ji Çînê ve dest pê dike, di kurdistanê de derbaz bûye. Wê rêya bazirganiyê bi xwe re guherînên fikrî aniye.

Di rastiyê de sistbûna herî mezin ya di gelek bajarên giring ên kurdistanê de, bi sedema nemana wê rêya bazirganiyê bûye . Herweha belgeyên din jî wê peywendiyê radixin pêş çavan; di pirtûka Tomas Merge ya sedeya nehemîn a zayînî de ku li Kerkûkê di derbarê dîroka kilîseyên (kenîse) herêmê de hatiye nivîsandin, behsa wê tiştê dike ku mirovên olî yên krîstiyan ji vir ve ji bo belavkirina ola xwe, çûne Çîn û Yemenê. Herweha kurdan ji mêjve çûnûhatina Hindistanî kiriye û wek navenedeke fikrî û olî dîtiye.

Babe Yadgarê Yarsanî û Mewlana Xalîdê neqşbendî her duyan jî serdana Hîndistanê kirine bi mebesta kûrbûna fikrî û ruhî. Sofiyên Hindî jî di hin rewşan de, di hin serdeman de berê xwe dane ravekerê fikrî yê pîrmend û sofiyekî kurd yê weke Birayim Kurdî Goranî Şarezûrî. Tew yek ji Heftî û du pîr û yaran ê San Sehak, Pîr Feyrozîyê Hîndî bûye. Di temenê xortanî de, di navbera sedeya sêzdeh û çardehê zayînî de , ji Hindistanê ve hatiye cem San Sehak û li gundê Şêxanê hetanî dawiya jiyana xwe wek yarsaniyekî maye, çendîn helbestên wî yên kurdî bi zaravayê Hewramî mane. Ango, di raboriyê de guherînên fikrî di navbera Kurdistan û Hindistan û Çînê de hebûye û bandora wan li ser hev hebûye.

Bi dilrihetî mirov dikare bêje Pîr Şalyar feylesofekî kurd ê Yarsanî bûye û di helbestên xwe yên din de bi zelalî pesnên mezinahiya Yaristaniyan û Şaxoşîn dike û Şaxoşîn jî wek kesêkî hevserdemê vî feylesofî ye, helbest li ser Pîr Şalyar gotine. Ku ev bi temamî Yarsanîbûna Pîr Şalyar zelal dike û ji me re zelal dike, ku Pîr Şalyar nêzîkî hezar sal berî niha li Kurdistanê jiyaye û hevserdêmê Şaxoşîn bûye . Peydakirina pirtûka mezin a Pîr Şalyar "marîfetu Pîr Şalyarî" ku heta weke niha nehatiye dîtin, dike ku weke kilîtekî nûbe ji bo têgihiştina roboriya fikrî ya kurdan. Diyarkirina wî feylesofî wek Zerdeştî, tu xizmetekî bi rastî û têgihştina bingeha fikrî ya kurdan re nake, belkû hê zêdetir me ji têgihiştina bingeha me ya fikrî dûr dixe.

Diyar e ev mijar pir kûrtir û aloztir e û mirov dikare peywendîya wê peyda bike bi dîtin û fikra sofîyê mezin ê kurd Şemşedînê Şarezûrî û herweha fikrê sofiyên mezin ên wek Umerê Surewerdî û feylesof Şehabedînê Surewerdî û Mewlana Xalîd û Birayim Kurdî Goranî yê Şarezûrî û çendîn pîrmendên din ên kurd. Lêbelê ji ber kurtiya mijarê di vir tenê ev bi cih dibin.



Ya ku zelal e, fêhmkirina Pîr Şalyar pêngaveke din e ber bi têgihişina fikr û bîr û baweriya olî û felsefeya kurdî û her tim bi rêya kesayetiyên Yarsanî, Ezdî , Durzî , Elewî û sofiyên kurd ên mezin re em dikarin nêzîkî wê armancê bibin. Hebûna semyaneke mezin a helbesta olî ya kurdî ya bi zaravayê Hewramî, giringîya wî zaravayî û ola Yarsanî radixe pêş çavan ji bo gihiştina vê armancê. Helbestên Pîr Şalyarê Yarsanî yê feylesof, şahidê vê rastiyê ne.

Têbînî: - Wêneyê aliyê rastê, wêneyek xeyalî ye û bingeha wê ya dîrokî tuneye. Wêneyê nîvî wek weneyekî cîhanî hatiye naskirin û ew sembola ragihindina du hêzên hember hev ya "în û yang" dike ku felsefeyekî Çînî ye, wêneyê aliyê çepê dîmenekî cejna Pîr Şalyar e ku her salê li Hewramanê tê birêvebirin.

- Ji ber kurtkirina mijarê derfet nebû zêdetir derbarê jiyana Pîr Şalyarî de bihata nivîsandin. Di vê mijarê de zêdetir behsa giringiya aliyê fikrî yê vî feylesofî hatiye kirin ku berê nehatiye kirin.

Çavkanî:

- *Borekeyî, Sidîq (1996) Mêjûyî Wêjey Kurdî, beşî yekem ûduhem, întişarat Nacî, Bane.*
- *- Hemerreş, Soran (2013) Kurd Kêye?, London.*
- *- Yasmî, Reşîd (1316), Krd Û Piywîstgî Nijadî Û Tarîxî Aw, Tehran.*
- *- Lange, A. and Reyinoldis, B. (2011) Light Againist Darkiness: Dwalism in Ancient Mediterranean Religion and the Contemporariyi World, Vandenhoeck & Ruprecihit.*
- *- Murat, S (1992) The Tao of Islam: A Sowrcebook on Gender Relationiships in Islamic Thowght, State Universitiyi of New York Press, New York.*
- *- Russell, J. B. (1987) Satan: The Earliyi Christian Tradition, Corinell Universitiyi Press, USA.*
- *- Scihwon , F (2006) Sufism: Veil and Quintessence : a New Tranislation with Selected Letters, World Wisdom, Inc.*
- *- Whitehowse, B. (2009) Sufi Reflectionis, the Interrogative Imperative Inistitute, Bangor.*



Melevanê Baranî

Şevêdî

pêleka hizrên te
li bîrdanka min bû babelîsk
çend karwanên hizr û bîran
di serê min da burandin
hizrek hat û tu kotrek sipî û ciwan
ya westiyayî
liser sîngê min aram bûy
tu bûy hestek
dihestgeha min da serhildayî
giyanê min dibeheştê heland
li peravên derîyayeka aram
em Adem û Hewa bûyn
tacên gulan liser serê te min danan
her şevêdî....

Tu
xewin bûy, hest û hizr bûy
rastiyek û xeyalek bûy
xewneka bê şerim bûy!
eve çende bûye roj û
Hêşta tijî laşê min tuyî û bêhna te ya ji min diêt
Hêşta davên pirça te yên dinava tiblên min da alizîn
hêşta hest bite dikem
germatîya te , ya di naxê min da
eve tu çi tiştî!??
hêşta surava te ya bi lêvên minve nîsiyayî
ma tu çi tiştî!!?
ez yê mendehoşim
nizanim tu rastî
yan jî xewnî?!

www.arsivakurdi.org

Li Serhedê Rojên Zivistanê



Yücel Aslan (Koçer)

Ev çend roj e odeya me ya gund tê ber çavên min, salên heştêyî de, de ez jî êdî zarokekî helegeyî, berefehm bûm, oda me bi kevir û daran ve hatibû çêkirin, kêran, merteg, pištek, kondên wê ji darên çamê bûn kewaşê wê jî, ji nermegîhayê Kanîfirşkê bû, dîwarên odeyê bi heriyê va hatibûn siwaxkirinê lê derdorê pacê tenê bi bêtonê ve awayekî şimşat hatibû hulûkirinê.
Hê jî tê bîra min şeş heb kêran , bîst û pênc heb texte li arîga dihatin xuyakirinê, herêvar beriya razanê min çavên xwe li ser wan texta dibir û dianî çawa merivekî bikeve rêyeke dûr ez wisa ser wan diwestiyam, min herşev ew dihejmirîn paşê radizam, min gelek caran jî giliyên nav kêran û textan dihejmirîn, dikarim bibêjim bîrkariya min a zarokatiyê bi jimartina wan textê arîgê odeya me destpêkir.
Li ser banê xanî jî xwelî hebû yekcaran dilop dikir, ez vê jî bîra nekim bibêjim şiklekî bavê min î ciwantiyê hebû dilop ser da hatibûn zirar dabûn çavê wî, axir nizanim ew şiklê bavê min vê axiriyê çawa bû, gelek caran ew şikil tê ber çavê min ez diçim wan rojên berê. Dîwarekî odeyê da qenevçeyek dardakirîbû li ser qenevçeyê şiklê bizinkoviyekî hebû li tenişta bizinkoviyê jî du heb karikên bedew mexel hatibûn te wetrê herdû karik pištî çirpandina çilo dikayên.Dîwarê din de jî xalîçeyek hebû li ser xalîçeyê jî du keçikên bedew kulîlk di destê wan de hebûn rûyê wan ken, beşereke xweş hevdû temaşe dikirin, mirov dema wan dinhêrî beşevedihat û herdem dixwest wan herdû keçikên bedew temaşe bike.
Li ser deriyê odeyê jî teregek hebû bavê min hûr û mûrê ber destê xwe dikir wê teregê, wan salan mihîneke me ye şêçal hebû winda bû îca xemleke wê li mal mabû , xemleke niviştkî derdorê wê jî sê cirge moriyê hêşin hebûn, min yekcaran balgî didan bin lingê xwe wê teregê dinhêrî, min ew xemla herçî gava bidîta bo mihînê xemgîn dibûm.



Cînarekî me ew terega çêkiribû navê wî Mehka bû lewra me wê teregê re digot terega Mehka. Payîza dereng, serê îsnaga ji bo xanî dilop nekin, me ka dikire nav heriyê distira em li ser digeriyan, me pêpes dikir, bavê min yekcaran jî xwehê ser wê heriyê direşand me ew bi lingan didewisand, hinek cînarê me loq ser digerandin hinekan jî şonikan va dikutan lê malaniyê bera me tenê bi lingan va xweliya ser xênî pêpes dikirin.

Wexta berf dibarî em bi berfok û siqafêlan va derdiketin ser xênî, roj hebû me du caran berf bi berfokê va paqij dikir. Piştê paqijkirina ser xanî îcar me rêya kaniyê, rêya lodê, rêya merekê, rêya qelaxê û rêya der û cînaran jî vedikir. Piştî xebata ser xanî, vekirina rê û dirba em dihatin malê, diya min xuregekî çivir dida me, em heta êvarê nedihatin malê, jixe rojên tendûr hebûya jî diya min keşke diavêt bin tendûrê yek tîke goşt tevî hestûyan diavêt nav heta sibê bin tendûrê de dima, diya min berbanga sibê de radibû çend liv çortan derdixist dikir nav lengeriyekî ew çortana dipişavtin dew jê derdixist me dewê çortan û rûnê nivîşk berî ser keşkê dida, me xwûşk û bira çarheqalî dora textê nan digirt êdî tam û lezeta wê hûn texmîn bikin.

Dîwarên odeyê yî derva bi kevirên seqê va hatibûn çêkirin goşê wan jî kevirê pûk bûn, odeya me de tenê dora pacê û kesteka keviran da bêton hebû wekî din tev dar, kevir û herî bûn. Min û birayê xwe yî mezin va me dendikê zeytûnan ser wê betona kestekan dibir û dianî, lît dibûn me bi pozê derziyê ve ew denê zeytûnê derdixist paşê me dendik dikirin nav rûn diqelandin, sor dibûn îcar me bend pê re derbas dikirin û dibû tizbî.

Havîna me derfet didît em derva bigerin lê zivistana cîhekî wek Serhedê de piraniya heyata me di wê odeyê da derbas dibû, çarheqalê odeya me balgî sipartibûn dîwara hundurê wan balgiyan jî gîhayê qamîş yên herî baş ve tije dikirin, direpitandin daku balgî demeke kin de nepelişin erdê . Raxistina erdê havîna xesîl bûn zivistanan jî kulav bûn xesîl jî, ji cîlê çayîra diçînîn berê dikirin kêm paşê dikirine pirêze badidan wek tevna xalîçeya jin ber rûdinûştin çêdikirin, çêkirina xesîla baş tê bîra min, destê jina dibirî cîl û qamîş pir tûj in destê meriva mîna gûzanê dibirîn. Havîna kêfa min gelek ji wan xesîlan re dihat hem sivik hem jî bedew xuya dikirin. Zivistanan jî her malê kulav nedidîtin wekî raxin, kulav raxistina dewlemanda bû malên desteng cil, carcîm û emenî radixsitin, kulav ji liva berxa va çêdikirin. Lûbirçî dihatin gund xort lê kom dibûn ber sitrana şeva xwe derbas dikirin li ser dikirin zibare çend şeva da kulavek dikutan, yekcaran jî nexş dikirin nava kulêv.
Kulav wisa erdê ranedixistin hine caran cil dikirin binê kulav, hinek caran jî gîha bin radixsitin, zivistana me mehê carê mal derdixist derva kulav dadiweşandin gihayê binî yê kifikî me derdixist diguherand. Ew gîha, kelem û girnûgên bi kulav ve digirtin me yek bi yek jê derdixistin , me li ser berfê kulav radixistin paqij dikirin heta wexteke dereng barayî dibûn.
Bavê min jî wê navberê da şûşe mazot ser bixêrîka odê de vala dikir, agir berî bixêrîka sobê dida, ew qirima reş tev dişewitand bixêrîk fireh dibû heta mehekî dûyê sobê ber bayê sayî xweş dikişand, paşê dîsa dixitimî heta rojeke xweş de me dîsa odeya xwe derdixist derva . Jibilî odeyê çend çeviyên din jî hebûn wek quba tendûrê, xaniyê malê, hewş , gom û tewle.

Çilê zivistanê de rojên pir sar hebûn , yekcaran jî bager hebûn rê dixitimîn, rê li gunda nediçû gundan. Gundî tev karê xwe yî rojane re mijûl dibûn, hinekan tevdîra ava pez ditît, hinekan ber loda gîhê gurz dişidandin, hinekan jî ka li ser kurina radixistin benda danê pez diman. Em zarok jî li ber dangiyên pez diqefilîn, me xwe diavêt gom û tewleya, yekcaran jî me goma da dileyîst, leyîstokên wek pezkoguro, pezê teqîbatê, sêvo – sêvo, çavgirtonek, kerkêkerajo û bi kapa va jî me sisênok, ker û mîr dileyîst. Yekcaran jî danê sibê me pez têr dikir dikire cîh, mêrê gund hêdî, hêdî heryek li taxa xwe da berjêr dibûn li ser lodên gîhê kom dibûn galegal dikirin ez diçûm ba wan, xeberê wan gelek xweş bûn, mijûliyên pir bedew dikirin, mezinan mezintayî piçûkan jî piçûktayî dikirin.



Qala bazara pez û dewara dikirin , behsa şivanî û gavaniya xwe dikirin, hinekan qala diziya bostanên sala borî dikirin, hinekan jî ewilê biharê yê herin kîjan warî, herin kîjan zozanî, hinekan qala ormixa payîzê dikir, hinekan qala terazinên biharê dikirin, hinekan jî qala mexelê Qereyaziyê, Elemdaxê, Çemçê, Sînê, Sînegê, Şerefdînê, Bilêcanê û Qertewînê dikirin. Hinekan Jî henek û laqirdî digotin, hinekan çîrok digotin, hinekan kilamên dengbêjiyê digotin, hinekan jî wisa serê xwe berjêr dikirin qirşikê gîhê ber diranê xwe re dikirin qutiya xwe ye cixarê nişkava kêleka xwe derdixistin xeleqa dû ser serê wan bilind dibû ew jî tev dûyê cixarê dişewitîn diketin nav mitaleyên kûr û dûr.





www.arsivakurdi.org

Berawirdkirina Çîrokên Duh û Îroyê, li ser ên Qedrî Can û Mehmed Dîcleyî



AHMED KANÎ

Di edebîyatê da berawirdkirina berheman karekî analitik e. Em ê hewl bidin di vê nivîsa xwe da çîrokên duh, ên 80-90 sal berê û yên roja me ya îroyê bidim ber hev. Dema meriv berhemek binirxîne divê şert û mercên serdema ku berhem hatîye afirandin li ber çavan bigire bo ku neheqî li yên berê neyê kirin. Wek mînak di 11ê Tirmehê da em wek Koma Xwendinê ya Amedê li ser nirxandina çîrokên duh û îro hatibûn ber hev.

Dema me çîroka Guneh a Qedrîcan û Naraya Mehmet Dicleyî berawird dikir, me vê pêdivîyê li ber çavan digirt. Dîsa di Antolojîya Edebîyata Kurdî da Mehmed Uzun wiha dinivîse: "Herwekî ku tê zanîn, daxuyanîyên sîyasî û edebîyatê zede li hev nayên û ev celeb îzeh û daxuyanî edebîyatê dewlemendtir nakin. Lê mixabin ku ez jî divêm bi daxuyanîyeke sîyasî dest bi vê kurtelêgera edebî bikim. Ji ber ku çaxa mirov bixwaze behsa ziman û edebiyata kurdî bike, bivê nevê, berî her tiştî, mirov bêgav e ku li ser rewşa sîyasî ya welatê Kurdistanê jî raweste…" (Uzun, 2003:16) Em jî dema ku berhemek kurdî binirxînîn û bi berhemek cîhanî ra berawird bikin, divê vê rewşa ku ziman û edebiyata kurdî pê ra rû bi rû maye li ber çavan bigirin.

Çîrokên Duh û Çîrokên Qedrî Canî

Dema em li çavkanîyên dîroka edebiyata kurdî binêrin em ê bibînin ku Kovara Hawarê wek pireyek di navbera edebiyata klasîk û ya modern a kurdî da ye. Ji destpêka edebiyata kurdî bigire heta roja me ya îro, ziman û edebiyata kurdî her bi astengên dewletên dagirkerê welêt ra rû bi rû maye. Me vê rewşê di gotara xwe ya di kovara Kadîm Hîkmetê da anîbû ziman. Ev linka wê gotarê ye: (https://kadimhikmet.com/index.php/2020/06/28/berawirdkirina-destpeka-rojnamegeri-u-edebiyata-modern-a-kurdi-u-tirki/) Wek ê di agahîyên ku me di gotara xwe da dabû jî dê bê dîtin ku kovara Hawarê neçar mabû li derveyê welêt, li sirgûnê, li Şamê hatibû derxistin.

Bi saya vê kovarê, herfên latînî di nava neteweya kurd da, bi kêmanî li Bakur û Rojavayê Kurdistanê û diyasporaya kurdan berbelav bû. Bi pêşengî û destê alîkarîyê dirêjkirina Mîr Celadet Bedirxan a ji bo nivîskarên wek Cegerxwîn, Osman Sebrî, Qedrî Can, Nûredîn Zaza û hwd. (Hawar, 1998:17), ekolek ziman û edebiyata kurdî hatibû holê. Di vî warî da, M. Uzunî wiha nivîsîye: "Qedrîcan, yek ji şair û nivîskarên herî bi quwet ê mekteba "Hawar"ê bû." (Uzun, 2003:278) Qedrî Can nivîskarek berhemdar bû. Wek ku Firat Cewerî di Antolojîya Çîrokên Kurdî da nivîsîye: "Di Tîrmeha 1957an da li Moskovayê beşdarî mihrîcana ciwanên cîhanê bû.



Di dema yekbûna Sûriyê û Misirê da, ji Şamê rêvebiriya çalakîyên radyoya kurdî li Qahîrê kir." (Cewerî, 2018:53) Li ser rola Qedrî Can a di helbesta modern a kurdî da, Rênas Jiyan wiha nivîsîye: "Helbesta kurdî (…) bi navên wek Goran, Celadet Bedirxan û Qedrî Can ji xwe ra rêgehekê peyda dike û dest bi herikînê dike." (Jiyan, 2009:24)

Çîrokên Qedrî Can bi piranî cara ewil di kovara Hawarê da hatine belavkirin. Lê çend heb jî di kovarên Ronahî û Roja Nû da hatine belavkirin. Wek pirtûka çîrokan bi navê "Guneh", di sala 2007an da, çîrokên Qedrî Can hatin çapkirin. Çîroka yekem a bi navê "Hawar Hebe Gazî li Dû ye", di hejmara yekem a kovara Hawarê (1932) da hatîye belakirin. Sêwrandina vê çîrokê li ser du karakteran hatîye avakirin. Ev du kes jî wek bav û kur li ser rewşa xerab a welat diaxivin. Hawara neteweyî bo hêşyarkirina kurdan e. Bi pexşanê dest pê kiriye û bi helbestek sê çarîn qedîyaye. Di çîroka duyem da, dîsa banga neteweyî heye bo kovara "Hawar"ê (hejmar du) ku bi "Gundê Nûava" bi nav kiriye. Di çîroka sêyem a didaktik da, dersa hêza hevgirtinê tê dayîn. Bi navê "Bihara Dêrikê" ye.

Qedrî Can, wiha dest bi çîroka "Guneh" kiriye, "Carekê min di kitêbekê de xwendibû: 'Serhatiyên meriv çiqas kevnar be, di mejîyê meriv de ew qas şopên kûr dihêle…" Piştî vê daxuyanîyê li ser hev, di vê çîrokê û çîroka bi navê "Sond"ê da, bîranînên xwe yên zaroktîyê bi çavê zarokan vedibêje. Di çîroka "Rojên Derbasbûyî da jî gazincan ji roj, meh û salên zû derbas dibin wiha dike. "Roj, mah, sal… Çiqas zû derbas dibin." (Can, 2007:42) Êdî Qedrî Can bi çîroka "Serencam" û "Tayek Porê Spî" kemilîye, zimanek herêkbar bikar tîne. Lê dizane ku emrê çûye êdî nayê.



Bi pirsa, çima rûyê xwe tirş bikim? Wiha li xwe tê mikurê: "Min ji xortaniya xwe tu xêr nedît ku ji pîrbûna xwe bitirsim… Min şêraniya dinê tam nekir ku talbûna axiretê madê min tirş bike…" Can, 2007:52) Di "Hêva Çardeşevî" da, bi metaforan dagirbûna welat û bêkesîya kurdan vediguhêze. Di "Muhra Suleyman" da, welatê kurdan bi sînoran hatîye perçekirin. Ji Besrika zêrîn û Gulçînê bi şûn da, hinek mizah hinek rexneya berjewendparêzan û hwd. Di Nêçîra Berazan da hêmaya xewê hatîye bikar anîn. Bi awayekî din jîngehparêzî dertê pêş. Di çîroka Sehên Zozanan da, êdî seh wek lehengek çîrokê ye. Di dawîya pirtûkê da çîrokek folklorik, didaktik cih girtîye.

Çîrokên Îroyîn û Wek Mînak Çîrokên Mehmet Dicleyî

Mehmet Dicle, 43 salî ye, nivîskarek pir ciwan e. Lê wek ku wî jî di gotûbêja me da behs kiribû, hê di serdema xwendina zanîngehê da, bi hevalên xwe ra bi saya avakirina koma xwendinê û bi komî xwendina edebiyata kurdî û ya cîhanê, di vê temenê xwe yê ciwan da dest bi çîroknûsêyê dike. Hê di vî temenê xwe yê ciwan da, di asta navnetewî da hatîye naskirin. Li zanîngeha Krakowieyê kurdologa polonî Joanna Bochenskayê çîrokên wî wergerandîye zimanê polonî û pê ra hevpeyvînek berfireh kiriye.

Ez dixwazim bi kurtî li ser sêwrandin (fiction), afirandina karekteran, dünya an mekanê çîrokan, teşbih an teswîrên xurt û zimanê dewlemend rawestim.

Dema em li navê çîroka Leylanê bifikirin, em dibinin ku wateya navê çîrokê bi xwe bûye wek sîwanek ku hemû çîrokê digre nava xwe. Yanî hem wek melodîyek hemû çîrok bi ahenga dengan hatiye xemilandin hem jî wek serab, xewn, hêvî û têkçûn çîrok hatîye honandin. Wek ahenga dengan hevoka yekem, “Pîrê hewşa xwe avreşandî kir û hûrik hûrik paqij kir.” Dema em hevoka duyem dixwînin dizanin ku kur û keçên malê jî wek pelên darê bêwext ji hev qetîyane. “Ji xeynî çend pelên ku bêwext zer bûbûn û ji gulîyên xwe qetîyabûn tu tişt nekir ser çaroka (çîroka) xwe.” (Dicle, 2010:9)
Karakterên di çîrokên Dicleyî da, bi piranî kesên ji rêzê û jin in. Meriv dikare bibêje ku nivîskar çav bernedaye hêsanîya lehengên dîrokî û ji xwe ra ji kesên sade lehengan afirandîye. Wek pîra Hacer ku her xwedî li cih û mekanan (wek gora Hecî Resûl û ya keça xwe ya şervan) derdikeve.

Dema em li dünyaya (honandina) çîrokê dinêrin, dibinin ku gelek bi hêsanî (flashback) di wî sê rojên xwe da (bo vegotina çîrokê, sê roj demek pir dirêje ku em bi Ulyssesa Joyceî ya 24 saetî ra berawird bikin), geh bi hestîyar bûnê û geh jî bi rêya xewnan vegotîye. Hacer, 25 sal berê hevjîna şaredarê Asûsê, dîya sê kur û du keça ye. Kurê mezin Cemîl mamosteyek sirgûnî ye. Yê navîn ji ber feqîrîyê nikare bê. Yê piçûk bi pey keçek ewrûpî ketiye û ew jî edî hew tê. Keça mezin di şerê Kanîya Kewan da hatiye kuştin. Ya dinê tenê di xewan da dibîne. Sê rojên ku pîrê diçû ser girê zîyaretê, li ser rêya xwe Baqî, hevjîna wî Selma, Selîmê dikandar û Sewînê dîtîye. Heta roja dawîn a ku Sewînê dibêje Cemîl nayê, lê dê telefon bike jî hêvîya xwe wenda nake. Dîsa berê xwe dide girê zîyaretê û di bersiva Sewînê da wiha dibêje: “Kî dizane, belkî îsal jî Hesenê min were.”
Çend mînakên teşbîhî ev in: “… hewza biçûk a ku kevza wê rengê avê jî wekî hêvîyên wê bi hemû tonên keskayîyê dixemiland…”, “… perçikê esmanî ku di şibakên navbera apartmanan re wek destmaleke piçûk a gemarî …”, “… riya bajêr a ku li bin tava havînê wekî termê marekî kuştî bêlebat bû.”, “Awirên wê wekî çotek zarokên lawîn bi dû mînîbusê diketin, ji zuxirê navçeyê heta meydana çarşîyê baz didan.” (Dicle, 2010:15), “Sekinî (ew, pîra Hacer). Wekî dareke kevnare bi sedan zivistan dîtibe, kelekelên havînan derbas kiribe, bayên har qurtandibe. Pelên xwe weşandibe û mabe li benda zivistaneke reş a din.”

Encam

*Meriv dikare bibêje ku temaya çîrokên Qedrî Canî bîranînên bi êş ên jîyana wî ne. Lê di bîranînên xwe yên zaroktîyê da serkeftîye, ji ber ku bi çavên zarokek nivîsîye.
*Mehmet Dicle di her sê pirtûkên xwe, Asûs, Nara û Tayê da navçeyek edebî bi navê Asûs afirandîye. Taybetîya herî mezin a çîrokên wî ew e ku bi teşbih û tevgera objeyan; tiştên razber ên wek hest û xeyalan şênber dike.

Çavkanî

Can, Qedrî, Guneh, Weşanên Lîs, Amed 2007
Cewerî, Firat, Antolojîya Çîrokên Kurdî, Bergê 1ê, Weşanên Avesta, Stenbol 2018
Dicle, Mehmet, Nara, Weşanên Avesta, Stenbol 2010
Hawar, Kovar, Bergê 1ê, Weşanên Nûdem, Stockholm 1998
Jiyan, Rênas, Qedrî Can Hemû Berhemên Wî, Weşanên Belkî,Amed 2009
Uzun, Mehmed, Antolojîya Edebîyata Kurdî, Weşanên Aram, Stenbol 2003
Çavkanîyên Elektronîk
https://kadimhikmet.com/index.php/2020/06/28/berawirdkirina-destpeka-rojnamegeri-u-edebiyata-modern-a-kurdi-u-tirki/
http://www.kurdishstudies.pl/?ku_pirt%C3%BBka-mehmet-dicley%C3%AE-bi-polon%C3%AE%2C172

Ahmed KANÎ (edîtorê malpera www.rojnameyakurdistan.com)
e-mail: ahmedkani21@gmail.com

Qedera Hevpar



AYHAN ERKMEN

Cihe ku êw bi xemgînî jê veqetiya bû, ya din bi barê xeman hatibû û turikê xwe lê danî bû.. Ji duwal û demên cûda bûn, lê qedera wan a hevpar; Êzdiyatî, ferman, koçberî û mişextiyê, riya wan li heman derê li hev anîbû; Gundê Qorixê yê ku, Helbestvan Asya Xerzan, ji heft saliya xwe de, jê bêçare veqetiya bû, niha rawestgeha dayika Naam a di 70 saliya xwe de ji ber fermanê revîyabû.

Dema ku min di têlefonê de ji Asyayê re mijara serdaniya gundê wan parîve kir; gelekî şa bû, ji bextewariyê, qasekî devê wê negeriya ku, ka wê çi bigota; peyre ji bo em avên wan vexwin navên kaniyên gund hemû ji carekê ve pey hev rêz kir û got " Ji bîr nekin bi çavê min li çiyayê Gago têr mêzekin" û " ji bo min, ji gund, hema tiştekî biavêjin çemê li bintara gund" ev wisa bi dil û can û bi hesreteke mezin got ku, qey çemê li Qorixê, wê ew tişta bibira rojhilatê almanyayê û ragihan da wê, dilê min jan da .

Ez ji xwe zanim, kesên ku li gund çavên xwe li jiyanê vekirine, ji gund veqetin jî, ruhên wan tu car ji gund venaqete, gund li du xwe nahêle, li wir dimîne. Di xewnên herî bextewar de jî tim ew gund heye. Dixweze bila ew kes, ji hezaran kîlometreyan dûr, bajarekî herî depdebe û di nav zêr û zîvan de be jî. Ev xewn, xewna hemû serên, li ser balgiyên xerîbiyê ye. Îja dema mişext bî, tofan ew tofan e, zilma li ser yên pey te, xewên te direvînin, xewnên te diherimînin.
Qorixa ku li ber dilê Asyayê 'xas baxçeyê' welatê wê bû, heyanî sala 2014an, ji xêncî malbatekê tu kes lê namîne . Ew avahiyê wan ê ku dê û bavê wê heriya kerpiçen wê bi xwe hasilandibûn û ser wê bi darên sipîndar û zîlên gurgurê avakiribûn û bi rengê penbe boyaxkiribûn, cih cih hilweşiyabû, heznitiya çûyîna wan dikişand.
Bi avakirina wargeha penaberên Şengalî re, ji salan şûnde, liv û tevgereke şermoke, sar û sêwî li Qorixê belav bibû. Ev der ji bo çûyîna avrûpayê, ji Şengaliyan re rawestgeh bû. Li vir hin kes şeş sal bûn di bin çadirên naylon de diman. Dayika Naam a heftê sali û fîstanekî sipiyî Êzdiyatiyê lê , bi laçik û porê sipî, rûyê qerqaş û dêmên toptopik, dişibiya melayketan. Dema ku min jê re got ;
'Dayê ev rêwîtî ji bo te ne zehmet e'
Qey hêsrên wê benda min bûn, mîna lêhîyê kişiyan. Ax! dayika min a dil birîn, agir berda dilê min. Ji aliyekî ve giriya, ji alî din ve jî bi axîn û keser behsa mayiyan kir; gora hevjînê xwe, heşt zarên xwe û xwîşk û birayên xwe... Dema ku kurê wî yê biçûk dertê ser rê, cîgera dê teyax nade, dide dû, tê van deran.



www.qamislivakurdi.org

Roja em çûn gund, şêniyên wargehê xemgîn bûn. Ji wan heşt malbat rêwiyên Avustralya yê bûn. Yên diçûn şabûneke şermoke dijiyan. Xwîşk, bira û cîran dû xwe dihîştin, kê çi zanibû, dibe kû cardin ji hev qet nedîtana. Di fermanên berîn de kiribûn tecrûbe ‘vegera van çûyîna qet çênebibû’ ev ê jî çênebûya. Bi xatirxwestinê çiya dahatin xarê. Xwedê nîşanî kevira nede. Ruhên xwe hildabûn kulma xwe û danîbûn zîyaretên xwe, gundên xwe.

Gelo nifşeke ji fermanan filitî wê qet tunebûya ? Ev xezeba dinê wê tim serê wan bûya?
Dema bayê trawmayê ku mirov xist, ji mirinê bireve û li ku de here jî, tû xêrê nabîne, bextewar nabe. Şahidiya Asyayê ye ku digot ‘ Min dît lê bila tu kes nebîne, dilê dayika bibû kevir.’ dengê kiziniya dilê wê bû.

Di çîrokeke de digot, li asîman, bi serê her kesî stêrkek heye. Lê stêrkên Êzdiyan ‘keçên jinbavê’ ne. Di bin vî asimanê bê sînor de, bê cih û war in.
Bayê herî biçûk, dibe bahoz li ser serê wan. Geh li vî alî û geh jî wî alî.
Dema ku xerîbiyê, ewrên reş û tarî berhevî ser serê mirov kir û behn lê çikand, dil dixweze ku ‘ wek teyrekî Tawus li ser çiyayê Şengalê bigere’ lê balefiran bênavber, wisa zilm barandine ku ji asîmanê Şengalê, Teyrên Tawus nikarin ji cihê çûyî vegerin.
Êzdiyên ku ji neçar li xeribiyê mane. Ancax bi koça dawî vedigerin axa xwe. Dema dimirin, hezkiriyên wan, ji bo ruhên wan bigihîjin mirazên xwe, wan tînin gundê xwe. Helbesta Asyayê wek wasiyeta vê koçadawîn e.
“...
Di berbanga şefaqê de
Bi dengê Eyşana Elî
Min, ber bi axa sor û goristana Zarokên bênav rêwî kin.”

Helbest ji pirtûka Asya Xerzan a bi navê ‘Dengê Bêdengiyê’
Gundê Qorıxê: girêdayî Bişêriyê ye.



Helbest: George Trakl

Wergera ji Elmanî: Ciwan Qado

Bêdengî

Şivanan rok li dehl û baxên rût binax kirin.

Di toreka ji mû de masîgirekî heyv ji gola qeşagirtî kişand.

Di kirîstala şîn de insanê spîçolkî dijî, hinarkên xwe spartine stêrka xwe yan serî di xeweka benefşî de diçimîne.

Belam timî pîrozbahîya gulên şîn û firîna teyran a reş hinavê bînerê xwe dihejîne, bînerê di bêdengîya jibîrbûyî û vemirî ya milyaketan de diponije.

Careka din enî di zinarê berbiheyv de şevbuhêrka xwe diqedîne û

di kufnika reş û payîzê de jî fenanî ciwaneka biriqandî tecela dibe xwişk.

Rok

Her roj di ser gir re tê, roka zer.

Bedew e daristan, heywanê tarî,

însan jî, nêçîrvan yan şivan e.

Di gola kesk a avê de sor î mor ber bi jor de tên, masî.

Li bin kunbeda esman jî masîgir bê deng di qeyika şîn de bi rê dikeve.

Hêdî hêdî, goşî û zad digihên

Ku hedana rojê nêzîk dibe xêr û xirabî radibin ser pêyan,

û ku şev tê, bêdeng, rêwî palikên çavên xwe yên giran vedike, rok jî di gelîyeka tarî de perçe werçe dibe.

Payîz

Gulên berbero li ser sêncê diçirisin

Va li bin tîrêjên rokê dilxweş rûdinên, nesax.

Jin jî westiyayî di nav zevîyan de distirên.

Lê didin zingilê dêran

pê re lê didin.

Ji dûr ve çivîk çîrokan dibêjin

Lê didin zingilê dêran

pê re lê didin

Ji hewşê, nazik û sivik dengê kemanê tê.

Îro şeraba qemer diguvêşin.

Ha li vir Meriv şad û dilniya ne

Îro şeraba qemer diguvêşin.

Li piştê vekirîne hucreyên mirîyan, yên ciwan û bedew bi tîrêjên rojê xemilandî.

George Trakl

Roja 3yê şibata sala 1887an li bajarê Salzburga Awistiryayî ji dayik bûye, bavê wî bazirganê hesin bû. Ji eslê 7 zarokan George zarokê 5 e di rêza malbatê de. Û ji ber ku dêya wan Maria Catharina bengî narkotîkê bû, perwerdekareka fransizî bi navê "Marie Boring" barê xwedîkirina wan hilgirt ser milên xwe û bi rêya wê George wêjeya fransizî nas dike nemaze " Arthur Rimbaud û Charles Baudelaire. 3 yê çiriya paşî George ji ber gelek êş, cefa û azarên malbatî û derûnî jiyana xwe bi cureyeka Kokainê ya giran bi dawî tîne.

Ew yek ji girîngtirîn simbolên expressionisma Awistiryayî ye û helbestên wî, yên bi êş û mitalan mişt û dagirtî, heya roja me ya îro jî ji hêla hezkerên helbest û wêjeyê ve têne xwendin.

www.arsivakurdi.org

Salihê Biro behsa Gilîdaxê dike



Nihat Gültekin

Îsal li ser Serhildana Gilîdaxê 94 sal derbas bûye. Serhildana Agirî, di nav serhîldanên kurdan de bi gelek alîyên xwe va xwedî taybetîyên cûda ye. Heta niha gelek xebatên kitêba, xêbatên lêkolînê, nivîsên kêrhatî û gelek tiştên din li ser vê serîhildanê hatîne nivîsîn. Gelek dengbêjan jî kilamên ser şerê Agirîye afirandine û heta îro di nav gel de hatîye guhdarîkirine. Alîyê din jî xebatên dîroka devkî gelek kêm hatine tomarkirin, qeydkirin. Bîranînen gelek şehsîyetên tev lê serîhildanê bûne negihîştine ciwatê. Di wan mijaran de gelek xebat bihatana çêkirinê, ez bawer im gelek bûyer yê ronahî bidîta.

Ji bona wan sedeman û hinek sedemên din derheqe serîhildana Gilîdaxê gor giranîbûna wê kêm agahî hene an jî zêde agahî nîne. Li vir şûnda ew xebatên em behsa wan dikin nabin, pêk nayê. Nizanim gelek kurd bûn parlementer, salan di meclîsê de xebat meşandin. Tu yekê di arşîvên dewletê de xebatêkê li ser wê babetê nekir. Di arşîvan de gelek dokuman, vesîka û belge dernexistin. Mirov carna difikire wiha here deh, panzdeh sal şûnda di nava piranîya nifşên nû de wê serîhildana taybet kêm kes agahdar nabin. An jî ew serhildan zêde bala wan nifşên nû nakşîne.

Piştî têkçûna Serhildana Şêx Seîd dewlet gelek eşîr û keseyetên giranbûha xwest sirgûn bike. Ji ber vê bîryarê gelek kes wek Numan Efendi li Serhedê sirgûn bibûn. Dema bîryara sirgûnkirina Brahîm Axa derket rewşa wî û bajare Bazîdê hat guhartin. Brahîm Axa dema agahdar dibe yê wî jî sirgun bikin, berê xwe dide Çîyayê Agirî. Pêşengtîya Biroyê Heskê Telî li Çiyayê Agirî gelek kes dicivin û serîhildan dest pê dike. Di wan dema de Kurdên der dora Çiyayê Agirî di nava serhildanê de cîh girtin û piştgirîya şer kirin. Serîhildan gelek salên dirêj domand. Heta sala 1927'an bi pêşengtîya Biroyê Heskê Telî şer berdewam dike. Sala 1927'a şûndatir rêxistina Xoybûnê serokatîya şer hildide destê xwe. Wek tê zanînê rêxistina Xoybûnê, di nav rêxistinên kurdan de yê neteweyî û yekgirtîye ye. Partiya Xoybûnê di sala 1927'an de li bajarekê Lubnanê ji alîyê parek rewşenbîr û siyasetvanên Kurdan ve hatibûn avakirin. Ku hîmdarên wê kesayetiyên navdar wekî Celalet Bedirxan, Kamiran Bedirxan, Memduh Selîm Beg, Şahîn Beg, Îhsan Nûrî Paşa û hwd…

Di sala 1927'an de İhsan Nurî Paşa wek serok tê wazîfekirin û ber bi Agirîyê tevî komek hevalên xwe derdikeve rê. Gelek kesên din wek Mendûh Selîm jî di komeleyê de ji bo şerê Agirîyê kar dikin. Dema İhsan Nurî Paşa tê digihêje çîyayê Agirî rewşa şer jî tê guhartinê. Tanzîmkirina artêşa serhildêran, rojneme derxistin, ala Kurdistanê ba kirin hemû di wan çaxa de pêk tê. Gelek sîyasetmedar, rewşenbîr, welatperwer di qada şer de derdikevine pêş. Gelek caran, gelek cihên cûda artêşa Tirk re şer çêdibe. Artêşa tirk bi hezaran leşkeran va êrîş dibe ser şervanên Agirîyê lê zêde ser nakeve. Gelek caran bêencam şûnde vedigere.

Dewlet di salên 1928-29'an de name Biro, Nûman Efendî re dişîne û ewana jî bersîv didine wana. Heta dawîya sala 1929'an serhildêr gelek alîyan va xwedîyê qewetekê mezin in. Gelek gund, navçe û bajaran bûyer çêdikin û gelek deng vedidin. Di van salan de her wisa jî gelek desteyên kurd hebûn ku zora dijmin dibirin. Ewana gelek leşker û zabitan jî dikujin. Navê desteyan di çavkaniyên tirkî de jî derbas dibin.

Di wan deman de gelek kurdên mêrxas di vê serhildanê de rolekê girîng dilîzin. Îro navê wan di rûpelên dîrokê de neqişkirî hatîye nivîsandinê. Wek mînak Birahîm Axa, İhsan Nurî Paşa, Ferzende Beg, Nûman Efendî, Xalis Beg, Emerê Besê, Edoyê Azîzî, Şêx Zahir ji van kurdan çend heb in. Ji wan û gelek kesên din di vê serhildanê de canê xwe ji dest dan.

Di sala 1930'î de komkujîya Gelîyê Zîlan Erdîşa Wanê pêk hatibû. Rêveberîya şer, kurên Huseyîn Paşa Nadir Beg, Mehmet Beg, Seyîd Resul şandin Geliyê Zîlan. Ewana Erdîşê dorpêç dikin. Piştî pevçûnên dirêj neçar dimînin û derbasî Îranê dibin. Li ser vê yekê Fermandar Dewrêş Beg bi hezaran eskera va Geliyê Zîlanê dorpêç dike. Gundên wek Hesanabdal, Eks, Şahbazar, Tendurek, Çaxirbeg, Xarhus, Babazeng, Komir, Şor, Şorîk, Murşût, Mescit, Kunduk, Zorava, Milk, Yekmal, Kîlîse, Gosk, Partaşa Jêrîn, Partaşa Jorîn, Bunîzlî, Pertax, Kerx, Soxitlî, Mixare, Kardogan, Kelle, Hostekar, Kizilkilise, Ziyaret, Hiraşen, Gomik, Şeytanava, Bîrhan û gelek gundên din tên şewitandin. Dest didine ser mal milkên gundiyan. Bi hezaran kesa bi tifingên makineyî va bi hev re dikujin. Gundiyên ku sax mabûn jî sirgun dikin. Gundiyên ku di bin cinazeyan de sax dimînin, an jî yê direvin bi salan qaçax dijîyan.

Piştî gelek gund tên şewitandin, bi hezaran kesên sivîl tên kuştin. Gelek kesên serhildêr tê kuştinê, serê wan jê dikin, dibin navenda Erdîşê. Bi armanca çavtirsandinê nîşanî şêniyê Erdîşê dikin. Piştî komkujîya Gelîyê Zîlan êrîşên li ser gelê kurd, taybetî yên Erdişê û derdora wî her çûye zêdetir bûne. Mirov dilrihetî dikare destnîşan bike ku hemû kurdan di cih û warên xwe de ji van lêdan û êrîşên dewletê nesîbe xwe wergirtiye. Herema Zîlanê 20 salan dibe herema qedexe. Di wê komkujîyê şûndatir êdî serhildêr dizanibûn sernakevin, dewletê têk nabin. Lê heta dawîye bîryara berxwedanê digirin.

Bûyera Geliyê Zîlan di 16'ê tîrmeha 1930an de ji hêla rojnameya dewletê Cumhuriyetê ve wiha hatibâ nivîsandin; "Gundiyên ku alîkariya eşkiyayan kirin bi temamî hatin şewitandin û sewqî Erdîşê kirin û li vir hatin bi cih kirin. Hejmara eşkiyayên ku tevgera Zîlanê hatine îmha kirin ji 15 hezarî zêde ne. Tenê ji hêla mufrezeyekê hezar kes hatin kuştin. 5 şakiyên li Geliyê Zîlan asteng bûyîn rades bûn. Li vir herb bi şêweyekî sehm hatiye kirin û geliyê Zîlan bi cesedan tijî bûye."

Ligel van nivîsên Rojnameya Cumhuriyetê heta îro şahidên bûyerê jî hene. Şahidên ku ji bûyerê rizgar bûn, diyar kir ku bi hezaran kesên hatine kuştin gundiyên ku tu eleqeya wan bi bûyerê re tune ne. Min gelek caran şahidên komkujiya Geliyê Zîlanê re hevpeyvîn çêkirîbû. Di komkujî dîroka Tîrmeha 1930'an de Tahir Nas wê demê 11-12 salî bû. Diyar dike ku di nava cinaza de du gula va birîndar dibe. Xwe vedişêre bi saya vê yekê ji kuştinê rizgar bûye. Berîya xatir xwestina dinya ronik ya Tahir Nas, li navçeya Erdîşa Wanê ikamet dikir. Dema ez diçûm cem wî, bîr dixist ku ew tu caran van bûyeran ji bîr nekirîye. Şahidê bi navê Abdulbakî Çelebî ku dema leşkeran gundî kom kiribûn, li vir bi malbata xwe re direve. Dîyar dike ku, dewletê mirovên gelek gundan berhev kirîbû û şenîyê gundan kuştibûn. Mîrze Akmazê (88) ku di bin cinazan de mabû û rizgar bûbû da zanîn ku ji malbata wî 4 kes hatibûn kuştin û çend kesên bin cinazan sax derketibûn hene.

Bîranînên şahidê Serhildana Agirî Fesîh Kaya yê li Navçeye Mîlazgirê ya Mûşê piştî mirina wî 20 sal şûnda derketibû holê. Piştî Kaya vedigere Tirkiyeyê bi salan girtîgehê de dimîne û sala 1990'an li Mîlazgirê jiyana xwe jî ji dest dide. Kaya, di bîranînên xwe de bal dikşîne ser Serhildana Agirî: "Di sala 1930an li şerqê komkujî pêk dihat. Kurd li Agiriyê di nava tunebê de bûn.

Lê dîsa bi dewletê re şer dikirin. Edalet û hiqûqa şer tune bû. Li Geliye Zîlan sê hezar zarok dan ber guleyan. Li Şerqê sê Mufetişan li Wan, Erzirom û Amedê serdestî dikir. Li her derê îstixbarata xwe pêş xistibû. Dixwestin hemû gelê şerqê bikin dujminê hev. Hewl didan eşîran bi hev bindin şerkirin. Ên nedibûn hevkarê dewletê neçar diman direviyan çiya. Em jî neçar man û me xwe avêt çiya. Dema ez firar bûm, ez li Deşta Mûşê, li Erzirom, Agirî, Êlih, Mêrdîn, Amed û gelek deverên din geriyam û me bi leşkeran re şer kir. Piştre ez derbasî Sûriyeyê bûm û demek dirêj li Sûriyeyê mam."

Heta sala 1932'an şer berdewam dike û dawî dibe. Di nav bûyerên rojên buhurî, wan rojên tirajîk e dijwer, rojên serbilindiyê, ku dîroka me da bûne efsena welatparêzîyê û berxwedanê. Divê hemû kurd wana her tim bîr bînin. Salihê Biro li hela Serhedê, dengbêjek bi navûdeng bû. Silgî serê dengbêjên wek Salihê biro, kilamên dengbêjan li bajar û gundên derdorên Agirî û Gelîyê Zîlan de bûyer her di binhişe merivan de ma. Dema meriv li wan kilaman guhdarî dike, bi rastî porê serê meriv gijgijî dibe. Gelek dengbêjan bi kilamên mijarên Agirî û Gelîyê Zîlan hewar, gilî gazîne Kurdên herêmê anîne ziman.

Yılmaz Çamlibel li ser Serhildana Agiriyê ji xortaniya xwe ve bi meraq xebatên berhevkarîyê kirîye. Ji kesên wan salan jîyane, derheqe Serhildanê pirs pirsîye, bîranîn guhdarî kirîye. Dokument û belge civandine. Divê em wan bîranîna yek deqe bifikirin û xwe re wê pirsê bipirsin, ew bîranîn ji bo jîyana me tê ci wateyê?. Em niha hevpeyvîna nivîskare qedirgiran Yılmaz Çamlıbel 50- 60 sal berê Salihê Biro re kirîye, guhdarî bikin;

" Min di xortaniya xwe da çerçitî dikir. Her şev di gundekî da dimam. De tu jî dizanî, du gundan da sînema tune bû, taytore tune bû. Milet wê wextê xwe çawa derbas bikira? Gundî di odekê da dicivîyan. Heta nîvê şevê, dengbêjan stranan digotin, cimaet jî guhdarî dikir. Kêfa min ji dengbêja ra gelek dihat. De meraqa min jî hebû. Min hêdî hêdî stranan ezber dikir.

De ez kê bêjim, kê nebêjim. Bi sedan dengbêj hebûn. Min bi dil û can wan dengbêjan guhdarî dikir. Ewana gelek stran li ser şerê Gilîdaxê digotin. Behsa Biroyê Hesikê Têlî, Ferzende, Keremê Qolaxasî, Îhsan Nûrî Paşa, Simko, Xalis Begê, Evdilmecîd Begê, Şêx Zahar, Kor Hûsên Paşa, Seyîdxan dikirin. Behsa mêrxasîya wana dikirin. Çawa şerkirine, çawa berdane Romê, ça hatine kuştin. Hemûşka yek û yek digotin. Him stranan digotin, him jî qala şerê Gilîdaxê dikirin.

Ez jî wan gelek tişt hînbûm. Gava min wan kilaman digot, Bazîdîyên me ji min ra digotin;"Kuro, tu dîn î? Cunî yî? Ger hukumet bibhîze tu van kilaman dibêjî, wê serê te jêkin. Tu nabînî, zabitê Romê bê pirs û bê sûwal mirova dardadikin."



Min jî ji tirsa, wan kilaman ne got. Wextek min nihêrî, ku min wan kilaman jibîr kirîye. Erê wele, tê ji bîr kirinê bavo. Em bêjin, hafizek, çend sal Quran nexwîne, ne Quranê pûç dike. Yê min jî wusa bû.

De tu ji dizanî. Me ji Îsmet Paşa, ji Xelq partîsîyê zehf kişandîye. Hinek dengbêj li ser wê zûlmê jî, gelek stran digotin. Di yekî da wuha dihate gotinê;
Ev çi zulm e, çi buhatî ye
Îdî em bêzar û ziman in
Qanûna Îsmetê Kerr hatîye.

Bi serê Xalo Şame kim(bavê nivîskar Y.Çamlibel), egîd û mêrxasên Gilîdaxê, li tu dewrê da nehatine dinyayê. 10-15 merîyê Biro, berdidane alaya Bazîdê. Eskeran, top û tiving û cebirxanên xwe diavêtin, direvîyan. Eger Simko û eşîrên Celalîya alîkarîya Biro bikirana, bi serê Hezretî Xanî, Rom bi Biro nedikarî.

De bavo! Di nav me da tifaq tune ne. Sorî li alîyekî dikişîne, Qotî li alîyek din. Yek li vî alî dikişîne, yek alîyek dinê. De emê ça heqê xwe ji Romê bistînin? Hêvîya me ew e, ku efendîyên wekî te, ji me ra rêyekî bibînin. Me ji vê zulmê xilaskin.

Ezê ji te ra tenê du kilamên ku li ser Îhsan Nûrî Paşa, Biro Hesikê Têlî, Xalis Beg, Ferzende hatibû gotin, bistirêm. Kilamek dirêj e. Lê pir heyf, ez nikarim serdanpê ji te re bêjim; bila rehma Xwedê li wan mêrxas û egîdên Kurda be. Şehîdên Gilîdaxê bila cinetmekan bin. Bila hevalên Ehmedê

Xanî bin, înşela.”

Îhsan Nûrî Paşa dinhêre bi dûrbînê,
Li Erdîşê, li Gola Wanê.
Leşkerê Romê tuneye li meydanê.
Ji teyaran bombe dibare
Li ser egîtên Kurdistanê.
Biroyê Hesê kire gazî,
Got, hûn ne mêr in, ne camêr in.
Dijminî bêbextî nîn e
Şer karê egit û mêran e
Wek mêran derkevin meydanê
Bila dinya temaşeke
Ka kê berx e, kê beran e.

Di strana dinê da jî wisa dihate gotin.

Şerek li me qewimî
Li deşta Kanîkorkê, bê eman e
Li kozika milê çepê da
Ferzendeyê çar gurçik e.
Di destî da eynalî ye.
Di milê rastê da Şêx Resûl e.
Di ortê da Xalis Begê Sipkî ye.
Di dû wan da, êl û eşîrên Celalî ne.
Nûrî Paşa digot;
Birano lêxin, bixebitin
Ev welatê kal û bavan e
Pêş da herin, nedin eman
B ihevra rabin li ser pîyan
Êrîş bikin wekê guran
Yan Kurdistan, yan neman.

Çavkanî:

Yılmaz Çamlibel- Gilîdax Bêxwedî Nîn e, Serhildana Çîyayê Agirîyê Weşanxana Nûbihar
Şahidên Gelîyê Zîlan re hevpeyvîn- Arşîva min
Arşîva rojnama Cumhurîyetê
http://ararat-welat.blogspot.com/2010/11/biraninen-sahide-2-serhildanan-pisti-20.html





HECÎ EHMED BÊRKİYATÎ

Biryar

Ramana wê birîne
Zû xwe tênewerîne
Baş xwe tê bihizrîne
Gelo jîn pir şirîn e
Biryar dibe serwerî
Ger ji rê derbikevî
Me jê heye bawerî
Bi şaşiyan sernakevî
Divê kar bikin bişyarî
Bi hev ra helgirin vî barî
Rastiyê bêxine karî
Ji bo belengaz û heĵarî.

www.arsivakurdi.org

Evîna Pîrê

Dilbirîn Dilo

Dîsa vî bêbavî nehat, tim û tim wisa dereng dimîne. Belqitiyo ma tu nizanî ez nikarim bi hêsanî derêm der. Ger kekê min,min li vir bibînin wê min bikujin. Ji xwe min ji diya xwe re jî got diçim mala meta xwe Gulîzar. Heke pê bihese neçûme wir dê min rezîl û ruswa bike.

Bû seet û nîv e ku ev pîrê li vir e, li gora ku li der dora xwe dinêre li benda yekê ye. Lê mirov ji axaftina wê fêm nake, xeberên mîna xeberên keçikên nûgihîştî ji devê wê diherikin nav atmosfera gerdûnê.

Hinek bi heyyirî hinek jî bi miraq nêzê wê bûm û min jê pirsî :
-Xaltî tu li benda kê yî?
– Xaltî diya te ye qeşmer! Tu şerm nakî ji keçikek ciwanik re dibêjî xaltî ?Çi ji te re li benda kê me, zûka ji min dûr bikeve niha Kazîm bê wê şaş fêm bike!
-Temmam nabêjim xaltî,Kazîm ki ye?

Bi dengek lorgozî û bi kenek fefiyok xwe hêjand û got;
-Delalê min e.

Ez heyyirî bûm lê heyirîna min zêdetir bûbû,vê jinika 70-80 salî ji xwe re digo ciwanik im, di ser de jî ji xwe re xoşewistek çêkiribû. Ez vegeriyam cîyê xwe û li ser rewşa wê fikirîm gelo ev jinik çawa dibe ji xwe re xoşewist çêkiriye. Bi tirs û kelecanî ye jî ha. Ji hêcanê dikir qelbê wê bisekiniya. Wê bi piste pist bi ber xwe ve xeber dida û bi rast û çep diçû dihat.

Wê pîrê di halê xwe de ,ez jî di heyr û metelîya xwe de mabûm. Êdî ji min re bûbû miraq heta min xoşewistê wê nedîta ezê ji wir neçûma bi derek ve. Kêliyek di dûvre du ciwanên lihevhatî û li ser xwe hatin wir, ketin bi piyên pîrê xwestin wê bibin. Pîrê hinek li ber xwe da çêrê wan herdu xortan da. Wan herdu xortan jê re lava dikirin da ku bi wan re biçe mal.

Êdî ez jî li ba wan bûm min pirsî ;
– Xêr e keko hûn çi ji vê pîrê dixwazin ?
Ji wan yê bi simbêlbizin bersiv da;
– Bira ,ev diya me ye, bû sê sal e bavê me rehmet kiriye,bû du sal jî diya me bi êşa alzheimerî ketiye me kesê nas nake,zen dike ku hêna keçikek 17-18 salî ye û tenê navê bavê me zane.

Pişti vê hevpeyvînê herdu zilaman diya xwe girtin û bi hêla erbeya ku li benda wan sekiniye ve çûn.
Pîrê hêna jî gef dixwarin ew tehdît dikir;

-Heke Kazîm bê dê teneke bi pey qûna diya we ve bike,hûn çawa min direvînin,Kazîîîîîm, Kazoooo tu li ku yî bêbavo delala te direvînin.





Gernas Roderîn

LI XEWLEGEHÊN BAJARÊ MIN

Li paytexta parzemîna dîlbûyiyan
Xewlegehên ku di hembêza bajarokan de bînçikiyayî bûne
Bi hostehiya çêkerên kevnebajaran
Şeh dikim kelemkortiyên dîwaran
Bi ser de jî dinexşînim bi tabloyên
Ku ji şewatên şerrûdan mane
Di rewneqiya keskesoreke nûderketî de
Diteyise zerketava berbeyana dilketiyên vî bajarî
Di ekla cûreçêjên metbexên bijarte de dijîm
Qîz û keçmalan hevdû xwar in li ser nesîbekî fireh
Xort dilikumin li serê du-sê gavan
Li binê şaneşînan
Bila olana çakûçê heddadan
Şehdeyiyê bikin bi sê telaqên bêfitû
Dinya weke hilma mîhekê ye
Bihar sergovenda werzeyan dikişîne ev çend roj
Xweza ciwanmêr e ji mêvanên bi qedir re
Çogvedana cotkaran bê sûd e li ber ziyaretan
Baran nazdar e îsal
Ez û mayindeyên xewlegehên xwe dikesidin roj bi roj
Di nava sûravka jehrdadayî
Û dikesixim ji şaxên dara hewşa agirdadayî
Gefxwarinên min yê ji bo taloyan bê sûd in
Ji ber ku şewata min û tabloyan li qada bêbextan tê wênandin.

www.arsivakurd.org

ŞÊRDÛPİŞK

METÎN ARÎ

Bi hezaran darên hêşîn û xweşik, ku ji bilindbûna wan daran ezman xûyanabe.Darên cûrbecûr bi sedan rengên ji hev cûda li ser piyan e.Darên ku ji hemiyan zêdetir û bilindtir darên mazî û ê berûyan in. Cî cî jî darên gorîj,bitim,belalok,dirik,hejîr,gûz,tirî,kar çîn û beîvên çiyayî.Daristanekê delal, navbeyna daristanê de du rûbarê ji hev mezintir; ku her şaxê wê ji nava zinaran derdiketa û jiyan dida heywan û dar û dartam û jiyana daristanê.

Çiyayên herî mezin û deştên serî heye binî tine derdora daristanê dixemlandin.Nava vê daristanê de golê mezin û kevnar gelek pir hebûn ;nava van gola de masiyê delal û xweşik hebûne.Ev daristan ji behrê mezin dûr bûye ji ber vê demsalên havînê pir germ û ê zivistanê jî pir dijwar û serma derbas dibûne..

Bi her navê heywan vê daristanê de dijiyan,lê henek heywan hebûn ku tenê vê daristanê de dijiyan.Heywanekê ku alekê wî şêr alekê wî jî dûpişk dijiya nava vê daristanê de . Ji ber vê navê daristana xwe jî xistibûn daristana şêrdûpişkan.Nava daristana xwe de bi dilxweşî û aramî jiyana xwe didomandin.Heya ku nava zinaran de heywanekî ku alekê wî sixûr alekê wî mar kete nava jiyana wan û jiyana wan herimand.Navê vî heywanê sîxûrmar bû.Heywanên derdora daristanê hemî ji vî heywanê zehf ditirsiyan;lewra ev heywan bi xwîn û mejiyê ferxikê heywanan jiyanê de dima. Demekê kin de bû serokê hemî heywanan.

Şêrdûpişk, nava daristanê de nêçir dikirin û ji rûbara jî masiyan digirtin bi vîrewşê jiyana xwe yê rojane didomandin.Carînan navbera xwe de derheqê dîrok û erdnigariya xwe de jî mijûl dibûn. Sîxûrmar, her roj xwîna heft ferxikê heywanan dirêta û mejiyê wan dixwara..Daristanê de aramî û dilxweşî nemabû; derdor hemî bibû şûna şîn û dilêşiyê.Henekê şêrdûpişk ji vê rewşê neqayîlbûna xwe dianîn ziman .Şêrdûpişk kengê rabûna ser piyan her tim alê wan ê dûpişk paş ve bi wan ve dida û wan dikûşta.

Zivistan xilas dibû demsal berê xwe dida biharê, dartam nû nû hêşin dibûna, derdor zehf xweş dibû; lê dilşewata şêrdûpişkan berdewam dikira.Şêrdûpişkekî zer hebû û ji vê rewşa xirab zehf aciz dibû lewra her roj ferxikekî wî jê distandin û dibiran ji bo xwarin û vexwarina sîxûrmarê. Mabûn du ferxikê vî şêrdûpişkê zer, alîkarên sîxûrmar hatibûn ku ferxikekê wî jî jê bistînin.

Ew roj şêrdûpişkê zer, xwe xiste şûna ferxika xwe û berê xwe da şikefta sîxûrmar .Sîxûrmar xwe amade dikira kumejiyê ferxikê şêrdûpişkê bixwe lê şêrdûpişk serê xwe hilda û bi hemî hêza xwe ve ewil marên ser sîxûrmarê kûşt û sîxurmarê bêhêz kir û lê da lê kûşt . Bi mêrxwasiya şêrdûpişkê zer îdî jiyanekê nû ji bo şêrdûpişkan dest pê dikira.Şêrdûpişk ji sîxûrmarê xilas bibûn; lê derdora wan de gur û rovî mabûn. Pêwîstî hebû ku şêrdûpişk, haja fenê rovî û haja harbûna gurê şiyar bibûyana û yekitiya xwe qayîm bikirana..

Şêrdûpişk ji jiyanê tiştekî zêde nedixwastin. Tenê bi dilxweşî û bi arami nava daristana xwe de jiyanekê azad dixwestin.

Hemedê Qutikspî

Amed Çeko Jiyan

Hemed wekî hemû rojan di kaziba sibê de bi alarma telefona xwe ji xewa şîrîn hişyar bû. Ji bo ku dengê alarmê hevjîna wî ya ku hê sê meh di ser daweta wan re derbas nebûne ji xew raneke, destê xwe bi lez avêt telefonê û bi wê eceleyê ji dêvla ku alarmê bigire alarm taloq kir û pê re jî telefona ku gelek caran ji destê wî ketibû û ekrana wê tije derz bû, dîsa ji destê wî ket û bişkoka kêmkirina dengî ya li kêlekê ji ciyê xwe pekiya bin dolaba cilan ya hûthûte.

Hemed hêdîka ji nav nivînan derket û bi hêviya bikaribe bi pelandina destan bişkoka şikestî ji binê dolabê derxe, xwe li ser xalîçeya stûr direj kir ku ji seriyekê heta seriyê din yê odeya fireh raxistî bû û ji bo çêtir bibîne çavekî xwe girt û bi çavê vekirî li bişkokê geriya. Ji ber ku binê dolabê gelekî tarî bû, Hemed bişkok nedît. Li ser vê, lembeya flaşa kameraya telefonê vekir û dîsa hewl da ku bişkokê bibîne. Hemed bi xêra roniya lembeya telefonê bişkok dît lê ew çend dûr çûbû ku ji bo derxistina wê tekane rê ew bû ku dolaba hûthûte ji hev bê xistin.

Ji ber ku gelek wextê Hemed tune bû, bela xwe ji bişkokê vekir û bi lez xwe amade kir. Hemedê ne tenê zavê salê lê her wisa zavê demsalê bû, li şirketa mutehîtiyê ya nasekî xalê bavê xwe ne bi dilê xwe be jî di karê avahîsaziyê de emeletiyê dikir. Ji bilî serê mehê ku mehaneya xwe werdigirt, hemû rojên din ji karê xwe fedî dikir. Li gorî wî ne belasebeb bû ku gava yek ji yekî aciz dibe, dibêjê “emele”.

Hemedê emele ku di zaroktiya xwe de karê boyaxkirina solan dikir, her wekî wê çaxê ji destên xwe yên bi boyaxa solan fedî dikir, piştî dest bi karê emeletiyê kirjî jî ji karê xwe yê emeletiyê û cilên xwe yên xebatê fedî dikir û berevajî gelek hevpîşeyên xwe, her roja ku diçû karê emeletiyê pantorê qumaş yê ûtîkirî û qutikê wekî berfa Qerejdaxê spî li ber xwe dikirin û wisa ji malê derdiket û diçû ser karê xwe.

Hemedê bi cil û bergê xwe yê paqij û ûtîkirî û bi maskeya xwe ya reş ku diya wî di destpêka qedexeyên ji ber nexweşiya koronayê de jê re dirûtibû, bêyî tiştekê bide ber dilê xwe, bi zikê birçî ji malê derket û li otomobîla xwe ya ji wan otomobîlên jihevketî yên erzan siwar bû ku bi zêrên jina xwe kirîbû û qesta ciyê kar kir. Lê hê ji malê gelekî dûr nebûyî, hema piştî li milê çepê zivirî destikê vitêsê di vitêsa duyemîn de hişk bû û ma. Kir û nekir nikaribû vitêsê biguherîne. Li ser riya ku lîmîta wê ya lezê 80 km/s bû ji neçarî bi vitêsa duyemîn diajot û her ku pêl pedala gazê dikir borebor bi otomobîlê dixist.





Bi wê stres û aciziya ji ber qorneya otomobîlên giranbuha ku xuya bû xwediyên wan halxweş in, xwe bi zehmetî gihand sîteya tamîrkirina otomobîlan. Ji ber ku ev cara pêşî bû wî otomobîla xwe anîbû ji bo tamîrê, berê xwe da dikana pêşî û li ber dikanê park kir.

Hemedê bi pantorê ûtîkirî û qutikê spî û telefona ekrana wê tije derz, rasterast berê xwe da hundir û rewşa otomobîla xwe gote xortê ber bi wî ve hatî. Xortê ku cilên xebatê yên qirêj li ber bûn, gava li Hemedî guhdarî dikir, ji aliyekê ve jî li cilên wî yên paqij û lihevhatî û li otomobîla wî ya xirbende û telefona wî ya tije derz dinêrî. Hemedê ku li ber dilê wî ev sedema aciziya wî ya ji cilên emeletiyê ew awir û nêrînên dewlemendan bû, hemû karkerên cilên xebatê yên qirêj li xwe kirine jê re wekî bav û birayan bûn. Loma gava wê kêliyê wî xortê tamîrkar dûmana cixareya xwe bêxem bi ser wî ve berdida, qet jê aciz nedibû.

Piştî axaftina kurt ya derbarê problema otomobîlê de, xortê tamîrkar kîsikeke naylon anî û da Hemedê di dilqê karmendan de û bi toneke dengî ya nexweş gotê ku paldanka pêş bi wî naylonî binuximîne.

Hemedê li ser vê daxwaza wî hestyar bû, awirek da cilên xwe yên paqij û ûtîkirî û awirek da cilên wî yên qirêj û di dilê xwe de got, qey ev xort ji ber van cilên wî yên paqij wisa bi dengekî nexweş pê re diaxive. Kêliyekê ji ber wergirtina van cilan poşman bû. Lê gava wî xortî dubare gotê ku paldanka pêş bi wî kîsikê naylon binuxîme, Hemedî di ber xwe de got, “lanet li van cilan bê” û bi dilekî ji hestyariyê werimî xortê tamîrkar hembêz kir, destê xortê ku nizanibû ka Hemed çi dike di qutikê xwe yê spî de da. Hosteyê ku çawa Hedem ji otomobîla xwe peya bûbû awirên xwe kutabûn ser, bi gumana ku Hemed û xebatkarê wî şerî dikin, wekî bazekî xwe dipekîne ser nêçîra xwe, xwe pekand ba wan û bi her du milên Hemedî girtin. Piştî ku hosteyê girgire Hemed zeft kir, ji wan pirsî ka çima şerî dikin.

Hemedê di nav lepên hosteyî de ku dikir rondikên çavên xwe yên hestyariyê bi sermilên xwe paqij bike, bi pirsa wî re matmayî ma û got:

- Wî, şerê çi, birê min. Lêwik ev naylon da min ku qoltixê erebê bi kincên wî yên kar qirêjî nebin. Lawo, em jî xebatkar in. Ma me dinya nedîtiye? Ez ê wî qoltixî qurbana qirêja kincên wî bikim, wî!

Li ser van gotinên Hemedî, hosteyê wekî hûtekî Hemed berda û gotê:

- Keko, te şaş fêm kiriye. Tu zanî rojê çend kes tê vira? Hema di erebeya her yekî de mîqrobek hebe? He? Em ê çi bikin? Bi Xwedê em ê bibin qorona û em ê negihîjin êvarê.

Sakar Kamil Osman

Ceng , pêt û kena şervanekê

(diyarîye ji bo hemû şervanên rojava û fermandeyê wan bi rêz mezlûm kobanî)

ez ji pêta agirekî di sojim
bedena min şewateke ebedî ye
ho eyî feryadresê min
canê min dibin kevranre
herrikî nav perên tîpeka eytûnê
heyî ho feryadresê min
pêjina zarokan firya nav perên şi'reka dirryayî !
bi peyvên her helbestekê re niqûmî gorekê bû
heyî ho feryadresê min
ev erde şeq bûye !
di her şeqbûneke wî de
gomeke xûnê di herike nav giyanê min
heyî ho feryadresê min
di zanim
azadî ji guleyên tivenga te
ji dayîk dibe bê hempa
tû zanî ?

brînan em daqutayîn ,
rehên dîrokê nabizdiyên
kûrtir di axê re diçine xwar
rojava , hîmê şoreşzanîya dîrokê
dibin siya ewrên baran girtî ,
gava ku bi barin ,
baran sirûda serkeftinekê di çire
hemû lehî ber bi deriyayî diçin berovajî !
gava ku bi barin ,
erd dibe şanoyeka keskesor ,
nimayîşa keziyên şervanekê
azadî pêve dihête helawîstin

ez ateş û agirim
birîna min pirr kûr e ,
ji fezayek dûr bilindî axa ser sîngê şervanekî dibim
ez şervanim pêtên eytûnê ji kivanê nîgayeka çavê minê rastî diçin
şeq şeq ,
erd pertewazeyî gomeke hejiyayî dibe

li semta bayekê rojavayî
li jêr lingên hespên siwarçakên çavnetirs ax avis dibe û di lerize
di qulaçkên lerzîna wê de
şoreşek yekta ji dayîk dibe
zêmara dayîka şervanekê dike kenek
hemû dergehên asê di vê asêgehê de vedike
destên wê dayîkê dinav gulyên keça wê ya hivde salî de
sînorên xaka welat li kinarê rojê dipîvin
mestbûnek zemînî dadipoşe
hemû şervan serxweşdibin
serxweşdibin bi pêkên şeraba şoreşê
sermest dibin bi azadiyê

ev der rojava ye
bi şewqa guleyeke armancgirtî
hemû birîn di xew diçin
hemû girî bardikin
hemû hîvî ji dayîk dibin
hemû jiyan di girnije
êdî roj ava nabe !
li ser milên keçeke şervan
û li ser sîngê bayekî sar
hêdî hêdî di xew diçe
hemû azarên birînan
dikevin semayeka teyîsok
û ji vî wargehî bar dikin
ber bi duzexên pişt sînoran
ev der rojava ye
dergehê xûn û agirekî qeşagirtî
dergehê azadîyê
kevokek li esmanê wê
bi hêminî bi refa xwe re difire.

rojava : hîmê xweragirîya şoreşan
rojava : guldana gulên beharan
rojava : axa li bin lingên şervanan
rojava : cefakêşa neyarên rojê
rojava : goristana dujminên ronahîyê
rojava : tîrêjên roja hêjî ava nebûyî
rojava : welat , man , ayînde û zatê axeka
ku elinda sibehiyeka bi girnijîn peçinî

li vê der
îşq , hêvî û tivengek
ax û welat û şervanek

li vê der
keziyên lêkbadayî yên şervanekê
çek û qefteke gulên şilêrê

li vê der
rojek ku çi caran ava nabe !
helatinek û hêvîyek

li vê der
aşiqên bedena deştê
bîstanek ji darên zeytûnên efrînê
lehîyek ji baranê û renîyek ji befrê

li vê der
ceng , avêsta , hevrîn û azadî
li vê der
edulek û hezar derwêş

li vê der
hemû dinya
hemû şer
hemû asêgeh
hemû hijyan
hemû şeqbûn
hemû birîn
û şervanek

li vêder
hemû sinûrbezên
hemû neyarên aşiqan
hemû derzên di leşê deştê
hemû rêkbend
û (mezlûm kobanîyek)

vêder rojavaye
xaka xudawendên aştî û hêminiyê
xaka tekoşan û canfîdayê
hooo eyî feryadresê min
brînên me yên derizî bidrû
buxçika me pir bike ji dîrokeka bê mînak
da em jî veşêrin
di qulaçkên azadîyeka
hêjî ji dayîk nebûyî de !

Hezkirina ji jîyanê û tirs û xofa ji axîretê!



İkram Oguz

Zarokekî pênc salî bûm.
Hê dest bi jîyana vê dinê nekiribû, jibo jîyana wîyalî dihatim perwerde kirin. Fêrî xwendina Quranê dibûm, bi zimanek bîyanî û bi ezber. Quran dixwend, lêbelê ji xwendina xwe tu tiştek fam nedikir.
Di civata jin û mêran da ji hebûna cin û perîyan hayîdar dibûm, ditirsîyam.
Jibo ku xwe biparêzim, ji Qulûwelah heya ayetê Kursî, gelek ayetan hîn dibûm. Kîngê ku sawa tirsê bida ser min, ayetê Kursî dixwend, heta ku tirsa min birevîya, xwendina xwe li pey hev dubare dikir.
Li vê dinê, bi tirsa dojeha li dinya wîyalî dihatim terbîye kirin.
Di xewnên xwe da dojeha tarî, sîtilên li ser agir û tê da qîr û qetran dikelîyan, li ber her sîtilek zebanîyên çermreşên rût û tazî didît. Di xewa xwe da jî ditirsîyam û di nav xwîdanê da dimam. Diqêrîyam û ji nav nivînan qil dibûm.
Dîya min bi qêrîna min ra hişyar dibû, destê min digirt û bi dengê bilind ayetê Kursî dixwend. Dermanê tirsên wê jî ew ayet bû.
Xwîdana min sar dibû, tirsa min direvîya û ez bixwe dihatim.
Dîya min dawî li xwendina xwe dianî û ji min ra digot; „Hêdîka serê xwe dayîne ser balîfê, çavên xwe bigre, sê caran li ser hev ayetê Kursî bixwîne û bi xew ra here…“
Min gotina wê dianî cîh û bi xew ra jî diçûm. Jiber ku ayetê Kursî êdî bibû dermanê tirsên min jî…
Di dema zarokatîya min da, elektrîk hê negihîştibû gundan û ji destpêka êvarê heta berbanga serê sibê herder tarî û şevereş bû. Di gundan da, avdestxaneyên derdor û serê wan girtî jî nebûn. Li derdorê kesek tune ba, herder avdestxane bû. Ew avdestxaneyên derdor û servekirî jî di tarîya şevê da dihatin bikaranîn. Sedem wê yekê mezinan temî li zarokan xwe dikirin û ji wan ra wiha digotin:
„Cin û pêrî ji tarîyê hezdikin û bişev dijîn. Li herderê ne û bi çavan nayîn dîtin. Di tarîya şevê da avê nerêjînin û li ser pîyan mîza xwe nekin. Jiber ku çilk dikpekin ser cinan û cin li we dixin. Dema ku we av rijand ya jî mîza xwe kir, heta biqede, ayetê Kursî bixwînin, ku bila cin ji we dûr bikevin…“
Temîyên bi tirs xof nedigedîyan, jibo her tiştekî gotinên wan ên bi tirs û xofê va girêdayî, hebûn. Digotin:
„Bi tena serê xwe di ber mezelan ra derbas nebin, ger ku mecbûr man, heta ku derbas bibin, ayetê Qulûwellah bixwînin…
Di tarîyê da li fîtikê nexînin û gazî Şeytan nekin, Şeytan we dixapîne û ji rê derdixe…“
Mezinan zarokên xwe ditirsandin, şêx û melan jî mezin didan tirsandinê.
Ji hezkirina Xwedê zêdetir, tirs û xofa ji Xwedê dikirin dilê wan. Dinya ku tê da dijîn, nedidîtin û qala jîyan û nametên li vê dinê jî nedikirin. Tengbûna Pira Siratê û Agirê Dojehe bi hûrgulî tarîf dikirin. Te digot qey di ser wê pirê ra derbas bûne, li dojehê bûne mêvan û careke din şûn va vegerîyane û hatine vê dinê.
Bihuşt jî tarîf dikirin, bi tarîfa wan a bihuştê ra qilûlik zêde dibûn, qilf û henek dest pê dikir. Jiber ku di tarîfa bihuşta wan da, tenê gulîstanek cîh digirt.

www.kursivakurdi.org

Di bin her darek di wê gulîstanê da kalekî rûsipî, kanî û fêkîyên bi serê daran va daliqandî… Gulistanek ji kalemêrên rûsipî û bêdeng… Di wê tarîfê da ne jin, ne jî deng û awaz cîh digirt. Ew çil hûrîyên ku di kitêbên pîroz da tên qalkrin jî, li derûdora wan rûsipîyan xuya nedikir. Loma dîyarîbûna wan a ji Xwedê da jî zêde bala kesî nedikişand. Lê dîsa jî kal û pîr, jin û mêr, di nav jîyana vê dinê da bi xewn û xeyalên li ser dinya wîyalî dijîyan.

Wek mînakek, di nav gundê me ra çem derbas dibû. Di dawîya demsala biharê ra berfa Çîyayê Şahwelat dihelîya, lehî û laser radibû. Bi lehî û laserê va kurahîya çem jî bilind dibû. Ji bo derbasbûna ji çem tenê kêrangek dirêj û gilover danîbun ser avê. Dema ku av gurr û bilind dibû, kêrang di nav avê da dima. Tu kes newêrîbû ji alîyek derbasî alîyê din bibe. Hinekên ku cesaret didan xwe û dixwestin derbas bibin, di nîvê rê da lingên wan dişimitî û noqî bin avê dibûn. Mele û sofî bi ketina wan kesan va dikenîyan û digotin:

„Hela binêrin, hê nikarin di ser vê pirê ra gavek bavêjin, ew ê ji pira siratê çawa derbas bibin?“

Jibo derbasbûna bi hêsanîya ji avê, pireyek fireha ku bi danîna çend kevir û daran dihat çêkirin, nedihat bîra mele û sofîyan…

Lê heta ku zimanê wan bigerîya, di derbarê jîyanek nedîyar da diaxifîn, temî li kesên derdora xwe dikirin û digotin:

“Felan tiştê nekin, ku li axîretê jîyana we ya bêdawî di dojehê da derbas nebe…

Bêvan tiştê nekin, ku di sîtila qîr û qetranê da neyên kelandin…

Gotina Şeytan nekin û pê nexapin, ku pira siratê li we teng nebe…”

Carcaran bi aqilê xwe yê piçûk difikirîm û ev pirsên bê bersiv di sere min da dilivîyan:

Gelo Xweda yê ku mirov ji candarên din cuda afirandîye û aqil daye wan, çima ji aqilê wan dikeve şikê û wan wek xapînokê Şeytan dihesibîne?

Çima wan bi cin û perîyan, bi agirê dojehê û zebanîyan, bi qîr û qetrana kelyayî ditirsinê û terbîye dike?

Pirs li hev dirêj, li min jî giran dibûn.

Ne dikarîbû bersiva pirsên xwe bida, ne jî cesaret dikir ku ji mezinek bipirsîya.

Loma di serê minda dilivîyan û bê bersiv diman…

Di xortanîya xwe da jî, ji fikr û raman, ji bîr û bawerîyên cuda hayîdar bûm.

Dem û demsal derbas bûn, ji wergera wan a bi Kurdî sê kitêbên pîroz, Quran û Încîl û Tewrat, xwend. Di her sê kitêbên pîroz da jî ew tirs û xofa ku şêx û meleyan dianî ziman, dît. Herçiqas qala xelatkirina bi jîyana di bihuştê da were kirin jî, ew dîsa bi tirs û xofê va girêdayî ne…

Ez li tama jîyana li vê dinyayê digerîyam, li herderê tirs û xofa ji jîyana dinya wîyalî derdiket pêşîya min.

Loma min berê xwe da fîlozofan û di nav pelên pirtûkên wan da, li bersiva pirsên xwe yên bêbersiv gerîyam.

Min di pirtûken wan dît, ku ew jî li bersiva pirsên bêbersiv digerin.

Qala tamgirtina ji jîyanê, qala hezkirin û evînê dikin.

Li ser afiradina dinê disekinin û qala Xwedê jî dikin.

Hinek hebûna Xwedê înkar, hinek jî gor zanebûna xwe, Xudayê ku bawerîya xwe pê tînin, tarîf dikin.

Ji wan fîlozan yek jî Baruch de Spinoza ye, ku di sedsala 17an da jîyaye.

Spinoza ji fikr û ramanên Dekart hîkarî girtîye û fîlozefekî rasyonalîst ê ji Serdema Zêrîn a Holandayê ye.

Spinoza di pirtûka xwe ya bi navê „Rê/The Way“ da, Xwedayê ku jê bawer dike, bi gotinên Wî wiha dide tarîf kirin.

Xwedayê Spinoza wiha dibêje:

„Dest ji duakirinê berde û cîhê bîla bê sebep li singê xwe nexîne!

Tişta ku ji te dixwazim, di vê dinê da tamgirtina te ya ji jîyanê ye.

Ez dixwazim, tu, ji wan tiştên ku min ji bo te afirandine, tamê bigrî, bistirê û şa bî.

Dest ji çûyîna parestgehên ku te çêkirine jî berde.

Tu dibêjî ew malên min in!
Mala min li serê çîyan, li daristanan, li çem û robaran, li peravên gol û deryayan, di kûrahîya dilê te da ye…
Sedem jîyana xwe ya kesip min tawanbar neke; jiber ku min tu carî je te ra negotîye ev tişt xirabe ya jî tu gunehkarî û zayendîtîya te jî tiştekî nebaş e!
Loma ji bo tiştên ku tu pê hatî bewerîkirin, min tawanbar neke!
Dest ji xwendina nivîsên qaşo dibêjî pîroz, ku ti eleqeyek min bi wan nîne û jixwe tu jî ji wan tiştekî fam nakî, berde!
Ger ku tu, di berbanga sibê da, di nav dîmenek da, di dostanîya hevalên xwe da, di ronahîya çavê zarokekî da min nebînî, di ti pirtûkên ku hê di dema ku nivîs nehatîye zanînê da û bi navê min hatine nivîsandin da jî nabînî.
Bawerîya xwe bi min bîne, lê bele bere jixwe bawer be û her tiştî ji min nexwaze!
Tu yê ji min ra bibêjî, ez kare xwe çawa bikim?
Ji min netirse!
Jiber ku, ez keleşûtik nînim û te nadarizînim, te rexne nakim, li te hêrs nakevim, te bêhedûr nakim û qet cezayek jî nadim te.
Hezkirina te ji bo min bes e!
Lêborîna xwe jî ji min nexwaze; jiber ku tişta ku were efûkirin jî nîne.
Ger ku min te afirandibe… bi îradeya te ya azad te arastîye.
Ger ku tu bi aqilê ku min daye te bijî û îradeya xwe bikar bînî, ezê te çawa tawanbar bikim?
Afirînêrek çawa dikare vê yeke bike?
Hemû ferman û zagonan jibîr bike, ew hemû honakên ew kesên ku dixwazin te bixapînin, te kontrol bikin û tu xwe gunehkar bihesibînî, ne…
Bawerîya xwe bi wan neyne û tene aqilê xwe bikar bîne…
Ji xwe ra rêzdar be û tişta ku ji bo xwe naxwazî ji kesên din ra jî nexwaze.
Tista ku ji te dixwazim ew e, ku li jîyana xwe miqate be. Jiber ku ev jîyan ne azmûnek, ne pêlekek, ne gavek, ne cêribandinek, ne jî rîya ku digihîje Bihuştê ye…
Min bi her awayî te azad kirîye.
Xelat û siza jî, guneh û dilpakî jî tune, tu kes xwedî skor nîne û tu kes qeyd û meyda jî nagre.
Tenê hezkirin he ye..!
Lêbelê, jibo ku di jîyana xwe da bihuşt ya jî dojehê biafirînî, bêguman tu azadî.
Piştî vê jîyanê çi dibe û nabe, ji te ra nabêjim, lê dikarim temîyek li te bikim. Piştî vê jîyanê weke ku tiştek tune, bijî.
Bifikire ku, ev jîyan jibo ku tu jê kêf bigrî, hez bikî û jê tamê bigrî, he ye. Ango tiştek tune be, bi firsenda jîyana ku min daye te, jixwe tu yê kêfxweş bibî. Lê ger ku tiştek hebe, li wir jî başî û xirabîyê ji te napirsim.
Tiştên ku ji te bipirsim, dê ev bin:
Te qîmê xwe bi jîyanê anî?
Te jê kêf girt?
Te zede ji çi hez kir?
Di jîyana xwe da tu çi hînbûyî û te kîjan tiştên baş kir?
Dest ji bawerîya xwe ya ji min berde, bawerî, texmîn kirin e. Ez naxwazim tu bawerîya xwe bi min bînî. Tenê ji te dixwazim, ku tu di kurahîya dile xwê da min hîs bikî. Jibo min hezkirina te bes e.
Ji pesinandinê eciz bûm, ji spaskirinê têr bûm.
Minetdarîyê hîs dikî?
Vê yeke jibo xwe, jibo tendurustîya xwe, jibo tekilîyên xwe û ji bo çavdêrîya xwe ya li vê dinyayê bîne ziman.
Tu hîs dikî ku te teqîp dikin?
Rûgeşîya xwe nîşan bide. Jibo pesindayîna min tiştên rast ev in.
Kar û barê xwe giran neke û di derheqê min da tiştên ku hin kesan ravayê te da ne, mina tûtîyek wan dubare neke.
Tişta ku jê bawer bî, ew jî hebûna te ya li wir e û tiştên tu jîyayî yi. Herweha ev dinya bi nûwazeyan va tijî ye. Ger ku li derdora xwe binêrî, tu yê min bibînî û hîs bikî. Çima pêwistîya te bi mucîzeyên zede ra hebe?
Li derveyî xwe bigerî, min nabînî.
Tenê dikarî di hundurê xwe da min bibînî…”
Şêx û Mele, Keşîş û Haham civatên xwe bi tirs û xofa ji dinya wîyalî ditirsînin û Xwedê jî bi sawa wê tirse didin hezkirin.
Xwedayê Spinoza jî bi tamgirtina ji jîyana li vê dinê Xwe tarif dike û dide hezkirin.
Min ji jîyanê û ji Xwedayê Spinoza, ku ev dinya jibo me afirandîye û em jê tama jîyanê bigrin, hezkir û nêzîkî Wî bûm…
Lê hûn ji çi hez dikin û nêzikî kî ne?..

CÎGERXWÎN Û DERÎKA ÇÎYAYÊ MAZÎ



Eyyup Guven

Cîgerxwîn, helbestvan,sîyasetmedar,û nivîskarekî pir mezin e.

Cigerxwîn lî erdnigara kurdîsta ê pir gerîyaye u her der binçava de derbaskiri ye. Dema li Kurdîstanê gerîya ye , Wê deme axatî û şêxtî pir bi deng bû û wek sazîyak fermî dihat qebûlkirin. Cîgerxwîn jî dî rewşek wenî de lî Kurdîstanê gerîyaye u tu deme de stêrka wan u cîgerxwîn lî hev nekîrîye. Ber vê yeke herdem hatîye celîkîrîn û her dem bi lenerînek dine hatiye naskirin.

Di sala 1922 de heya çûye ser dilovanîya xwe di warê edebî ,helbest û nivîskarîyê de pir berhem lî duxwe hîştîye. Lê belê di tu behremê hatiye çapkirin bi berfirehî bahsa jiyana seydayê cîgerxwîn li navça Dêrika Çîyayê Mazî nehatiye kirin.Mirov li helbestê wî an li çaranîyê Cîgerxwîn dineri tê faam kirin , Dêrika çîyayê mazî tesirek xurt li ser cîgerxwîn hiştîye. Lê belê wek me bahs kir di derkheqê vê tesîrê de lêkolîn ê ber fireh tuneye.Daxwazîyame eve kû xwendevana di derheqê jiyana cîgerxwîn, li navça Dêrika çîyayê mazi de agahdar bike. Di dîwan û pirtûkê bahsa jîyana seydayê cîgherxwîn dike salê 1922 u heya sala 1924 zêde ne eşkereye ku bela Cîgerxwîn di va salana de li Dêrika Çîyayê Mazi dîjîya ye.

Seydayê Cîgerxwîn,di sala 1903 de li navça kircewsê li gundê hesar xwedê daye, di şerê cîhanê şerê yekeminde di sala 1914 de deheri bin xetê derbasî Rojavayê Kurdîsytanê dibe. Li Amûdê jiyana xwe berdewan dike.

Di sala 1921 de vedigeri welêt derbasî alîyê Amedê dibe u li Amedê deheri cem seydayê Serî jêkirî di varê olî de perwerde dibe, di wê demê de dibihîze li Dêrika Çîyayê Mazî wek mel Hesenê Tawîkî ,wek seydayê mele Îskender Kazim heye. U di sala 1922 de tê Dêrika çîyayê mazî.Dema tê navçê li navçê Di warê olî de berpirsîyar Melle Elî ye. Lê belê di nav gelde u di warê perwerdehiya olî de seydayê melle Îskender Kazim e.Cîgerxwîn di wê demê de deheri cem seydayê melle Îskender u dest perwera olî dike. Melle Îskender di warê netewîde peşde çûye ber vê yekê cîgerxwîn, gava perwerdeya siyasi cara yekemin li Dêrika çîyayê mazî avîtîye.Dema seydayê cîgerxwîn li ewupa dîjî , kovara Roja Medîya (Medya Güneşi) bi seydare hevpeyvinek ê dike Seyda we demê vuha dibê je :" Ez bawer dikim min lî Dêrîk ê baxçe u rezê dahl û xabê nedîta dibû ez nebu ma helbestvan , min hestû u ramanê xwe ji jiiyana Dêrikê u lênerîna Dêrikê girt." Di vê gotinêde mirov faam dike kû derikê pir tesîr li ser Cigerxwîn kirîye. Dema mirov li çarînû helbestê cîgerxwîn dinere tê xuyakirin kû , erdnigara Dêrikê pir dipesinine.

DÊRİK

Dêrik çi xweşe bi dar û ave,
Ev ava lî her dere bela ve.

Yek Xabe bele ,bihuştu mava.
Pir mişmiş û sêv û darû selwa.

Pir gûz û hejîr û xox û hinar,
Pir kanî û aş û avû cobar.

Yek dîheye jê dibên Kulêbê,
Gorîne jiwê reXûrs û Şêbê

Pir ave kesar û pak û şêrîn,
Pir dar û ber û gûlanê rengîn

Bilbil digirî bi axû zare,
Daxwaz bixwekoma la heware.

Mizgîn dide ev heval û yare,
QEDRÎ koli Şamê xwende ware

Çepkan dîkutîn diben birawo,
Gorî te dibin xweh û bira.

Dema seydayê cigerxwîn li navçê dimîne li cem seydayê melle Îskender pir mele u şexsîyetê navdar perwerde dibe.Ev şexsîyetna Mele Mexmedê Heboşî, Mele Mexmedê melê Xemê, melê Bêzo,melle Evdirrehmanê Sorikî, Êlaso u Ziya . Di demê pêşîyê de ev melle u merivna di serhildana şêx Seid de alîkarîyê bi Şêx Seid dike.

Dem bi dem seydayê cîgerxwîn bi hevalêxwe re deheri ser gar û zinarê der dora navça Dêrik Heremek heye ji navê ew zinarna dibêje “Firîna Gawira” û lî hember zînara Pozê Mancêlê heye. Di navbera herdu zînara heremek heye jêre dibêje Gov, Di qirqirinq Ermenan de pir Ermen hatine kuştin.Rojekê Cigerxwîn u melle Evdirrahman ê Sorikî deheri wê heremê dema Seyda li wê heremê dînere, li ser zinara “Govê” rudine u linge xwe bi ser zinarê berdide u çarîne kê dibêhe je.
Heylo dilo heylo dilo,
Agir berda loda çilo,
xelk u alem tev bune meriv,
kurmanc tene mayen wilo.

Xir xir dike zir zir dike ,
Wek kere mala Şêxê silo,
Heft heft dike, heyşt heyşt dike
Wek kucikê mala Şêxê biro.

Cigerxwîn herdem bi hevalêxwe diçû hereme reza Xab u dahl e.Wê deme Cigerxwîn di piranî de çarîn dinivîsan û hevalêwî xitim dikir. Çarînek wi lis er Daxlû Xabê:
Min baxçak dit li xabê wek baxçê cinnetê,
Min avek jê vexwar,wek ava qudretê,
Lê zalim neyar dibe xwedîyê vê hikmetê,
De zu bike kurdo nemin edi ixanetê.

Dema welat parêzî hedî hedi di mejîye wî de dişitile , faam dike ku li navçê axatî di pêşîya her tiştî deye. Rojekê di nav sukê de dimeşi lê dineri ku neh deh meriv lî zilamekî belengaz dîxe ,Cigerxwîn dibin e u pir diêşe ser vê buyerê jî çarînek wî:

Dêrik bi rezi bi terezi,
Serê Dêrik ê bi axa u bi teresi.
Hêvî dikim ji xwedayê bej u av,
Ruhê va necisna bitsîne lez bi lezi

Seydayê cîgerxwîn di vê demêde helbestê xwe bi tîpî samî (Erebî) dinivîsîne,Rojekê ji Dêrikê deheri qerejdaxê, mevanîya Çûço Axa,Çend roja li wê derê dimîne. rojekê ber êvarî du swarê hespa tê kon.Her du swarî yek Şewqî Beg e yek jî ,birayê wî Evdîla Beg e. ji Erxenî yê ne. Berî ku serhildana Şêx Seîd çê bive li nav kurdîstanê digere u ji mirove welatparêzalkarî dîxwaze. Ber vê sedemê hatine Çiyayê Reş. Wê şevê dibe mêvanê Çuço axa,li kon dimîne u Cîgerxwîn çend helbestê nivîsandî ye ji mêvana re dixwîne. Şev derbas dibe Dibe sibêh zû , Şewqî beg bi destê Cigerxwîn digre u deheri ji dervî kon , şewqî beg dest pê dike,dûr u dirêj qala xwe ,kurdan û xelasîyê azadîyê dike:
---Tu bi zimanê xwe zimanê kurdî nenivîsine, tu wate tune, Ez ji te dixwazim tu bi zimanê kurdî binivîsine.
Ez di sala 1924 de ser vê buyere şunde,bi saya Şewqî beg ê erxenî zêdetir hişyar bum. Cigerxwîn bî kurdî dest nivîsê dike.
Cîgerxwîn her ku deheri û ji hevalê derdora xwe nebaşîya axatîyê û têkilî ya axa û şêx û mella dike.

Zu dereng gotinê wî tê bihîstin û ji Mamostê wî ji bona Cigerxwin ji navçê here tê gotin. Melle Îskender deheri cigerxwîn dibîne cigerxwîn faam dike ku ewê wî wenda bikin , dibe sibêh zû , şagıirtê xwe li hucra tenişta mizgefta kanîka bi çuk dicivîne cem hev u jiwan re dipeyive:

---Ez dikim ji Dêrik ê herim, lê ez bê dil ji vêderê deherim.Dilêmin li Dêrik ê dimîn e u ezê herim tu cara ez Dêrikê ji bîr nakim. De bi xatirê we.

Melle Evdirrehmanê sorikî u Elasê hecî Etman, bi Cîgerxwîn re deheri ji devrî Dêrikê wi dişîne.

Dema ew deheri dervî Dêrik ê di 1940 de Alîyê husên,(Elîyê Sittîka) deheri rojava qamişlî, ewê ji qamişlî derbasî gunde taabeş bive.dema deheri Taabeş,gundî amedekartîya mêvana dike , dibêje ewê Cigerxwîn were. Ber wê yekê xalê Elî disekine ku gi weri bê Cîgerxwîn ewê an yekî dinê ye. Dibe şev temema mêvan û gûndîya lî oda mahzubanê wî runiştîiye demek nêzîk derbadibe dineri Cigerxwîn hat, u Cîgerxwîn li Dêrikê mamostê wî bu, Şev dibe nêvî ew li odê dimîne,ode ji mêvana û ji gundîya kes kesekî nabîne.demek derbas dibe Cîgerxwîn li çav Elî dikevi u bang dike. Dema bi Elî re dipeyive wî nas dike,û ji xwedîyê malêre dibêheje bila livînêmin u ê elî li cem hevbin. Wê şeve li cem hev heya dereng şar dimine u dipeyive. Ji Elî re dibêje:

---Dema ez ji navenda navçê derket şûnde ez çûm gündeki Dêrikê, li wêderê min dest melletîyê kir, di wê deme de ,şextî jî pirbû, li gund niv şêxek hebû, digot ez kuçikê mala şêxê cizirîme,ber wê yeke de em min her ew didit min devêxwe dikir gûha jêr digot , ---Karê kuçika li mizgeftê tuneye.

Dema zikat dihat stendin, bela ku em her du jî di warê oli dixebitî çi zikat bihata bime her duya dihat parkirin ber vê yeke şêx jî mîn heznedîkîr, u axa ez ji gund derxistim.Paşî ez çûm alîyê Cizîre min dit şêxê wê demê di bin navê zikatêde fekîra diruçikîne ez li hember şêx sekinim wê gavê şêx fam kir kû ez diji wî dixebitim ez ji wêderê ji celi bum u ez hatim qamişli, li qamişlî hîn tu kesekî ez nas nedikirim min sergin berev dikir û ew sergin nadifirot u pê asukêxwe diqedand.Rojekê ez li nav erdeki bu. Min disa sergin berhev dikir, min lê nerî nezi deh zilama bera dû şêxê cizîrê daye u dimeşin, dema şex çav min ket ez nas kirim u sekini ji bo kû henekê xwe bi min bike dest peyvê kir:





---Eeee şexê min,seydayê min,tu çer dike?
---Ez çer dikim ez necisa berev dikim ezê bivim bifroşim u asukê xwe bikirim.
Wê gavê wek şex xiznakê bivîne u xwe avit holê bi dengekî aza bang kir:
---Ma ne gunehi tu dike gû bifiroşe u bi vî gu,heri nên bikire u bixwe?
Min faamkir kû şêx dixwaze min li hember hevalêxwe biçûk bike , wê demê çarînek ber devê min u min bi wê çarînê bersiva şêx da.

Şêxêmin seydayê min,
Bi şaşika sere te,bi îmana qelbê te,
Bi mirîd ê dora te
Ev gu çêtire ji wê zikata te.
Dema min wer got şûnde wek tu şivekê liser çavê şêx xe u got.
---Tu xirîya ye. lazime peyva bitere herame,
u ji wederê lez bi lez çû ez hatim xebitîm u nuha ez xebatê xwe berdewam dikim. De bivêje li Dêrikê çi heye?
Min bahsa leşkerê Receb beg kir dema serhildana şêx seid tek deheri şûnde li giştîya kurdîstanê çek tê berevkirin u li para Dêrik ê jî , serdarek dikev
navê wî Receb beg e, zilmû zora wê demê û binçavkirina mirovê welatparêz kû seydayê melle îskender, ket zîndanê derket şûnde mir.melleye bi cigerxwîn re duxend giş revîya , herkê çûye dereke, ilyasê hecî Osman , û hecî seydî u mecîto hatiye girtin u di dadgehê de dalıqandin a wan dixwaze. Wê gavê bê hemd Cigerxwîn çarînek ji nav lêvê wî derket:

Ava xabê hurm e hurme,
Reco hatiye gurme gurme,
Melle revîya çûn zozan a,
Seyda maye di zindan a..

Baxsa dahle xabê u reze Dêrike kir di çi warî deye min yek bi yek jê re got we gavê disa çarînek ji minre anî ziman:
Gula mêrdîn yek Dêrik e,
Baxû baçê weji cinnet e
Li vê dinîye ,u hebi li wê dinyê,
Tû Dêrikê nesîbê min ke..
Bû sibe ez rabûm serxwe me tev de taştê xwar min çû genim li kerêxwe kir, ez disa hatim cem seyda min xatir jê xwest wê gavê seyda peyva dawîyê ji min re kir:
---Bila Dêrik î,wek çavêxwe li dahle li xabê u li çand a xwe xwedî derkevi vê temîyamin ji bîr neke.
Di sala 1945 de disa ji Dêrikê îsmeilê simsar, deheri binya xetê u cigerxwîn dibine, Seydayê cîgerxwîn ji Îsmaîl re disa bahsa Dêrikê rezû dahl û erdnîgara Dêrikê dike.
Tiştê tê fam kirin, Dêrika Çîyayê Mazî di nav dilê seydayê nemir Cîgerxwin de,cihekî girîng digre.

Subehî dê mirim
Kurteçîrok: Xwan Xusîh Miyas
Wergêr: Hesenê Silêvaneyî

Ez nizanim kîjan gavê ji îro min tê anî der ezê li roja pêniç şembî, her çend e yên dî hêj li roja çarşembê ne. Gelek çaran eve digel min çêbûye û min bi xem ve newergirtî ye, cunkî hindek heftî hene mirovî divêt zû verevin, lew rojekê jê dibirt. Arîşeya min bi temamî li roja şembiyê dest pêkir, ez û hevjîna xwe hîb bûn biçin sînemayê û ji derve şîva xwe bixwin, hindek caran em hevalekê û hevjîna wî jî vedixwînin da pêkve bin. Lew min bo xanima xwe pêşiniyar kir telefona xêzana Cutîrîsî bike da vê êvariyê digel me derkevin, ewê gote min hêşta em yên li roja eyniyê. Min çi negot, lê ezmendehuş mam.

Ez li mal kar dikim, ez birucirmirim û peywendiyên min bi cîhana ji der ve sinordar in û paşî min bawerî bi hestên xwe nînin. Ji ber wê çendê berî jina min qesta karê xwe bike (ew seroka pişka diravên biyanî ye li banqekê) ez derketim ji bo kirîna rojnamê û piştrast bû em li roja şembiyê ne.

- Li rojnamê binêre

Min wesa gotiyê û rojname deyna ser mêza metbexê, wê hêj têşita xwe dixwar.

- Li çi binêrim?
- Ka em li kîjan rojê ne.
- Eynî 15 Oktober.

Min xwe nêzîk kir û ji pişt milê wêra berê xwe da dîroka li serê perî nivîsî, min dît ew ya raste. Lê demê ew derketî, careka dî min berê xwe da rojnamê û min dît em yên li roja şembiyê 16 Oktoberê. Min zanî ewê rojnama eynyê xwandbû, lê min ya şembiyê xwandî ye, anku û ji ber egerekê nahête şirovekirin, ez rojekê ji berî mirovên dîtir dijiyam. Ez bi hindek karan rabûm da ji wê çendê piştrast bim, encam wesa derket, ku ji dil, ezê rojekê ji berî yên xelkê dijîm. Wê şevê, li ser şîvê, min ev çende ji hevjîna xwe ra vegêra:

- Erê tu dizanî ez rojekê berî xelkê dî, dijîm?

Barikirî bi pirsiyarekê berê xwe da min, bi dirêjî min jêre şirovekir, piştî ez ji axiftina xwe xilas bûm, ewê xwe bi kenî kuşt, min wesa zanî ew ê axiftina min bi henek wergirt. Min dirêj nekir, çunkî min bi xwe jî dît babet nahête bawerikirin, ku ez bi xwe ji hestên xwe biguman ketim.



Li rojên di dûv ra, ez li ser babetî rawestam û vekolîn kirin, ez gehiştim wê çendê ku eve rastiyeka mukime. Çunkî min dengûbas dizanîn
berî xelk bizanin bi rojekê, her çende eve wek xesletekê diyar dikir, lê tirs jî bo min peydakir. Min di rojnama sêşembê, sêşemba min, nûçeya mirina dayika xwe dît, ewa bo xelkê dî, hêşta saxe. Her wesa min nûçeya agirberbînekê û erdhejekê hêşta neqewmîn, dîtin, û min serdana kurê xwe li xestê kir, piştî tûşî rûdaneka tirumbîlê bûyî, hêşta neqewmî. Her wesa min nûçeyên xweş jî dîtin, lê min nikarî pê
keyifxweş bim di wextê wêda digel yên dî. û husa demê keça me ya nujdarî dixwand, û hatî ye damezirandin li xesteyeka mezin, diviya bergiriyê li heza peywendîkirinê bi malê hemiyê ve bikim, ji bo belavkirina mizgîniyê.

Min dest bi vexwarina meyê kir. Rojekê demê ez bi tenê di mey vexwarinekê ve bûm, ü min vedixwar, xanimeka neşûkirî bi rex min ve rûnişt. Em ketin danüstandinê, piştî bêhnekê, min danpêdan bi arîşa xwe, bo wê kir. Ewê gote min, tiştekê wesa digel wê jî rûdide, ew bi du rojan, ne bi rojekê li pêşiya xelkê ye. Evro roja çarşembê bû, bo min, ü roja sêşembê bû, bo xelkên dîtir, ü roja pênc şembê bû, bo wê.
- Pa vêca ev dîdara me, evro rûdide an sibehî?
- Evro ji bo te, ü duhî ji bo min.
- Pa madem tu li subehî yê, ka bo min bêje dê ci qewme!
- Evro em dê biçin nav nivîna-ewê got–Ez li vêrê, li nêzîkî meyxanê akincî me, lê demê tu dest bi cilik êxistinê dikê, dê dilê te rawesite, ez dê te rakim û di esansêrê da hêlim, sihariya roja dî, mirî, dê te bînin, ya rast jî, ewan tu dîtî. U polîs hatin û ji me hemûyan pirsîn, ka em te nas dikin, me bê agehî ya xwe ji te diyarkir.
- Bi xwe radestkirin û baweriya jivexwarinê peydabûy min got:
- Pa pîtivî nake em biçin mala we.
Ewê got:
- Da biçin-nê demê çûnê ye.
Em ji meyxanê derketin, çûn epartmana wê ya nêzîkî meyxanê.
Demê min dest bi cilik êxistinê kirî, ez bi janek dijwar li milê xwe hesiyam, piştî hîngê gehişt sîngê min, demê xanim bi rewşa min haydar bûy, qabûtê min, kire ber min, û ez kirime di esansêrê de û li wêderê hêlam, û berî ez bimirim bi kêlîkekê, min hesta xwe ya siruştî bi demî vegerand, her çende ez yê li roja çarşembê mirîm, lê hêşta ezê li roja sêşembê dijîm. Min qesta mal kir, min xwe di jora xwe ve asê kir, û min dest bi nivêsîna vî deqî kir, û ez kesê li ser ewa rûday gunehbarnakim.)

Xwan Xusih Miyas:

Romannivîs û çîroknivêsekê navdar ê Espanî ye, jidayikbûna wî sala 1946an e. Ew yeke ji navdartirîn çîroknivîsên Espanî ye, ji nîva dûyê ji sed saliya bûrî û destpêka vî çerxî. Gelek xelatên girîng wergirtine, wek xelatê Nadal li 1990 , li ser romana-Tinêtî wesa bû-u xelatê Bilanîta li 2007 , ku navdartirîn xelatê wêjeyî yê Espanî ye, li ser romana–Cîhan. xelatê Mariya Dî Kafiya li 1998.)
*Berhemên wî bo pitirî 15 zimanan hatine wergêran.

Ji berhemên wî:

*Eqil berzebûne 1974 * Wesa dihêt ber çavên wê * Du jin li biraxê * Sawîlke û mirî * Bîjî û xwe vedizî * Tinêtî husa bû * Cîhan * Xuliyo û lora *

Jêder: Saqî al yumna –Lingê min yê rastê–Ji wergêrana: Ehmed Ebidulletîf, weşanxana weraqun-Îraq, Besira, 2014.

Zana TAŞ

Nava xewn û xeyala
Digerim bi şev
Lê te digerim
Bi keser û bi axîn

Bê te, naçe jîyan
Bê te, nabe evîn
Bê te, şev tenê
Ez tenê me

Dilê min de bû agir
Çavên min de hêsir
Zimanê min de evîn
Şevên min de bû hêlîn

Gulek bide destê min
Çavên xwe berde çavên min
Ji kela dilê xwe
Ramûsanek bide min

Bê te, naçe jîyan
Bê te, nabe evîn
Bê te, şev tenê
Ez tenê me.

www.arsivakurdi.org

SILÛKA SOFÎ Û QERENTÎNAYA CIVAKÊ



Hejarê Farqînî

Berîya ku bikevim vê mijarê dixwazim hin tiştan di derbarê silûk û qerentînayê da bêjim.
Weka ku em jî dizanin ji bela vayrosa koronayê ku ji Wûhan a Çînê derket û bû bela serê hemû dinê em ji mal newêrin derkevin. Tabî kesên ku bawerîya xwe bi teorîyên ji zanistîyê gelek gelek dûr in jî tînin hene. Ji bo halê me jî gotine qerentîna. Li gor lêkolîna min a teng peyva qerentîna ji îtalî tê û ew jî bi xwe tê wateya çile. Berîya çend salan nesaxîyek li alîyê Venedîkê hebûna keştîyên ku bixwesta biçin wir bernedidan û çil roj li ber avê didan seknandin da ku nesaxî nekeve hindir.

Meseleyek wisa di gelên rojhilatê jî taybetî di kurdan da jî heye. Meseleya çile yan silûk. Berê sofî, bîrewer, feylesof ji bo ku xwe bigihînin rastîya dinê, rastîya Xwedê yan fam kirina hemû cîhanê diketin înzîwayê. Ji qewlê tirkan çîle dikşandin. Lewra bê av bê xwarin û bi dehan roj wisa diman da ku xwe li ser wê mesele yan meseleyan girêbidin. Ma Hz. Zerdeşt wisa nebû xwedîyê agirê û hunera wê... Înzîwaya kurdan jî wek meseleya qerentînaya îtalîyan tê. Sofî berê diketin çile, çil roj! Kî zane dibe ku ji kurdan çûye heta Venedîkê…

Çend roj berê jî bavê min got " wey mala min ê halê me bû halê melayên ku ketine silûkê" Silûk wek çile wek qerentîna tê bikaranîn. Lê armanc û encama wan ji hev pir û pir cuda ne. Wa ye niha bi wateya tam dikarim bikevim mijara xwe ya ewilîn. Di meseleya qerentîna û çilê da li gor min divê mirov hevparî û cudahîyên wan derxe holê.
Belkû mirov dikare bi awayên din jî lê nêzîk bibe. Weka ku antîkapîtalîst dibêjin vayrosek qirêjîya hemû dewletan derxist ber çavan! Rast e.



www.kurdi.org

Me fam kir ku ti dewlet ji bo nesaxîyek wisa amade nebûn. Dibe ku ev karê xwezayê jî be, tola xwezayê ku bi salan e çi anîbûn serê rebenê! Ji alîyê civaknasî jî mirov dikare lê nêzîk bibe. Weka ku civaknas dibêjin, heke pere te hebe û tu bikarî xwe biparêzî tu pê nakevî tine be li mala xwe rûnê. Rast e. "Mala pîrê stara pîrê" Alîyê din da jî dibêjin heke we ji xwe ra him li mal ma û him neçûn kar li destên me nenêrin ha hatta hebe wa ye ji we ra îbana banqeyek xêra xwe çend lîre bo me jî bavêjin! Mirov dikare wek derûnnasan jî lê nêzîk bibe. Weka ku derûnnas digotin, eman ha pir nêzîkê hev nebin haya we bi salan e ji we tine ye hevdû nexin! Rast e.

Bi salan e haya hemû mirovan ji hevdû tine bû. Mîna robotan, mîna kurmorîyan însan xebitîn. Pir mirov hene ku cudahîyên jina xwe qîza xwe ji bîr kiribûn, nedizanîn ku wa Neclayê porê xwe kirîye zer, nidizanîn ku wa ye Nazenîna biçûk mezin bûye diçe dibistanê, nedizanîn ku wa Bedirxanê çav şîn birçî bûye ji hez kirinê ne ku min got ha derûnnas gotin hûn ewqas hînê nêzîkbûna hev nînin nebin jî dê hûn bikevin hev ha! A aha, mesele xuya bû. Deme ku hemû tişt girêdayî hev in. Me ji xwezayê xwedî derneket ew belayek mezin anî serê me, ekolojî. Hiqûqên me yên fermîyetê qels û lawaz bûn û ji ber ku berê sûcdar nedihatin cezakirin şer zêde bû, hiqûq. Derûnnasîya mirov û civakê qet berê nedihat bîra kesî û taybetî jî ya dewletan ji bela çend roj ji mal mayînê bira bû dijminê bira mêr kêr avêt stûyê jina, derûnnasî û civaknasî. Kapîtalîzm ewqas ketibû hindirê me ku me nedizanî em rojane dîjîn, bi emrê Xwedê ma ne. Çima, lewra ji ber ku pirî dikanên ji bela ku hefteyek an du hefte hatin girtin top avêtin. Pir dê û bav hene ku encax du hefte xwe bi pereyên xwe yên berê îdare kirin dû re dîsa derketin kar. Mirin an mirin! Nan û av an jîyan! Mesele hemû ev e rastî. Gava mirovek bi xwestina xwe jî bê xwestina xwe jî bikeve silkûkekê divê bibe mîna sofîyên ku ji silukê derdiketin.

Mirov çil roj bê av û bê nan yano bê jîyan li derekê bimîne giran dibe. Xwe nas dike, dinê nas dike, sirûştê nas dike, der û dora xwe nas dike. Dibe însanê kamîl an rûspî dibe derdikeve. Lê em ewqas bindest û kole ne ku dîsa jî nikarin zincîrên xwe bişkînin da ku bi azad bifikirin! Hemû mesele aha di vir da ye, em piştî vayrosê bi çavên xwe dê bibînin gelo me ji peyama xwezayê tiştek fam kir an nekir. Em wek dewlet, mirov, karmend, mamoste, sîyasetmedar, fêlbaz, hunermend û û û gelo dê têbigîjin ku wateya ti sînor û rengan û alan û sembolan tine! Tu mirov î, tu li xwezayê dijî mîna mirovên berê yên te, mîna mirovên dahatû, hewceye ku tu bijî heta mirina xwezayî û hewceye ku tu biparêzî xwe û tiştên ku te dike te…





Dengbêj Evdirehîmê Mûşî

Dengbêj Resoyê Gopalan

Ne Şa'ir im, ne Dengbêj im
Wesfê Reso her dibêjim..
Derdê dilan ez dirêjim..
Dil û cîgeran dipêjim..
Tu him Şa'ir him Dengbêjî
Destanan zehf xweş dibêjî
Wekî 'Evdalê Zeynikê:
Dil û hinavan dipêjî...
Apê Reso Derya Wanê
Dîsa da dilê min janê
Cî û warê te Behişt be
Te dengveda li Cîhanê
Ey Şa'irê mêrxas û merd
Te zehf zêde kişandî derd
Te wê jiyanê Heq nekir!
Lê te şikandî qeyd û bend

Ey welatparêzê mêrxas
Tu yî Dengbêjekî gernas
Em hemî deyndarê te ne
Ey şêr û pilingê xwenas
Şa'ir-Dengbêjê efsane!
Homerosê me Kurdan e
Li ser Sorgula Gulistan
Bilbil bû dîn û dîwane
Te xizmet kirî sed sala
Dîwan bê te manin vala
Remza Dengbêj û Strana
Bi bîr tînim b' Gul û Ala.

www.arsivakurdi.org

MEHMÛD BIRÎMCE

EY BALINDO .. !

Ey giyanwerê speh û çelengo
Azado .. bê xemo
Te rûyê xwe dayî ye EFRÎNa birîndar
Tu şabûna xwe nadî bi samanên va dunyayê
Ma tu jî wek min EFRÎNî yî ?
Pir sal in êşa penaberiyê wek min dikişînî ?
Û îroj tu yê rûpelên çîroka êşan bi dewî bikî ?
Û di hembêza EFRÎNa rengîn de stranên xwe bisirûdî ?

Rahêje min tev xwe rahêje
Ji zordariya biyaniyê rizgar bike
Merga laşê min vegerîne
Min ji warê êş û tenêtiyê rizgar bike
Xewnên min ên pir salan rast bike
Şeva min giş bi pîrhevokan derbas dibe
Saw û sawêran rojên min tarî kirine
Vegerîn dermanê hemû azarên min e
Û bihnvedana min ji bilî hebêza EFRÎNê nîne

Eger çûna min tev te neçar e
Hêviyên min tev xwe bifirîne
Di hemû endamên laşê EFRÎNê de biçîne
Hinan di çema wê de ..
Hinan jî li serê çiyayên HAWAR û LÊLÛNê
Û her deverên deşta CÛMÊ
Pê av de , pê bixemlîne ..
Bila ew di giyanistana min de mezin bibin
Ji bilî hulma welatê min nekişînin

Looo firindeyo , evîndaro .. !
Barê bêrî û silavên min tev xwe bibe
Her şaxeke zeytûnê ji min re biramûse
Zanyariyên me pêgihîne malên me
Ku em nabin welatînên biyaniyê
Ji kok û rehên xwe naqetîne
Laşê me li vi re , lê giyanê me li wir e
Û buhara rengîn ê ji nû ve serî hilde
Û emê jiyana xwe bi findên NEWROZê bixemilînin.

www.arsivakurdi.org

PAYÎZÊ WELATÊ MA



Enwer Yilmaz

Ez welatê ma de mîyanê mewsîman ra tewr zaf mewsîmê payîzî ra hes kena. Xora ma zanê ke Pêro mewsîmê welatê ma rindek ê. Her mewsîm goreyê usulê xo yeno ciwîyayîş welatê ma de. Mewsîmê wisarî de vewre helîyena, hewa beno nerm, varan vareno, vilikî gûlî abenê, darî pelanê xo akenê û dinya bena ganî û rindek. Hamnan hewa beno germ, însanî zere ra vejîyenê teber û dinya bena germin. Payîz zî hewa beno honik, meywî û zewzî resenê, pelî renganê xo bedilnenê, ge benê sûr genê zerd. Zimistan beno serd, vewre varena û qeşa bena, însanî xo erzenê zere heywanî xo kenî binê erdî wa.

Yanê welatê ma de her mewsîm sey mewsîmêko rastiqên ciwîyeno. Dinya de zaf welatî nê mewsîman ra mehrûm ê. Yan zimistan derg o yan hamnan. Yan zimistan nêqedîyeno yan hamnan. Tikê cayan de vewre çin a tikê cayan de zî tîje çin a. Welatanê Ewropa de tim hewa şilî yo û tîje zaf kêm a. Rojhilatê Mîyanîn û Afrîqa de germ zaf o û çend welatan de hema vaje qet vewre û varan çin o. La welatê ma Kurdistan wîna nîyo. Her çiqas zî welatê ma ameyo perçekerdene û parkerdene zî mewsîmê ma zaf rindek ê. Ti vajî çi welatê ma de esto. Welatê ma hetê tebîetî ra sey cenet o. Tena dengizê ma kêm o. Koyî, dereyî, darî, baxçeyî, çemî… Vewre, varan tîje û hewrî…
Seke min sere de zî va ez mewsîman ra tewr zêde payîzî ra hes kena. Payîz hem rengê tebîatî bedilyeno, keno rindek û hem zî koyanê ma de her tewir meyweyî resenê mewimê payîzî de. Dewanê ma de şarê ma hêdî-hêdî xo semedê zimistanî hadre keno. Şaristanan de êdî mewsîmî ferq nêkenê. Zimistan, wisar, hamnan û payîz…

Şaristanan de semedo ke zîret ser o cuyayîş çin o, heme mewsîmî eynî yê. Xora şaristanan de semedo ke însanî timî wextî de mîyanê musebaqa de yê ne xo ra ne zî mewsîman ra çîyêk fehm nêkenê. Ne boya vilikêk ne zî boya herre... Derûdor de çend darî estî la ê zî eleqeya însanan nêancenê. Parqan de vaş esto la o zî organîk nîyo, boye nêdano.
La dewan de wînî nîyo. Dewanê ma de hem ziwanê ma yeno qiseykerdiş hem zî cuyayîşê însanan pak û sihetê însanan ca de yo. Şaristanî êdî bîyê cayê nêweşîyan. Her tewir nêweşî bîyê zêde û emrê însanan bîyo kilm. Ez bi xo zî şaristan de cuyena. Ez ge-ge vana ‘werrekna babî û dadîyê ma ma qet nêardêne şaristan. Ma xo rê dewe de bimendêne. Babî û dadîyê ma ma ardê şaristan la ê nika semedê sihetê xo şîyê dewe.
Babîyê mi roja ke bîyo teqawût ra xo eşto dewe, nika 82 serrî yo la maşala nika ma pêrune ra weş û sihetê ey ca de yo. Ma ra zî vano ‘ Eke şima bibê teqawût şima zî bêne dewe’ hewêk mi va ‘Bawo eke ma şaristan de nêmerdî ma do bêrê dewe. Nêzana emrê ma bes keno ma bê dewe yan ney’

Semedo ke ez mewsîmê payîzî ra zaf hes kena mi emser nîyet kerd ke ez şêrî dewe û xo rê çend roje dewe bimanî.

Dewa ma qezaya Çewlîgî Darahênî Mistan de ya. Mistan nameyê eşîra ma yo. 7 mezrayê Mistanî estê. Şele, Bonî, Dewa Redî, Dehle, Dizik, Merware û Ser La. Mîyanê nê mezrayan de mezraya ma Merware ya. Dorûverê Mistanî de eşîrê Botyan û Murtezanî estê. Nê eşîrî xo sey eşîrê bira vînenê. Pêro yewbînan şinasenenê. Bi dayîşê kênayan pêro yewbînan dir bîyê merdim. Zemanêk debara xo pê karê heywankarî kerdêne dewan de. Mintiqaya ma semedê waykerdişê bizan zaf dewlemend a. Yeno mi vîr dewan de bizê her keyeyî estbî. La semedo ke welat de şer estbi û karê heywankarî bibi bêqîmet şarê a mintiqa pêro koçê Dîyarbekirî kerd. Nika şarê ma yê a mintiqa hema vaje pêro Dîyarbekir de yo. Debara înan Dîyarbekir de bena. La hamnan şinê dewanê xo. Her çiqas heywanî nênê waykerdiş zî wexto ke beno hamnan cinî, tutû extîyarî Dîyarbekirî ra xo erzenê dewe û hetanî peyîna payîzî uca de manenê.

Semedo ke babî û dadîya mi zî dewe de bî mi emser waşt ez qasê çend rojan şêrî dewe. Minîbusa dewa ma xerajê Cumhurîyetî ke Berê Koyî de ca gêno ra şina dewe. Mi walîza xo kerd de. Ez serê sibayî şîya Berê Koyî ke şêrî dewe. Semedo ke wextê sayan o şar qasayê vengî ardbî xeraj. Şoforî pê qasayan hema vaje nîmeyê minîbuse kerd de. Bes nêkerd. Qasayî orteyê minîbuse de kerdî ra. Ma kewtî rayîr, rayîrê Licê ser ra ver bi dewe şîy. Ma Licê de nan û engûre girewt. Mi kolîyêk hakê dewan girewtî la ê hakî hakê zîretî vejyayî. Dikndarî 2 qat zêde mi ra pere girewtbi. Heta ke ma resay dewe ma çend mezrayê Mistanî gêrayî.
Wexto ke ez resaya dewe mabên ra 4 saetî vîyartî. Semedo ke şarê ma hema ê cayan de ziwanê xo Kirdkî qalî kerdêne zaf keyfê mi pê amebi. Xora ma zanê Dîyarbekir de çew êdî ziwanê xo qalî nêkeno. Wexto ke ez wenişta minîbuse qalîkerdişê Kirdkî zî dest pêkerdbi. Çend şinasîyê mi ke mi dewe de bî mi dir Tirkî qalî kerdêne. Mi înan ra waşt ma dir Tirkî qalî nêkerê.Mi înan ra waşt wa mi dir zî Kirdkî qalî bikî. Mi va, xora ma şaristan de mecburî ziwanê Tirkan qalî kenê. Qene şima ma dir Tirkî qalî mekêne.
Dewe de hetêk ra vengê vayî, milçikan, pelanê daran û hetêk ra vengê heywanan... Pêro sey senfonî mi mest kerdêne. Ma a şewe zî sobaya xo pê kolîyan dekerd û kişta aye de nişte ro. Dadîya mi çend heb kartolî eştî ci û kerdî sûr û ma werdî. Serê sibayî ez sefeq ra haye bîya. Ez şîya kişta yeneyî de mi dest û rîyê xo şutî. Awêka serdine bî awa yeneyî. Seke ez pê arqilîyaya xo. Hewnêkê xorînî ra warişta we. Seke ez herbêk ra vejîyaya û ameya tîya. Ge-ge qelebalixê şaristanî û vengê qorneya erebeyan û însanan amêne mi vîr, dayêne mi goşan ro. Ez o wext bîyêne xînt…
Ez şîya min hêga ra xo rê bineyk firingî û îsot day arê. Mi îsotê xo soba ser o kerdî sûr. Firingîyê xo kerdî şîl. Arayîyêka zaf weşe bîy. Dadîya min çend gozî mi rê şikitî û mi werdî. Gozî newe qaqof bibî û şarî hînî gozerê xo kuwêne.

Arayî ra pey ez şîya baxçe de min xo rê sayêka weşe tira kerd û werde. Badê zî mi qorçêk werd. Wexto ke ez baxçe ra agerêne ez raştê dirike ameya. Dirika sûre û şîrîne… Mi qasê tasêk dirike zî werde. A roje çi kuya mi ver mi werd. Seke ez cenet de bîya. Ne market ne erebeyî ne însanê zafî û ne zî strês. Dewe de nê çîyî çin bî. Dewe wisarî ra heta peynî payîzî pê meywe û zewzeyan milet kerdêne mird. Wisar kengerî, hamnan sayê yabanî payîz zî dirike… Ez nê mewsîman de nê meyweyan ra hes kena.

La pazîz zaf cîya yo. Payîz mewyweyê ke baxçeyan de nêresenê zaf ê. Ez roja bîne bineyke şîya yaban. Ez şîya laye. Rayîr ser o ez ewilî raştê sêzan ameya. Mi bineyk sêzî tira kerdî û werdî. Ez badê rastê gûncan ameya. Guncî tem resabî. Mi înan ra zî bineyk werd. Xora her ca de dirike estbî û mi pê werdişê dirike zaf keyf kerdêne. Laye de çend gozêrî estbî ez şîya binê înan min xo rê qasê tenekeyêk gozî tira kerdî. Gozê laye ê her kesî bî. Kam biwaştêne xo rê şîyêne tira kerdêne.

Ez roja bîna şîya hetê teyînce. Ez nîmeroj şîya û heta şan laye de menda. Mi gelêk teyînce arê da. Hem mi werd hem zî mi ard keye da cîranan. Dewe de engûre zî estbî la tehmê teyînce zaf cîya bi. Senî ke vergî dewe de wey nêbîyêne nê meyweyê yabanî zî baxçeyan de wey nêbîyêne, cayê înan ko û dereyî bî. Însanan ra durî de azad bî.

Xususîyetê ke nê daranê mewyen estbî ke heme zî semedê pawitişî telîyîn bî. Eynî sey gûlan. Dara gûncan, dirike, sêzêre, teyîncêre… pêro telîyinî bî. Telîyê înan semedê pawitişê înan bî. Milçikî û qelayî nêeşkêne înan ra çîyêk bigîrê, biwerê. La semedê milçikan, qîjaneyan û qelayan her tim werd estbi dewan de. Ne derd ne kul û ne zî zindan… Hem fir dêne hem mirdîya xo werdêne, şimitêne. Mi ge-ge vatêne werrekna ma zî sey înan azad bîyêne û emrê ma zî sey emrê înan kilm bîyêne. Emrê însanan derg o û nêqedyeno bi rastî. 30-40- ra dima êdî dubare yo gorê mi. Çîyo ke to dî ti vînenê. Ti her çî zanê û fehm kenê.

La cuyayîş şêrîn o belkî. Ez babîyê xo ra zana. Dinya ey rê zaf şîrîn a. Hema zî miqatê baxçeyê xo beno, her tewir meyweyan ra îstîfade keno.
Tabî dewe tena cayê werdiş û şimitişî nîya. Edet û usulê dewe estê. Ti gere extîyaranê dewe pers bikî. Keso ke banê xo virazeno ti gereka şêrî ey rê ardim bikî. Şan de şêrî dîwanan û roja îne şêrî nimajê îneyî! Eke ti nê çîyan nêkî peyê to de qisey kenî. Xora na mesela de mi dadîya xo dir pê nêkerdêne. Her roj vatêne, falan kes nêweş o şo pers bike, falankes ekser ra ameyo şo pers bike, falankes şîyo umre ameyo şo pers bike, falankes newe şino umre şo pers bike.. filan û bêvan.. Mi va, eke ez vateyê to bikî ez do çend rojî tena şêrî milet pers bikî.

Welhasil bê perskerdişê extîyaranê nêweşan ez nêşîya cayêk. Mi mirdîya xo tehmê heme meywîyan girewtbî. Çend rojî badê ez ameya şaristan. Seke yewî azadîya mi min destî ra girewtbî. Seke ez kewtbîya zindan. Seke çîyo ke mi dibî hewn bî. Çend rojî badê cû mi dewe kerd xo vîr ra. Ez şaristan de xora şîya, bîya vindî seke. La mi rayîrê dewe zanêne. O rayîr mi virî ra nêşibi.



Helbest: Letîf Helmet Ji Soranî: Yasîn Hisên

Kerkûk

Berê, hemû rê diçûn Bane
Aniha, tevaya rêyan diçin
Mala Mame Rîşe li Kerkûkê .
Heger Xwedayê mezin
Biçûya malên hezkiriyên xwe
Diçû mala
Azad Hewramî li Kerkûkê.
Ne mala kesekî ye, ne ya tu kesî ye
Tapoya wê di bêrîka
Kamilê mela Weysî de ye... Kerkûkê.
Xwedayê mezin
Sê caran giriya ye
Cara yekem ji bo:
Helebçeya kîmyabarankirî
Cara duyem ji bo:
Enfalkiriyan
Caran sêyem ji bo:
penaberên Kerkûkê.
Xwedayê mezin jî bi Kurdî diaxive
Dema diçe Kerkûkê.
Xwedayê mezin
Dema ji ezmanan bêzar dibe
Ji Cibraîl re dibêje:
Erşê min biguhêze Kerkûkê.
Xwedayê mezin
du caran nefret kiriye
Cara yekem li Iblîs
Cara duyem li:
Berpirsên Kerkûkê.
Li hizb û mizb bêzar e, bêzar
Nasnameya kurdistanî di bêrîkê de ye...Kerkûk
Zivistanan, dema ava çemê Xase radibe
Ew ne av e
Xwîna şehîda ye
Stiranan dibêje li ser Kerkûkê.
Hemû pirîskên agirekî
Şehîdekî bi çira ye
Li mala xwe ya berê digere, li Kerkûkê.
Ji hejmara hemû neteweyên Iraqê bêtir in
Hejmara şehîdên Kerkûkê.

www.navenakurdi.org

Heger devê wê hebaya
Wê tif li hemû berpirsên niftdiz bikira...Kerkûkê.
Heger Xwedayê mezin kêfa wî ji stiranan re bihata
Diçû guh li stirana
(Şer e li ser te heta roja mehşer e) ya Elî Merdan... Li Kerkûkê.
Ji bav û bapîrên xwe min bihîstiye
Ku mirî sax dibin
Dema têne şûştin bi ava Kerkûkê.
Ji hemû siteyrkan xweşiktir in
Siteyrikên ezmanê Kerkûkê.
Ku Adem û Hewa
Ji bihuştê hatin derxistin
Çûn Kerkûkê.
Wa li me hatiye
Ku em dibin wênekêş
Destpêkê, em li ser dilê xwe dikêşin
Wêneyê Kerkûkê.
Li Çiya û Girikan
Dengê hezaran şehîd tê guhê min, dibêjin:
Hestî û hûrikên me bibin Kerkûkê.
Bi saxî û Mirîtî
Her şehîd in
Xelkên Kerkûkê.
Ne welatê berpirsên bazirgan in
Welatê şehîda ye
Kerkûk.

Dibe ku navê cadeyan bêne guhertin
Lê, nabe
Nabe
Nabe
Navê şehîdekî Kerkûkê ji bîr biçe.
Hey Xweda...
Ez dewlemendiyê ji te naxwazim
Û ne jî wek hinek zanayên olî
Lava ji te bikim
Da bibim endamê perleman
Hemû hêviyên min ew in
Tu hêzê bide min
Da xweşiktirîn helbest binivîsim
Li ser Kerkûkê...

www.kurdi.org

Bernamegeh

Dergehê Kurd û Kurdewariyê









www.bernamegeh.org **bernamegeh@gmail.com**









Bernamegeh

Dergehê Kurd û Kurdewariyê